

# NÜDEM

No 32 1999

Kovara Huneri, Edebi Ü Çandı




**NÜDEM**

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî  
Chief Editor**Firat Ceweri**Hejmar: 32 sal 8  
Zivistan: 1999Şerdîn abonetiyê (salek)  
Swêd: 240 Sek  
Skandinaviya: 280 Sek  
Ewropa: 100 DM  
Amerika, Australia,  
Kanada: 50 \$  
Institution: 290 SekPostgiro: 636 36 25-2  
ISSN: 1103-1964Wêneya bergê:  
John William Godward, 1861-  
1922, Young Woman in a  
Marble Interior.Çap:  
Nina TryckeriPergala bergê û rûpelan:  
NûdemAdres:  
**NÜDEM**, Box: 177  
177 23 Järfälla-SwedenE-mail:  
nuDEM@telia.comTel û Fax: 8-580 131 62  
070-7774552  
8- 583 564 68

- 4 NÜDEM ber bi salên 2000î ve ◆ **FIRAT CEWERI**  
 6 Çarîn ◆ **ROJEN BARNAS / 9, 26, 35**  
 7 Agirê welatê perçekirî ◆ **SELAHATTİN BULUT**  
 10 Du şîr ji ◆ **SABAH KARA**  
 11 Modela Skandinavyayê ◆ **ŞEREFXAN CİZİRİ**  
 22 Sé şîr ji ◆ **REMEZAN ALAN**  
 24 Nameyên ji aşê min ◆ **ALPHONSE DAUDET**  
 Wergera ji fransî: **AZAD ŞATEHÎ**  
 27 Du şîr ji ◆ **ARJEN ARÎ**  
 28 Du şîr ji ◆ **DOST ÇIYAYÎ**  
 29 Çend gotin li ser felsefa huner ◆ **N. ZAXURANI**  
 36 Deryavanê pîr ◆ **JUHANİ HINKANEN**  
 Wergera ji finî: **HESEIN MUHAMMED**  
 46 Ronesansa çanda kurdî li Sovyeta berê ◆ **WEZİRË EŞO**  
 56 Bo NÜDEMê ◆ **ELEND DARVIN**  
 57 Mebrûre ◆ **FELAT DILGEŞ**  
 64 Ne Hollywood lê Hol-i-Tor ◆ **BRADER**  
 68 Dilbera min ◆ **YAQOB TILERMENÎ**  
 71 Du şîr ji ◆ **KAWA NEMIR**  
 73 Hunermend Xalid Sitar ◆ **S. SULEVANÎ**  
 82 Di zimanê kurdî dê tewanga sernavan ◆ **ZEKİ BOZARSLAN**  
 106 Fala Nûrikê ◆ **FIRAT CEWERI**  
 114 Günter Grass bû xwedîyê xelata Nobelê ◆ **NÜDEM**  
 119 Reş û Spî ◆ **ENWER KARAHAN**  
 123 "Danasına kovarén kurdî yên li Kurdistanâ Sûriyê ◆ **ELÎ CEFER**  
 128 Danasina kitêban bi kurtî ◆ **NÜDEM**  
 136 Danasına kovaran bi kurtî ◆ **NÜDEM**

# NÛDEM BER BI SALÊN 2000Î VE



**FIRAT CEWERÎ**

Bawerî hêza jiyanê ye  
Tolstoy

**N**iha hejmara 32an di destêne we de ye. Sih û du hejmar bi gotinê hêsan e. Sih û du hejmar berhema heyşt salan e; heyşt salên ku ne roja me roj bû, ne jî şeva me şev. Ev ïnadek e, ïnada bikaranîna zimanê kurdî, ïnada vejandin û aktuelhiştina edebiyata kurdî û ïnada berdewamiya weşaneke kurdî ye. ïnadîn hene mirov têk dibe, lê mirov bi hin ïnadan li ser lingan dimîne. Bi ïnada derxistin û berdewamiya Nûdemê jî, me li gora hêz û taqeta xwe xwestiye edebiyata kurdî aktuel bihêlin, ziman û edebiyata kurdî bi kurdan bidin hezkirin û cihekî xwe di dîroka edebiyata cîhanê de çêbikin.

Mîna ku min di hejmarên berê de jî anîbû zimên, Nûdem tenê bi alîkariya xwendevan û aboneyên xwe li ser lingan maye û bi xêra wan e ku dikare jiyana xwe ya weşanê bidomîne. Di çapemeniyê de, weşanên ku bi zehmetî weşana xwe didomînin, kovar û rojnameyên edebî ne. Li her derê dînyayê, li her welatî hertim problema aborî derdikeve pêşberî kovarên edebî û gelek kovarên edebî mecbûr dimînin ku jiyana xwe ya weşanê bidin rawestandin. Li welitekî mîna Swêdê, van salên dawiye gelek kovarên swêdî yên hunerî û edebî mecbûr mane ku ji ber tengasiyêن aborî jiyana xwe ya weşanê rawestînin. Ev problem li Tirkîyeyê jî heye. Kovarên hunerî û edebî ku li Tirkîyeyê derdikevin, an rojnamene mezin, an jî weşanxanene mezin li pişt wan in. Hin kovar jî hene ku banke wan finanse dikin. Li hin welatan jî konseyen çandî yên wan welatan ji bo kovarên hunerî û edebî butçeyekê vediqetî-

nin û bi xêra wê alîkariya ku ji konseya çandî distînin dikarin jiyana xwe ya weşanê bidomin. Em dizanin ku tu konseyên kurdan yên çandî tunene, em dizanin ku tu rojname an jî weşanxaneyên kurdan yên di warê aborî de xurt in tunene, em dizanin ku tu banke-yên kurdan jî nînin ku xwe bidin ber finansekirina kovarên kurdî yên edebî. Lê em dizanin hin dewlemendêن kurdan hene, ku dikarin destê alîkariyê dirêjî kovarên kurdî bikin û bikin ku ew di jiyana xwe ya weşanê de berdewam bin. Niha, hûn dikarin bibêjin, heyf e, Nûdem bû, va ye ew jî ketiye krîza aborî. Ger ew xwe finanse neke, ew mecbûr e weşana xwe rawestîne. Na, qet nebe, heta Nûdem dehsaliya xwe danegire, ew weşana xwe rana-westîne. Belê, peryoda pêşî ya weşana Nûdemê pênc sal bû. Pişti ku me pênc salên xwe da-girtin û me bîst hejmarên Nûdemê derxistin, me pênc salên din jî dane ber xwe. Ji bo da-girtina deh salan hê du salên me hene, yanî hê em deyndarên soza xwe û heyşt hejmarên din in jî. Di deh salan de wê cil hejmarên Nûdemê derketibin. Çil hejmarên ku di zik hev de her hejmarek li dor 150 rûpelî. Bi gotineke din deh cildên her cildek 600 rûpel. Yanî an-sîklopediyeke ku ji deh cildan pêk hatiye...

Baş e, gelo pişti ku deh salên Nûdemê biqedin, ma bila Nûdem raweste? Ma êdî hewcedarî bi wê namîne? Na, heta ji me bê em ê nehêlin Nûdem raweste. Di jiyana weşaneke kurdî de deh sal dikare pir be, lê di jiyana weşaneke ewrûpiyan de, an jî swêdiyan de, deh sal destpêk e. Belê, divê deh sal ji bo me jî destpêk be. Ger were bîra xwendevanan, me di pêşgotinêñ hejmarên destpêkê de Nûdem şibandibû zarokeke ku nû bi ser lingan diket. Ew zaroka ha niha heyştsalî ye û pişti du salên din jî wê bibe dehsalî. Gelo mirina zarokeke dehsalî, an jî kuştina zarokeke dehsalî ne gunch û zehmet e? Ma agir bi dilê mirov naxîne? Ma kezeba mirov naperitîne? Loma, heta ji me bê, em ê nehêlin zaroka me ya dehsalî bimire. Lê ji bo ku ew bikaribe bijî, lêbixwedîderketin, evîn û hezkirin jê re divê.

Belê, xwendevanêñ delal, aboneyêñ hêja, dilsoz û hezkirêñ ziman û edebiyata kurdî, hewcedariya me ji aboneyêñ zêdetir, ji piştgiriyeke xurttir heye. Divê em bi hev re bikin ku Nûdem di salên 2000î de bêtir bi pêş bikeve, bibe dengê bi hezaran nivîskar û hunermen-dêñ kurdan û di dîrokê de rola xwe ya pêwîst bilize. Û divê em bikaribin ji vê dilsozî û piştgiriya we hêzê bistînin û sozeke din jî bidin; lê vê carê ne bi tenê soza pênc salan, em ya deh salan bidin...

Em hêvîdar in wê di salên 2000î de beşdarbûna keç û jinan jî di Nûdemê de zêdetir bi-be. Ji ber ku em dixwazin di salên 2000î de Nûdem spehîtir, nermtir û rengîtir bibe. Ev guheriñêñ ha jî bêş beşdarbûna keç û jinan ne mimkun e. Tiştekî ku keç û jin ne di nav de be ew tişt hişk û req e. Bi kurtî divê Nûdem di salên 2000î de bi tenê maskulîn nemîne, lê bi feminîntiya xwe jî rengekî nû bide civat, ziman, edebiyat û hunera kurdî.


Bi hêviya rojên xweş û geş ez nûsala we ji dil pîroz dikim... 

## **ÇARÎN**

Sola sebrê peritî l' rê, ne binpê w rû ma  
Hetka me çû, êdî j' me ra ne averû ma  
Bi dest re hat herçî yê xwest, tenya ji bo me  
Bextê bi reş, qismetê kor, şansê bi gû ma

**ROJEN BARNAS**

# Agirên welatê perçekirî



SELAHATTİN BULUT

Fitin gundekî Dêrika Çiyayê Mazî ye. Wekî gerek gundên Kurdistanê piş li çiya ye û bergî ve-kirî ye. Her şev ji pozê serê gund, carna hîn ji jortir, ji pozê Holê, me li ronahiya gund û bajarên Başûrê piçûk dinerî û keser radinîştin.

Her sal di Newrozê de li serê tûmikê li pozê Hûto, li pozê Holê û li pozê Şîn me çend agirêن xurt dadidan û me berê xwe dida binya xetê, Çiyayê Kurmênc. Gava ronahiya agirê me xwe digihand kurdên binxetê, wê gavê wan ji agirêن mezin hil didan, bersiv didan kurdên bakur. Agirêن welatê parçekirî gur dibû; dikire qice-qicq û qire-qir û di ser qereqolên sînoran re derbas dibû, silav didan hev, bi hevdu re dimizmizîn û di nav mij û ewrên asimanê tarî de ji hevdu re dest kil dikirin.

Di van salan de kalekî pir şêrîn û henekçî li Fitnê rûdinişt. Navê wî Reşo bû. Herkesî jê re digot Apê Reşo. Di dema İsmet Paşa de çar salan leşkerî kiribû. Ji ber ku kurd bû û bi tirkî nizanî bû, wî gelekî eziyet kişandibû û lêdan xwaribû. Di wan şevêن tarî û dirêj de em li dora wî kom dibûn; li ser serpêhatiyêن wî yêن leşkeriyê guhdarî dikir û em fêrî zilma dewleta tirk dibûn...

Car carna gava şev qar dibû, an ji bi şeveqa sibehê re, berî ku dinya zelal bibe leşkeran digirtin ser gund. Gava du-sê makîne ji riya Buxurê bêwext dageriyana riya

Fitinê, me fêm dikir ku leşker hatin. Ji xwe, ji ronahiya çav û dengê wan makînan me fêm dikir ku leşkerin. Wê demê xortên gund û em "telebêñ" ji derve hatibûn gund, me bi tevde berê xwe dida berqef û şikeftên nêzî Erbelûşê. Lêbelê me Apê Reşo di wan xaçerêkêñ derdora gund de tim di pêşıya xwe de didît. Ji ber ku zêrevanê me hebû, me digot qey kesek ji berî me bi cerda leşkeran nahese û ji gund dernakeve. Lêbelê gava me ew di pêşıya xwe de didît, em giş ecêbmayî diman.

Hevalan jê re digot:

– Apê Reşo, tu kal ï. Ma tu ji bo ci direvî? Ji leşkeran re bibêje, ez pîr im, min hay ji tu tiştî tuneye!..

Wê çaxê Apê Reşo kefa destê xwe ber bi asimana ve radikir û bi awirêñ wekî ku têkeve heyrê ka dê ji me re ci bibêje, li me dinêrî û serê xwe kil dikir, dikeniya û di-got:

– Lawo we nedîye, hûn nizanin... Ma qey ez nikarim bêjîm, ez pîr im? Lêbelê ka heqî pere bike!..

Gava hevalan fêm dikir ku ji Apê Reşo re ci jî bêjin vegera wî tuneye, difitilîn ser û jê re digotin:

– Ê de tu bi kêfa xwe yî, lêbelê tu tehibiyî û hatiyî heya vira, balo ka bi me re we-re...

Heval li hêviya bersiva wî nedisekinîn, diketin milêñ wi û dikişandin:

– De ka em herin cem me!..

Wê çaxê enîşka xwe li me dida, riya xwe ji ya me diqetand, ji me dûr diket, diçû û di ber xwe de digot:

– Eh! Ez ê bi wan re herim ha! Ez ji ber wan direvîm...

Apê Reşo ji Heramya ye. Fitin, Erbelûş û Heramiya sê gundêñ nêzî hevdû û erda wan jî bi ser hevdû ve ne. Apê Reşo temama emrê xwe li van hersê gundan derbas kiriye. Heramiya gundekî roavayê Dêrika Çiyayê Mazî ye. Ji ber ku gundekî mezîn û gelekê nêzîkî Dêrikê bû, rojekê me hew dît ku bi navê "Zeytinpinar" bûye meheleyeka Dêrikê. Gava mirov bi pişta malêñ Heramiyan diket û qiyameyî Textê Gewr dibû, di nav darêñ teew û darêñ behîvan de çend xanî xuyanî dibûn. Ji wî cih û wan xaniyan re digotin, Erbelûş.

Deh diwazde mal bûn û mezrayeka Heramiya bû. Lêbelê niha Erbelûş tuneye. Leşkerêñ dewleta tirk, ewîlî vala kirin û dûv re jî xera kirin. Niha ji wî cihî re dibêjin şûna Erbelûşê. Rehmetiyê Hafiz Akdemir, berî ku şehîd bikeve rojekê dihere şûna Erbelûşê û bi navê "İnsansızlaştırılan Köyun Dans Eden Köpeği" di roj-nameya Yeni Ülkkeyê de nivîsek nivîsandibû, di nivîsê de weha digot:

"Wextê em ketin nav gund kûçikekî girs li pêşberî me xuya bû; li me nerî, rabû ser herdu lingên xwe yên dawiyê û bi kêt reqisî.. Hevalê min yê rêber digot, 'ji ber ku ji zû de ye insan nedîtiye lewra weha dike...'

Niha Fitin wekî gelek gundên Kurdistanê vala ye. Li ser axa Fitnê kesek nema ye. Apê Reşo li nav mezelê gund, ji tirsa leşkeran dûr e, di bin axê de, di xew de ye. Erbelûş wekî gelek gundên Kurdistanê xerabe ye. Mêwên tirî, bîstan, darêن teew û behîvan bê xwedî mane. Kûçikên şivanan guhê wan miç, çavêن wan li riya rêwiyeğî ne. Ü Hafiz Akdemir wekî gelek rojnamevanê kurd şehîdê nivîsên xwe ye.

Lê ez?

Ez jî qey ji bo valakirin, xerakirin û şewitandina gund û bajarêن Kurdistanê û kuştin û mirina heval û hogiran bibinim û van derd û kulan teva bikişînim hîna sax im.

Ev jî qencyeka dewleta tîrkan e li min kiriye...

Divê ez vê qencyiyê (!) qet ji bîr nekim. □

C  
A  
R  
Î  
N

"Ne ji bo ewropiyan lê ji bona gelê xwe  
Me demokrasi divê, ku bînin mexelê xwe"  
Xapand û dixapîne bi vî awî sergadoş  
Çi prof û nexwenda ci keşê û melê xwe

**ROJEN BARNAS**

## **Me xwe li çiyan xist**

Me xwe li çiyan xist  
 Kef bi ser behîrê ket  
 Av gelek cezir kir  
 Med li pişt medê hat

Me xwe li şevan xist  
 Ronî li şevê ket  
 Tarî xwe tekrar kir  
 Roj li pişt rojê hat

Me xwe li salan xist  
 Sal bi ser salê ket  
 Dîrok xwe tekrar kir  
 Dengê "bes e" jê hat

Me xwe li çolan xist  
 Bihar bi çolê ket  
 Me dilê xwe vekir  
 Mêji bi reqsê hat

Me xwe li peyvan xist  
 Dilan bi peyvê ket  
 Peyv nava xwe vekir  
 Şîr ji navê hat

## **Huzn**

Ez te ji lêvên te maç dikim  
 Dunya diheje li dora min  
 Tu heyî û ez heme  
 Kesê din her kesê din

Ez te ji lêvên te maç dikim  
 Ez te di bêrîkên xwe de digerînim  
 Ruwê min çend parça ye  
 Çend parça ye dilê min

"Ez selamên xwe pêşkêş dikim"  
 Ez selaman nakim "pêşkêş dikim"  
 Giya dihejin li ber bayê  
 Pûç dîbin û diweşin lêvên min

Devê min li cihê guhê min  
 Guhê min li cihê devê min  
 Milê min li cihê piyê min  
 Piyê min li cihê milê min


Ez te ji lêvên te maç dikim  
 Zîna zer î li himêza min  
 Tu heyî û ez heme, huzn  
 Kesê din her kesê din

8. 1. 1999

15. 3. 1999, Stolberg

**SABAH KARA**

# Modela Skandînavyayê



ŞEREFXAN CİZİRİ

Modelên civat, raman û rêxistinan tu cara ne weke civat, raman û rêxistinan bi xwe ne. Ew tiştekî din in. Tiştekî ku çend gavan li jora rastiya xwe ne. Model dikarin tenê bişibin civat, raman û rêxistinê ku ew temsîl dikin. Di navbera model û realita ku model temsîl dikin de danûstandineke pozitîf heye. Wextra ku danûstandin qulipîn rengên negatîf, wê gavê şibandin di navbera model û tiştîn ku modelê temsîl dike, îca li navê namîne. Model wê gavê dibe tiştekî bi serê xwe. Ew îca nema tiştekî temsîl dikin. Tenê ew dikare di vê tevgirêdanê de xwe temsîl bikin. Model hergav bûne weke mirêka ku mirov civatan, ramanan û rêxistinan pê analîz bike. Ji ber ku model tu cara bi xwe nikarin bibin civat, raman û rêxistin. Model tiştekî ku mirov li ser xebitiye, xwe pê êşandiye, zanabûna xwe li ser tov kiriye, ji bona ku ew bişibe tiştekî berbiçav. Di ramanên mirovan de, helbet modelên ne berbiçav jî hene...

Weke ku tê zanîn gelek babetên modelan hene. Di zimanê zanyarî de gotina modelê bi gelek haweyan tê bikaranîn. Model, gotineke pir popûler e. Ev gotin di gelek tevgirêdanan de bi kar tê. Heger mirov ji nêzîkayî de li vê gotinê baş binêre, ewê gelek nav û sifatên dewlemend derkevin holê. Weke ku tê zanîn, model hene civatî ne, li aliyê din jî, eşkere ye ku ji bona pêşketina civatan jî model hene. Model hene felsefi ne, model hene kîmyewî ne, model hene fizîkî ne ûhw. Di warê zanya-

riyê de jî model hene weke modelên matematîkî, sosyolojî, psîkolojî, antropolojî... Ji bona avakirina xaniyan, dirûtina cilan û firotina malê dinyayê jî, dîsa model hene. Model dikare bi tabloyek be, bi figûrek be, dikare jinek an jî mîrekî bedew be. Ew dikare modela demokrasî bi xwe be...

Lê niha em ê li vê derê li ser vê yekê, bi haweyekî dûr û dirêj nesekinin. Ez dixwazim li vir weke modeleke civatî, li ser Modela Skandînavya bisekinim. Ji bona ku mirov vê yekê baş fahm bike, divê mirov pêşî gotina Skandînavya, ji xwe re hinikî zelal bike. Gelek caran mirovên biyanî gotina Skandînavya û gotina welatê jorîn tevlihev dikin. Weke gotineke coxrafiya, ji welatên jorîn re welatê Nordîk, ango welatê Bakurî tê gotin. Lê ji gelek mirovan weye ku Finlandiya û Îzlanda jî di nava welatê Skandînavya de ne. Lê belê ev yeka ha ne rast e. Welatê Skandînavya ji Danimarka, Norveç û Swêdê pêk tê. Lê belê welatê Nordîk, ango welatê bakurî, ji her pênc welatê ku me li jor hejmartin bi hev re pêk tê. Ev welatên serbixwe ne. Hinek welatên otonom weke Grönland û Oland jî di nava welatê Nordîk de têne hejmartin. Ya rast ev e. Vêca wexta ku mirov gotina Skandînavya bi kar tînin, ew di rastiya xwe de dixwazin gelek caran qala welatê Nordîk bikin. Lê gotina welatê Skandînavya bi vî haweyê ku min li jor qal kir ketiye ser zimanê gelek kesan. Em ê jî li vê derê gotina welatê Skandînavya, îca bi mana gotina welatê Nordîk bi kar bînin...

Ji bona ku modeleke civatî baş were naskirin, hinek xisûsiyetên bi taybetî ji bona vê yekê pêwîstin. Ev xisûsiyet dikarin ji gelek tiştan pêk werin. Ji bona ku mirov karibe modeleke civatî rast bi nav bike, wê ji nêzîkayî de nasbike û li ser bibe xwediyê dîtineke baş, beriya hemû tiştan divê hinek pirsgirêkên ku hene, ji mirovan re baş werin zelal kirin. Mirov divê ji nêzîkayî de li pirsên weke demokrasî, tevgerên gelerî, kultura siyasî, pirsa wekheviyê, parvekirina hebûnên civatî, li azadiya raman û mafêñ xweîfadekirinê baş binêre. Xwe li se wan tov bike. Ji ber ku tenê ew pirsin ku dikarin gelek civatan ji hevdû cuda bikin, yan jî wana bikine weke hevdû. Di warêñ modelên civatî de, divê mirov bi dîtinêñ zanyarî bûyeran bîne holê û pirsgirêkên civatî jî, bi metodêñ modern analîz bike. Stûnêñ modela ku li vir aktuel e, yek bi yek raxîne erdê. Wan ji hevdû baş vejîne. Zanebûna ku di vî warî de heye, divê mirov baş li bêjingê xîne. Qîmetêñ sosyalî, kulturî, aborî, idarî û demokratîk ku di vê modelê de hene, bi ser hevdû de werîne û fotografekî baş derxîne holê. Heger mirov bixwaze ev model berbiçav be û ne tije gotinêñ telomelo be jî, wê ga-vê divê xisûsiyetên vê modelê vekirî derkevin ber çavêñ xwendevanan.

Modela ku li welatê Skandînavya heye, bi rastî modeleke bi nav û deng e. Ew

gelek caran weke riya sisiyan jî tê binavkirin. Li gora vê dîtinê, ango riya yekem lî-beralîzm bû û ya didûyan jî komunîzm bû. Ya sisiyan jî dibû modela Skandînavya. Ew model ji nêzîkayî de bi xeta Sosyal Demokrasiyê ve tê girêdan. Modela Skandînavya weke riya navîn jî tê bi navkirin. Jê re riya zêrîn jî tê gotin. Lê belê li vir tiştek heye; ev riya ha bi rastî zêrînî ye an jî riya paxirî ye, ew jî bûyerék din e. Bi rastî li gora helwestên îdeolojîk û siyasî bersivêن mirovan dikare werin guherandin. Rastiya ramanî û şîroveyêن siyasî heta îro wilo bûye. Ew dîtin çiqasî rast in an jî çewt in, ez di vê nivîsê de wan şîrove nakim. Di vê nivîsê de, dîsa ezê li ser van binavkirinan, dilbijandinan, kategorîzekirinan û pesindanêن ku hene zêde nesekinim. Ez tenê dixwazim bi zimanekî hêsanî, di vê nivîsê de bingehêن vê modela bi nav û deng, bi kurtasî jî be xwendevanê Nûdemê re pêşkêş bikim:

Em ê niha bixwazin li vir, ji pirsgirêka demokrasiyê dest pê bikin. Weke ku ji hemû kesan re baş diyar e, pirsa demokrasiyê mohra xwe li sedsala bîstan xistiye. Di sedsala bistan de tevgerên demokrasiyê geş bûne. Yek ji wan hîmêن bingehîn yê ku dikare gelek kes, hêz, partî, dewlet, rîexistin ûhw, bîne cem hevdû dîtinêن li ser pirsa demokrasiyê ne. Di sedsala bîstan de, lihevhatina mirovan divê li ser bingeh û ramana demokrasiyê were avakirin. Li cîhanê raya giştî îro wilo hatiye avakirin û wilo di nava gel de jî, hatiye pejirandin. Krîtera bingehîn ji bona rexnegirtin û mîxalîfbûna dema modern, dîsa li ser pirsgirêka demokrasiyê kom dibe. Welat, civat û ramanwerên ku pirsgirêka demokrasiyê ji xwe re baş zelal nekiribin, ew nikarin bi rîk û pêk karêن siyasî jî baş bimeşnin. Pirsgirêka demokrasî bi pirsgirêka azadî, ronahî, rizgarî, zanebûn, rastî, exlaqî û bi hemû qîmetêni mirovî ku hene, hevdû timam dikan. Yek bê yekê li civatê nikarin baş bimeşin. Ji ber civat û demokrasî bi hevdû ve ji nêzîkayî de girêdayîne.

Li welatêن Skandînavyayê demokrasî ji bona hemû kesan e. Hemû hêz û kes xwediyêن mafêن demokratîk in. Di zagon û qanûnêن civatî de, ew mafêن demokratîk bi xurtî têne parastin. Hemû hêzêن girseyî li ser mafêن demokratîk li hevdû kirine. Demokrasî bûye weke cemento ji bona van hêz û civatan. Ev yeka ha, him di teoriyê de û him ji di pratîkê de wilo ye. Hemû kes û hêz pêwîstiyê dibînin ku mafêن hevdû yên demokratîk biparazin. Îro ji bona min e, sibehê jî ji bona te ye... Wilo tê gotin. Li welatêن Skandînavya, ew helwesta ha bûye weke nasnameyekê ji bona hemû mirovêni siyasî. Siyaset li welatêن Skandînavya wilo dimeşe. Li ser bingehêن demokrasiyê li van welatan lihevdûkirineke dîrokî pêk hatiye. Desthilatdar û gel, dewlemend û feqîr, rîexistinêni karkeran û sermiyandaran, îdeolojiyê yên cîhê cîhê ûhw, li ser bingêhen demokrasiyê şêwra xwe kirine yek. Li ber şewqa mirêka de-

mokrasiyê, mirovên skandînavî dixwazin hevdû nasbikin. Referensên mirovan di warê siyâsî de, raman û pratîka demokrasiyê bi xwe ye. Hemû kes û hêz dibêjîn ku demokrasî baş e. Hemû mirov baweriya xwe bi vê yekê tînin. Lê belê demokrasiya ku heye, bi rastî pêwîst e çawa be? Li ser vê rastiya ha jî dîtinêن cîhê cîhê hene. Helbet ew tiştekî xwezayî ye. Ma di hemû pirsgirêkîn civatî de rews ne wilo ye?

Ma gelo mafêن demokratîk ci ne? Mirov dikare vê pirsê niha ji xwe bike. Helbet, bersiva vê pirsê dikare bi gelek haweyan were nîqaşkirin. Lê belê bersiveke bi kûrtî, li ser vê pirsê, incex dikaribe wilo were dan; mafêن demokratîk beriya hemû tiştî, ji azadiya ramanî pêk tê, ji mafêن avakirina rêexistinan pêk tê, ji serbestiya bahweriyan pêk tê û ji wekhevbûna hemû hemwelatiyan pêk tê. Li miqabilî qanûnêن civatê hemû hemwelañ divê weke hevdû bin. Ev babeta demokrasî, babeta helî lîberal û klasîk e. Li gora normêن lîberal ev wekheviya ku em li vir qala wê dikan, helbet wekheviyeke şekliye. Ev wekhevî betirîn li ser mafêن formel disechine. Ev ne wekheviyeke rastî û xwedî naverok e. Li ser vê pirsgirêkî ji dîtinêن cûda cûda hene. Hinek hêzêن siyâsî, pirsa demokrasiyê bi pirsa wekhevbûnê vê girêdidin û bi vê berçawkê li bûyerên din jî temâse dikan. Li aliyê din, bi taybetî hêzêن cep û Marksîst, pirsa demokrasiyê bi pirsa wekhevî û desthilatdariyê vê girêdidin û helwestêن xwe jî, li gora rastiya vê yekê digirin. Li ser van herdû dîtinêن cûr be cûr di civatê de her gav nîqaşeve dewlêmend heye...

Ramanwerêن skandînavî ku bi nav û deng in, bi taybetî kesên weke profesorê swêdî Herbert Tingstêن û Profesorê danimarkî Alf Ross, li ser pirsgirêka demokrasiyê, weke ku min li jor qal kir difikirin û ew dibêjîn: "Demokrasî divê di ser hemû cûre îdeolojiyan re bisechine. Ew, divê di ser serê hemû îdeolojiyan re be. Demokrasî teknîka biryardanê ye." Naveroka demokrasiyê ne gelekî giring e, lê belê şiklê biryardanê divê baş derkeve pêş. Ji ber ku xala helî giring ev e. Mirov divê zanibin ka biryar çawa hatiye dan. Biryar divê zelal bin. Kesên ku li dij û li gel vê biryarê bin, divê eşkere bin. Divê mafêن hemû kesan hebe ku ew li dijî biryareke nerast (helbet li gora bahweriya xwe) bisekinin. Mafêن mirovan yê mixalifbûnê jî divê were parastin. Dîsa mafêن mirovan ku li gel biryareke rast (helbet li gora bahweriya xwe) cîh bigire, divê ew maf werin parastin. Hemû kes divê karibin li gora raman û bahweriya xwe tevbigere. Ev mafêن demokratîk yêن hemû kesan e. Di dîtina xwe ya îdeolojîkî de jî kes dikarin lîberal bin, konservatif bin, sosyalist bin, lê berî hemû tiştan jî divê ew pêşî bibin demokrat. Ji xwe ya helî zor jî ev e. Dîtina van herdû kesan bi kurtayî wilo tê formule kirin.

Li miqabilî van dîtinêن formalîst û bûrjûvazî, ramanwerêن cep û Marksîst jî pirs-

girêka demokrasiyê weke bûyereke dualî dinirxînin. Yek jê; aliyê şiklê demokrasiyê ye û yeke din jî naveroka demokrasiyê ye. Li gora sosyalstan herdu alî nikarin ji hevdû werin vejetandin. Şiklê demokrasiyê çiqasî girîng be, naverok jî ewqasî girîng e. Di demokrasiyeke baş û pêşketî de, divê him şiklê demokrasiyê û him jî naveroka demokrasiyê were parastin. Yek bê yekê nabe...

Yek ji stûnên bingêhîn yê civata Skandînavya ku ev model li ser ava bûye, Tevgerên gelerî ne. Tevgerên gelerî xwe li gora ramanekî bingehîn didin hevdû û komaleyên xwe jî li ser vê stûnê ava dikin. Her tevgereke gelerî avaniya xwe li ser hinêk normên exlaqî, sosyalî û kulturî, bi rê ve dibe. Pîvanên sosyal û normên exlaqî, hêza xwe ji îdeolojiyeke xuyayî digirin û li gora wan pîvanan, ew helwestên xwe zelal dikin. Tevgerên gelerî li welatê Skandînavya li gora rîbaza demokrasiyê dimeşin. Demokrasî di vê tevgirêdanê de, dibe bingehekî xurt ji bona tevgerên gelerî li welatê Skandînavya. Her endamekî tevgerê xwediyê hemû mafêñ demokratîk in. Hêza Tevgerên gelerî li ser xebata endaman ava dibe. Endam çiqasî çalak, zîrek û bi bahwerî bin, tevger jî ewqasî pêş de diçe. Kapasîta endama çibe, tevgera gelerî jî eyñî dibe weke endamê xwe. Tevger û endam di rîexistinekê de nikarin ji hevdû werin vejetandin. Demokrasî di hundirê rîexistinekê de, beriya hemû kesî ya endamane. Demokrasî ne tenê ji bona serokan e. Ji gelek aliyan de mirov dikarin bibêjin ku demokrasiya welatê Skandînavya, bingeh û xwîna xwe ji tevgerên gelerî digire. Her mirovekî skandînavî endamê gelek komelan e. Ew rastiya ha bi xwe re gelekkî ku organîzekiriye û di xeta xwe de demokrasîparaz e, derxistiyê holê.

Wexta ku di sedsal nozdehan de civatê Skandînaviya hatin guherandin, gelek qîmet, danûstandinê sosyal û kulturî serobino dibûn. Kes û grubêñ sosyal ji warêñ xwe bar dikirin. Dihatin li bajaran bi cîh dibûn. Gelek zehmetî dikişandin. Bêkarî, xizanî, problemê nasnameyî, bêxanîbûn, vejetandin, xeribî ûhw, li ser hevdû kom dibûn. Roj bi roj problemê gel zêde dibûn. Deprasyonêñ psîkolojîkî derdiketin holê. Gelek kesan bala xwe didan ser vexwarina alkolê. Alkol dibû weke problemeke sosyal. Mirovan dixwestin bi vê yekê, xwe ji bîra bikin û bi vî haweyî jî, xwe ji problemê rojane rehet bikin. Lî ev yeka ha dikarîbû mirovan bi xwe re bike alkolist. Ew tehlûke jî hebû.

Li aliyê din rola dîn li ser kesan, her ku diçû zeif dibû. Ramanêñ sekularîstî pêş diketin. Sîstemêñ ramanî yêñ ku li civata kevnare xwedî cîhekî giranbûha bûn, hema bi carekê re hildiweşîyan. Di civatê de valahiyêñ ramanî û exlaqî çêdibûn. Gelek mirovan riya xwe şas dikirin. Di vê navê re jî, dîsa gelek mirov ji desthilanîn diketin. Ew pasîf dibûn...

Li miqabilî van probleman, bi taybetî tevgera karkeran dixwast ku civata ku heye ji nû ve bi rêxistin bikin. Hêzên sosyalîst û liberal li ser problemên civatî bi hevdû re xebat dikirin. Li dora ramanê nûjen gel destpêdikir û rêxiştinê xwe avadikirin. Di sedsala nozdehan de, weke min got gelek tevgerên gelerî pêk dihatin. Di warê dînî, ekonomî, siyâsî, sosyalî û kulturî de komelên mezin ava dibûn. Van komeleyan bi sed hezaran mirov dianîn cem hevdû. Ji bona vê yekê, mirov dikare tevgera karker û karmandan, mînak bide. Her yek ji van di sedsala nozdehan de, tenê bi serê zwe dikaribûn çend hezar endaman organîze bikin. Lê belê îro ew dikarin bi miliyonan endaman kom bikin. Ew îro bûne xwediyê hebûnên civatî.

Projên tevgerên gelerî pêşî li Emerîka û li Ewrûpa derketin pêş. Ji ber ku li van welatan azadiya ramanan û tevgera demokrasî hebû. Gelê Ewrûpa û Emerîka ûmkanên ku hebûn zû bi kar dianîn. Wan xwe zû bi rêxistin dikirin. Li welatên Skandînavya gel, mînakên ku li Emerîka û Ewrûpa çebûbûn vedigûheztin welatê xwe. Di vê navê re jî, çûn û hatin di nava welatan de xurt dibû. Di warêna ramanî de tevger li dar diketin. Ramanen nû û rizgarîxwaz bala gelên çewsandî zû dikişandin. Bi taybetî ji welatên Skandînavya ber bi Emerîka de, koçberiyeke mezin hebû. Hinek mirov, bi taybetî kesên dîndar ji ber zilm û tada dewletên skandînavî direviyan û diçûn Emerîkayê. Di warê pirsgirêka dînî de, Emerîka ji welatên Skandînavya bêtir serbest bû. Li wir azadiya ramanê bêtir hebû. Ew rastî jî dibû yek ji encamên ku gel berê xwe bide Emerîka. Helbet encamên ekonomîk jî, be guman hebûn. Gelên Skandînavî di vê demê de gelekî xizan bû.

Tevgerên gelerî li ser bingehê hinek pirsgirêkên civatî xwe organîze dikirin. Weke ku min berê ji qal kiribû karker û karmandan rexistinê xwe yên çînayetî avakiribûn. Ji bilî wan pirsgirêkan, helwestên nû jî li civatê derketibûn miqabilî mirovan, weke helwestên li dijî alkolê, weke dîndariyeke ji dewletê azad, weke avakirina kooperatifan, weke tevgera jinan, weke hewcedarî bi perwerdebûneke ku li derveyî dibistanan pêwîst bû, weke hezjêkirina xwendinê û belavkirina pirtûkan ûhw... Di hemû warêna civatî de hewcedarî bi rêxistinê gelerî hebûn. Endamên van tevgeran xwe ji bona dawa xwe perwerde dikirin, zanebûna xwe zêde dikirin, di derheqê pirsgirêkên sosyalî û kulturî de lêkolîn dikirin. Her ku zanebûn, tecrûbe û dîtinê endaman zêde dibûn, tevger jî pê re fireh dibû û rehêna davêtin nava hemû perên civatê. Mirov dikare bi kurtasî bibêje ku tevgerên gelerî tevgerên rizgarkirina gel bûn. Wan gel ji cehaletê, ji tenêbûnê, ji qelsiyê, ji tunebûnê, ji koletiyê ûhw, dixwastin rizgar bikin. Gel divabû ku li ser lingên xwe bisekiniya. Ji bona vê armanca pîroz jî gelek îmkan çêbûn û ev îmkana na pir baş hatin bikaranîn. Gelê ku

li Skandînavya tiştekî wî tunebû, bi çêbûna tevgerên gelerî re bû xwediyê hemû tiştan...

Gundiyan kooperatifên xwe ava dikirin. Hemû berhemên xwe weke goşt, şîr, hêk, petat, pincar, dar û beştên xwe bi destê rêxistinên xwe difirotin. Keda wana bertelef ne diçû. Fêda wana ji wan re dima. Gundî hêdî hêdî weke pêwîstiyekê mirovî, ekonomî jî fêr dibûn. Wexta ku karker û gundiyan dest avêtin fêrbûna ekonomiyê, wana xwe ji bandora ekonomîstên bûrjûvazî jî azad dikirin. Fêrbûna zanyariya ekonomiyê bi xwe re azadî û helwesta siyasî jî pêşda dixist. Ne tenê di mijara ekonomî de, lê belê di warê ıdarekirina civat û komelan de, di warê perwerdekirina endaman de, di warê birêvebirina xebatê de, pêşketinên bingehîn çê dibûn.

Di warên avakirina xaniyan de, dîsa gel kooperatifên xwe ava dikirin. Ji bona rehetiya endamên xwe, tevgerê karker û gundiyan, xaniyên modern ava dikirin. Endamên tevgerên gelerî, beriya hemû tiştan endamên xwe layiqî hemû rehetî û tiştên baş didîtin. Ma gelo kî ji vana çêtir hebû ku di xaniyên rehet û modern de bijîn? Armanc di vê xebatê de eşkere bû, ew tu caran ne qezenga şexsan bû. Beriya hemû tiştan, hewcedariyên civatî rolên sereke di vê xebatê de di leyîztin. Li gora mesrefa ku li avakirina xaniyekî hatibû kirin, ji endaman bedêl dihate xwestin. Bi kurtî mirov dikare wilo bibêje; ji bedêla ku sermayedar nirxên karker û gundiyan ji xwe re bibin, ew li cem xwediyê xwe diman. Armanca tevgera kooperatifan ew bû. Ü ev jî ne tiştekî şas bû. Li dora vê prênsîba ku ez qal dikim, mirov li dora hevdû kom dibûn, ji hevdû re dibûn hêz û civata xwe bi hevdû re diguherandin...

Yek ji hîmê modela Skandînavya, demokrasiya meheli ye. Ji bona ku civat karibe baş bi rê ve biçe, ıdarekirina di cih de pewîstiyekê mezin e. Problemên ku di civatan de hene, tenê ji hinek an jî ji yek navandê nikarin werin çareserkirin. Carna çakêt biçûk dibe û gewde jî mezin dibe. Ji bona ku mirov fesal û estetîka xwe winda nekin, beriya hemû tiştan, mirov divê di mirêkê de gelek caran li xwe binêre. Wexta ku estetîk xerabe be, wê gavê divê mirov ji xwe re li cilên nû bigerin. Helbet ev şibandinek e. Lê di warê demokrasî û ıdarekirina meheli de desantralizasyon ji sedî sed pewîstiyekê mirovî ye.

Li welatên Skandînavya, di destê beledî û welayetan de selahiyetên gelek mezin hene. Ji tendûrîstiyê bigirin heta perwerdekirinê, ji problemên sosyalî bigirin heta avakirina xaniyan, ji problemên zarok û naşîyan bigirin heta ku bigîhêje kal û pîtan, dibin destê beledî û welayetan de dimeşin. Dibistan, pirtûkxanê, karên sosyalî, enerjî, av, pakijkirina derdorê, tendûristî, zarokxane, trafik ûhw, hemû di bin berpirsyariya ıdarêne meheli de ne. Beledî û welayet bacê jî ji hemwelatiyên xwe digi-

rin û civatêن xwe bi rê ve dibin. Di kar û barêن xwe de, ew zêde hewcedarî bi alika-riya dewletê nabînin. Dewlet, gelek selahiyetêن xwe yên girîng, dewrî idara mehelî kirine. Helbet alîkariya dewletê hergav pêwîst e, lê belê ne tiştekî bingehîn e ji bona idarêن mehelî. Ew dikarin heta derecake jiyana xwe jî, bi serê xwe ve bi rê ve bibin. Di warê ekonomî de azadiya wana heye. Ew dikarin li gora îmkanêن xwe si-yaseta xwe bidin meşandin. Edî dewlet nikare tesîreke mezin li wana bike. Hefsarê vana, ica dewlet nikare di destê xwe xîne. Weke ku min got; selahiyetê van dezge-han li gora prensîbên demokrasiyêن mehelî hatine tekûzkin ê li gora vê jî dime-şin. Bingeha civatêن Skandînavya, hêza xwe ji vê desantralîzasiyona ku ez qal dikim digire. Kesêن ku berpirsyarêن dewletê ne, ew nikarin midaxeleya karêن birêvebirina belediyan û welayeteran bikin. Tenê ew dikarin îmkanan ji bona belediyan û welaye-tan peyde bikin. Di vê yekê de gerek tu caran şik tune be. Ji ber ku sîstema idareki-rinê li welatêن Skandînavya, tenê rê li demokratîkbûna civatê vedike û hebûna de-mokrasî jî sîstema idarekirinê hîna tekûztir dike. Xwe bi xwe idarekirina mirovan, yek ji bingehêن prensîbî yê demokrasiyê ne. Rastî wilo ye. Civat vê na wilo dipeji-rîne. Yek ji prênsîbên demokrasiyê li welatêن Skandînavya ev e. Haweyêن xwe bi xwe idarekirina mirovan çiqasî xwediyê selahiyetê fireh bin, civat û mirov jî pê re ewqasî kamil dibin. Mirovên xwedî berpirsiyar, divê fîrbibe ka ewê çawa vê berpir-siyariyê bi kar bîne. Berpirsyarî dihêle ku mirov pê re mezin bibin û karêن xwe hî-na baştir bikin.

Li aliyê din, li welatê Skandînavya wekheviyeke sosyal jî heye. Ew wekhevî, di gelek waran de wekheviyeke qels e. Gelek caran hinekî şiklî ye. Lê belê kesekî skan-dînavî ji birçîna jî namire li van welatan. Ferqa di navbera çînêن sosyal de, li gora gelek civatêن modern hîna kêmter bûne. Hemû hemwelatiyêن Skandînavya xwedî ye mafêن sosyal in. Ev mafêن sosyal di bin garantiyek ji bona kes û malbatêن skan-dînavî. Bi taybetî ev kar an dezgêhîn sosyal li belediyan, li gora qanûn û selahiyetêن ku hene dimeşanînin. Ev selahiyet dibin biryar û birevêbirina dezgehîn mehelî de dimeşin. Dewlet alaqeta xwe ji vî karî nayîne.

Min berê jî qal kiribû. Li welatê Skandînavya kultura siyasî, ne li ser metodêن pevçûnê lê belê li ser metodêن lihevhatinê hatiyê avakirin. Kultura lihevhatinê bû-ye weke ideoolojiyeke ku di hemû waran de derbas dibe. Carna bi qerf tê gotin; skandînavî dixwazin Xwedê û Şeytan li hevdû werînin! Bi rastî li welatêن Skandînavya kultura lihevhatinê bûye weke çemento ji bona civatê...

Ji ber vê rastiya ha gelek hêz û grubêن siyasî li Skandînavya, dikarin zû li hevdû werin. Bûrjûvaziya Skandînavya bi tevgera karkeran re, ji salêن 1930 û vir de pey-

man çêkirine û li ser hatinê welatê xwe li hevdû kirin. Wexta ku welat dewle-mend dibûn, ekonomiya wan pêşve diçû, qezenga sermayedaran zêde dibû û civat dibû xwediyê imkanên nû, wê gavê ji ramanên li ser parvekirina ekonomiya civatê, hîna zelaltir dibûn. Beşek ji van imkanan ku bûrjûvazî bi destê xwe dixist, dûra weke bac diçû ji dewletê re û dewletê ji ev imkanên ha dikirin mafêن sosyal û li gel vedigerandin. Mirov dikare bibêje ku burjuvazî amade bû ku hebûnên ekonomî bi karkeran re li hevdû par bike. Helbet ev parkirin ne li ser bingehê wekheviyeke rast çêdibû. Mirov dikare bibêje ku pişka mezin hergav ya bûrjûvazî bû. Di vê tevgirê-dane de, weke mînak mirov dikare bibêje ku yek bi sedî bû. Li miqabilî vê yekê ji karkeran zêde deng dernedixistin. Ev lihevdûhatina karker û sermayedaran bi navê "Lihevhatina Dîroki" ji hatiye binav kirin.

Mafêن sosyal li welatên Skandînaviya, cîhê cîhê ne. Ev mafêن sosyal, ji zarakan bigire heta naşîyan, ji jinan bigire heta pîr û kalan digire nava refêن xwe. Mafêن sosyal dikarin li gora emrê mirovan bin, dikarin li gora mezinbûna malbatan bin, dikarin li gora tendûristiya mirovan bin ûhw. Li gora hemû rewşen sosyalî, mafêن mirovan hene ku ew ji civata xwe alikariyê bigirin. Wek hemwelatiyên welatekî ev maf ji bona hemû kesan in. Bi qanûnan û bi heq ev maf têne parastin. Ji xwe xurt-bûna wana ji di vê rastiyê de ye.

Helbet ev mafêن ha ji aliyekî de mirovan ji birçîbûnê, ji bêxanîbûnê, ji xizaniyê ûhw, dikare demeke kurt xelas bikin. Ev ji aliyekî de baş e û divê were parastin. Ji ber ku zehmetkêşan bi xwêdana xwe ev maf bi dest xwe xistine û ev heqê wan e ji. Lê belê di vê navê re, divê mirov bîne ziman ku azadiya mirovan bi hêsanî dikare ji destêن wan derkeve û têkeve bin kontrola sosyal ya hêzên dewletê. Bi wî haweyî ji mirov dikarin wê gavê bibin kolê dewletê. Ev girêdan û şiklê alîkariyên sosyal, dikare mirovan bike weke "nanxwirê cilqetên". Ango kesêن ku nan dixwin û cilan diqetînin. Kesêن ku bi tenê ji bona nan û zikê dijîn. Bi kurtî li ser vê relalîta ha mirov dikare wilo bibêje; weke netîcîyeke vê siyaseta sosyal, mirov dikarin pasîf bibin, li mala xwe rûnêن û ji Xwedê re şikir bikin... Qîma xwe bi tiştêن ku heye werînin û civatê ji weke ku heye bipejirînin. Siyaset û guherînên civatî, bixwazin bisipérin kes û hêzen din. Ji siyaset û civatê bi dûr kevin. Kesêن pasîf dikarin bigîhêjin helweste-ke destruktif û bibêjin; ma ku cîhan hemû ji bişewite, baqeke pûşê min di nav de tuneye! Ma min ci jê ye?

Rastiya civatî û sosyal, dikare mirovan wilo pêşbixîne. Lê belê modela Skandînavya ne tenê ji van xalêن ku min li jor hejmartin pêk tê. Bi rastî mirov dikare sed û yek tiştêن din ji bihejmêre ku, ew ji di modela Skandînavya da xwedî cîhêن gi-

ring in. Mirov dikare li vê derê gelek problem û hêjayiyên model û civata Skandînavya bîne zimên. Lê hewcedarî niha bi vê yekê tuneye. Lê di vê tevgirêdanê de jî tiştek heye ku divê ew were eşkere kîrin; mirov kîjan mînak û kîmasiyên civata Skandînavya bîne ziman bila bîne, ewê pîrsên demokrasiyê, wekheviyê, azadiyê û çînayetiyyê her gav derkevin miqabilî mirovan. Ji ber ku gelek pirsgirêkên civatî û çareserkirina wana li gora van prensîban rêz digirin. Weke libêñ tizbiyê, ew bi hevdû ve girêdayî ne. Yek bê yekê nabe. Wexta ku demokrasî, wekhevi û azadî tunebe, wê gavê gelek tişt têne fetisandin. Rê li qîmetên pozitif têne girtin, civat di cîhê xwe de disekine û her ku diçe jî fehş dibe, xav dibe û bêfesal dibe...

Li welatêñ Skandînavya tiştekî din jî heye ku bala min pir dikişîne: di xebata siyasî, sosyal, ekonomî û civatî de zanyarî xwedîyê cîhekî gelek giranbûha ye. Helbet ne tenê zanyariya civatê, lê belê zanyariya xwezayî jî cîhê xwe di nava vê yekê de digire. Li gora rastiya zanyarî civat, dewlet, rîxistin, gotûbêj, medya, beledî, dezgehîn sosyal û hw, karêñ xwe bi riya prensîbêñ aqîlî didin meşandin. Helwesta rasyonel li welatêñ Skandînavya her gav tê pesinandin û xelatkîrin. Ji ber ku rastiya dîrokî û civatî herdem hevalê vê helwestê ye. Xebata rasyonel, weke ku eşkere jî xuya dike, dikare pir bi rîk û pêk bimeşe. Enerjiya mirovan bi riya vî metodê navdar, tu caran bertelef xerc nabe. Enerjiya mirovan li van welatan, ji bona armancêñ siyasî, sosyal û ekonomîk, bi haweyekî plankirî dikeve tevgerê. Ji bona kêçekê, kes tu lihêfan li van welatan naşewitînin. Mantalîta civatê wilo ye. Wexta ku prensîbêñ rasyonalîzmê bêne xebitandin, kar li gora zanebûna helî modern divê bimeşe.

Wê gavê zanebûn dibe xwedî qîmet. Kesêñ zana dibin xwedîyê qedir. Wê gavê bi rastî, zanebûn dibe desthilat. Helbet li vir ez qala xebata dezgehan dikim. Xebata kesan li vir ne mijara me ye. Ew jî bi serê xwe helbet mijarek e. Lê tişten ku ez li vir tînim ziman ji bona xebata dezgehan tê gotin. Ewê ku civat û modelan li ser lingan dihêlin jî dezgehîn civatî ne. Kes, di vê tevgirêdanê de rolêñ gelek biçûk dileyîzin. Ew weke dilopeke baranê di Gola Wanê de ne. Ne Gola Wanê bi dilopêñ baranê dibe gol û ne jî dilopêñ baranê ku nikaribin têkevin nava golekê, dikarin bi kêrî tiştekî werin. Mirov bêdezegeh û dezgeh jî bê mirov nabin. Welatêñ Skandînavya bi dezgehîn xwe bûne modeleke bi nav û deng. Lê belê ev dezgehîn ha jî, bêyî kesen bîrewer nikarin rola xwe baş bileyîzin. Ji bona ku dezgehîn civatî baş karibin kar bikin, kesen ku di dezgehan de cîh girtine, divê beriya hemû tiştan xwe li gora metodêñ zanyarî û rasyonalîstî perwerde bikin. Modela Skandînavya, bi rastî berî hemû tiştî modeleke rasyonel e. Girêka van civatan, beriya hemû tiştan xwe di rasyonelbûna wan de, veşartiye.

Emê niha jî gotinêñ xwe yên dawî bibêjin: Ji modela Skandînavya mirov dikarin gelek tiştên baş fêr bibin. Gelek tiştên ku fêda civata me tê de heye, em dikarin ji van civatêñ skandînavî werbigirin. Ne tenê ji Skandînavya, lê belê ji hemû welatêñ pêşketî em dikarin tecrûbeyêñ baş û pozitîf, ji bona welatê xwe bigirin. Welatê me hewcedarê mînakêñ baş e. Lê belê ev fêrbûn divê nebe weke kopyayeke xerabe. Ez vê yekê baş dizanim: Mirov tu caran nikarin hemû başiyêñ cîhanê ku hene bîne welatê xwe. Ev nabe. Ne mimkun e. Ez dîsa vê jî baş dizanim; Li welatê me gelek başiyêñ civatî hene. Lê hezar mixabin, mirovên kurd gelek caran bi hebûnêñ welatê xwe baş nehisiya ne. Hê jî qîmet nedaye hêjayiyêñ welatê xwe. Dilê mirovê kurd gelek caran li derveyî welatê wan maye. Her gav wana dilê xwe bijandine civatêñ derive...

Hunera rewşenbîriya welitekî ew e ku, mirov bikaribin tiştên ku bi kêtî welatê mirovan bê, wana bi metodêñ zanyarî derbasî realîta civata xwe bike. Mirov divê girêdayî xebata xwe gelek tiştan fêr bibe, wana dûra karibe biguherîne û li gora realîta welatê xwe, formekî pêşketî jî bide wana. Ji bona vê yekê jî, divê mirov him welatê xwe û him jî cîhanê baş nas bike. Di vê tevgirêdanê de kopyakirina modelan ne karê siyasetmedar û rewşenbîran e. Kopyakirin û karê zanyarî du tiştên ji hevdû cuda ne. Lê mixabin heta niha li welatê me gelek kes û hêzan, jiyana xwe ya siyasi li ser kopyakirina hinek model û teoriyan ava kiribûn. Afirandina ramanî, ji bona van kesan qet roleke baş nedileyîzt. Li welatê me, ji hemû tiştan bêtir propaganda-yeke vala, weke lehiyekê li seranserê welêt belav bûbû. Xelasbûna welat û mirovan di tovkirina propagandayê de dihate dîtin. Li nava daristanêñ ku mirov lê tunebûn jî, dîsa mirovan hewcedarî bi propaganda didîtin! Li welatê me propaganda vala, eynî bûbû weke nexweşîyeke psîkolojî... Lê firêza van mirovên wilo ku em li vir qala wana dikan, li welatê me iro baş xuyanî dike. Tablo xerabe ye. Mekroh e. Bi kur-tî; wana tiştekî berbiçav ji bona civata me nekirin. Weke bayekî reş hatin û çûn! Lê jî nûha û pê de, divê îca mirovên kurd ji nû de têkevin kozikêñ xwe û rê li xebata ramanî û rewşenbîrî li welatê xwe vekin. Kesêñ kurd li welatê xwe, ji bona vê yekê, divê îca amade bin. □

## Hemera

Dilê min  
ferhengeke wate-tarî bû,  
bêjeyên şorax bijart demekê  
şona mîrgezaran,  
ji ser kaniyan bar kir,  
mîna tiştên beredayî  
hat jîbîkîrin di malbarkirinan de,  
kavilan eciband,  
pê mijâ newalan şuşt rûyê xwe,  
perde kîşande rojê,  
kor kir destêx yê yên jîr,  
bûn zinar xewnêñ wî  
û li kîjan tirêñê siwar bû, qesîf...  
  
Hê dê çend çerxê din  
di nava wan zaxerênan de  
wê belkî serê xwe xwînî kîra  
heger rastî te nehata!

## REMEZAN ALAN

## Çola Şevekê

tu di xew de yi  
eyne di xew de ne  
guldank di xew de ne  
ji ber ahenga hebûna te  
bajar di xew de ye  
lê ez bûme çemekî têzav  
masiyên xwe dişewitînim  
li kolanan

## Warê Ehrîman

milekî roj diwestiyan  
milekî şev diponijîn  
li wî milkî  
û xeletî derew gwîzên pûç  
dida hev tûrek  
û darek  
kurm berhev dikir  
di gewriya medrebekê de  
**MÊWA BER DERÎ**  
qey ne mozabesên te bûn  
ketin hundir?

**REMEZAN ALAN**

# Nameyên ji aşê min

## Bicîhbûn

ALPHONSE DAUDET

Yen şasbûyî bi tenê kîloşik bûn!.. Ji ber ku tevlî ewinde wext di ser re derbas bû-  
bû wan deriyê êş girtî, dîwar û meydana wî gîha girtî dîbûn, wan digot qey qe-  
raş nemane, û wek ji xwe re ciyekî pir xweş dîbin, ji xwe re kiribûn wek taxeke giş-  
tî, navendeke operasyonê stratejîk: Aşê Jemmapes ê kîloşkan... Şeva ku ez gîhaş-  
tim wê derê, hundur tije bû, bêhenek, bîsthebak li dora meydanê kom bûbûn, pi-  
yên xwe li ber tîrêjeke tava heyvê germ dikirin... Gava ku derî an pencereyek vebû-  
na, firt! Civata wan ji hev bela wela dibû, û ev rihberên pepkên wan sipî, teriya  
wan li ser piştâ wan berê xwe didan nav talan û deviyan wenda bûn. Ez hêvî dikim  
ku careke din vegerin.

Yek ji yen bi dîtina min pir şaş bûbû, demankerê pêşîn, pîremêrê ramanwêr ê  
xemgîn kund ê, ku ji bîst salî bêtir li ber vî aşî bû. Min ew li jor, li ser darekî lûsiya-  
yî bêtevger, li bin sîwaxa weşyayî û esrexa wêran dît. Demekê bi çavêن xwe yên  
grover li min nêrî; paşê, ji ber ku ez nasnekirim tirsîya: "Hu! hu!" û bi zorê bazkêن  
xwe yên ji tozê cûn bûbûn lihev xistin; -ev şeytanê ramenwêr! Qet toza xwe dana-  
weşînin... Ci qîmetê wê hebû! wek hergav, bi çavêن xwe yên zelûlî, bi mirûzê xwe  
yê kirî, min ji vî demankerê bêdeng ji her kesî bêtir hez kir û bilez peymana dema-  
na wî nû kir. Wek berê katê jorîn tevlî qolîcka esrexê wê jê re bimana; min jî ji xwe  
re jûra jérîn bijart, jûreke piçûk a bi kilsê sipîkirî, nizm û wek xwaringeheke dêrê  
bikumbêt bû.

Eve ez ji vir, li ber vî deriyê xwe yê ji tava xweş re li ser piştê vekirî ji we re dînivî-  
sim. Daristaneke çamê ya xweşik, wek kevzê kesk li ber tavê dibirûse û bimezinayı-

ya xwe ji jêr de li ber çavê min bilind dibe. Li asoyî, çiyayên Alpê di ber serê çaman re bilind dibin... Ji dûr ve, hema ku heye, dengê wîtewîta mirbaxiyeke li nav kulîl-kên lewentê û yê zingilê hêstirekê ji ser rê tê... Ev hemî dîmenên spehî yên çolê gava ku ronkayî be xwiya dikin. Niha wek hûn dibînin, ez ê çawa bêriya Parîsa we ya tarî û qerebalix bikim? Ez li aşê xwe ewende dilşad û bextewer im! Qoziyek weke ku min dixwest, ciyekî piçûk ê germ û bîhnxwexş, ji rojnaman, ereban û dûmanê bi kîlometran dûr e... Ewinde tiştêن spehî li dora min hene, ez nikarim pesnê wan bidim!

Eve nêzîkî heşt rojan e, ku ez li vir bicîh bûme, ji niha de mêtijîyê min bibîranîn û hisên xweş tije ye... Binêrin! Ne pir dûr, doh êvarî, min li keriyekî pez ê ku vedigeriya çewligeke li jêr mêze kir, û ez dikarim sond bixwim ku ez vê dîmenê bi hemi rojêن ewil ên hefteya şanoyê li Parîsê naguherim. Îja biryarê hûn bidin. Divê ku ez bêjim li Provencê, gava dinya germ bibe, şandina kerian a çiyayên Alpê adet e. Heywan û însan pênc an şes mehan li zozanêن jorîn, hete bi navê dikevin nav gul û giyan, bi şevan li bin stêrkan radizên; paşê, payizî gava ku dinya sar dibe mirov kom bi kom vedigerin çewligan, û kerî li hevrazên nizm ên cûn ku bîhna şewne-man ji wan dihat qûre qûre diçêriyan... Doh êvarî kerî ji zozanêن jorîn vege riyan. Ji sibê de, deriyê mezin herdu bazkêن vekirî li hêviyê bû; kadîn bi kaya teze tije bûn. Her saet ji hev re digotin: "Niha gîhaştin Eyguieres, niha gîhaştin Paradouri-yê."

Paşê, berê êvarê bi carekê re bû qîrîn: "Eve hatin!" û li wir, ji dûr ve, me keriyêن ku di nav toz û dumanê de mabûn û dimeşîyan didîtin. Te digot qey rê jî bi wan re dimeşe. Beranêن mezin ên qloçen wan badayî pêşengî dikirin, meriv ji wan ditirsiya; li dûv wan, mîhîn hilî yên mezin, dayikêن hinekî westiyayî, berxêن wan bi tenga wan re hemî kerî xwiya kir; -Qantirêن guliksor ên di cembekêن li ser pişta xwe de berxikêن virnî hildigirtin û ew wek di dergûşê de dihejandin li dûv kerî bûn; paşê kûçikêن di xwêdanê de mayî, zimanê wan bi xwê re dikişîya, du segene-yên şivan bi kulavêن xwe yên hiriyî yên zer ku wek cubeyê keşeyan dadiket hete bin çonga wan xwiya bûn.

Hemîyan bi dilşadî xwe dihejand, bi reperepeke wek tavana biharê di deriyê mezin re ketin hundur û wenda bûn... Heyecana di hundurî de hêjayî dîtinê bû. Ji ser lisêن xwe yên bilind, tawisêن mezin ên şîn û zerîn, bi kumikêن xwe yên tulîn, wan ên hatin naskirin û bi repîna trompeteke bêhempa ya pazkan pêşwaziya wan kirin. Lisê ku di xew de bû, ji nişkê ve ji xew çeng bûbû. Hemî rabûbûn ser piyan: Kevok, miravî, elok û mirîşk. Lis bûbû wek tîmarxanê; mirîşkan digot em ê çawa şevê

li piyan derbas kin!... Meriv digot qey her mîhekê bi hiriya xwe re, bîhneke Alpê ya kûvî, hinek ji wê hewa çiyan a jîndar ku meriv serxwêş dike û direqisîne anîbû. Bi vê seremoniyê kerî vege riya gova xwe. Tiştekî ji vê bicîhbûnê xweştir tunebû. Beranên navsere bi dîtina alîfên xwe yên kevn serxwêş bûbûn. Berx, ên herî piçûk, ên ku li zozanan bûbûn û qet çewlik nedîbûn, şâş û mat mayî li dora xwe dinêrin.

Lê niha yên ku bêtir dilê meriv bi wan dişewitî, ev kûçikên gurxenêq ên şivanan bûn. Şerpeze li pey heywanên xwe bazdidan vî alî û wî alî, ji wan nediqetiyan. Kûçikên ber malê beleheq ji koxêن xwe ban wan dikirin. Satila bîrê ya tije ava sar naflle diçirûsî. Berî ku heywan bicîh bibin, çengelê derî yê mezin nekeve cîh û şivan li jûra nizm li dora masê kom nebin, wan ne tiştek didît, ne jî dibihişt. Gava ku herkes bicîh bû, wan jî dîlkir ku biçin mereza xwe û li wir hewdikê şorba xwe biçerpênin. Ji hevalên xwe yên çewligê re, bahsa tiştên ku li serê çiyan kiribûn bikin; li ser wî welatê tarî yê ku gur, gul û gîhayêن kesk û sor heta bi congê lê hebû bibêjin. □

Wergera ji fransî: AZAD ŞATEHÎ

## C A R I N

Ev şâşika şêxê me yê ezîz û delal e  
Jê ketriye di beza ber bî sifra Decal e  
Min go çawa caîz e, xwarina ji vê sıfrê?  
Go b' niyeta zekatê dixwim li min helal e

ROJEN BARNAS

## Du hezar sal

Şax didî di dilê min de  
hisret û tu, tu her buhar  
her buhar bi guliyên nû  
dibişkivî tu her adar  
her buhar kulîka sor û  
her adar ağır û li jor û  
çend buhar in çav li rê me  
dildar im, xembar û hejar.  
Hisretê, ma li bendî kê me,  
ne hedan e min, ne debar  
sal vege riyan li qewlê me  
mizgînê, lezgînê hewar!  
çil sal çûn, ka miradê me...  
Newroza mîn, yara kubar?  
text vegirtin çiyayê me,  
dîlan û lîlîn bêjimar...  
tovê evîna me  
jê şitilîn ar û adar,  
çav li rê me, çav li rê me,  
ez û ax im, tu yî buhar,  
Kawayê li vê erdê me  
du hezar sal e, du hezar!

## Rêbero

tehma livînê ci ye, nizane,  
nîv nanî dixe bin çeng,  
nîv nanî li ber datîne,  
şorbe germ be jî hildifirîne,  
Rêbero têr bikin, malîno!  
  
Rêbero birçî ye xelkîno!  
birçiyê bavekî ye, tiyê dêyekê...  
Rêbero navêjin paxila felekê,  
zarokek e, tenûr in mala wî  
Rêbero kurê kê ye, Nisêbînîno!

rastî sed Rêberî tê bê,  
rastî sed tîrbî, hezar jinebî...  
şerek kîrêt e, lew-wit!!  
me nexwest, me di nav de xwe dî,  
Rêbero birçî ye li vî welatî,  
rûmeta kê ye Rêbero, rojhîlatîno?

-bavê wî pêşê nekin- xelkîno!  
Rêbero navêjin paxila felekê,  
livînek zêde tune ma li malekê?  
di kulîna dilê we de cih nemaye,  
we cihlivîn hebe jî, Nisêbînîno?

## ARJEN ARI

## Germekê sar

Sar sar sar e  
yar e...  
meha tebaxê dibare  
li çar milên min  
baraneke tî û rij  
ji ber girêza zimandirêjê am  
zikê çiqçiqanekê reş miçiqiye  
di goşî de  
hişk bûye şekir  
liba tirî  
û hêlinâ  
cotek kevokên berî  
li cî  
maye lepikek kewş...  
Hilmûgulma kerbekê ji reş ve  
diqirqile  
li qirax  
mexelê gur û çeqela...  
bela!  
Bes neqijile çêlkewa sûsik  
wilo  
havîn nemîne li berqefan  
tenha...  
  
Bila ez biqefilim sader evîn  
li nik min pingaveke h (ar)  
digel sê tilî û pêñuseke ciwan  
bifetisim  
di kelên avnûska hêtûnê de  
lê dûkelên li dû min

piştî şewitandinekê  
nemînin bende li ser  
ewrekî dilxav û tamîsar  
vegerin  
li çol  
li çiya  
li berwar...  
da ku neqirqirin qirakên qirikta:  
ma, bêav bêşîn bêdar  
ev welat  
û war  
yar!...

## Bendewarî

Were kubarê were  
ji kubar de  
qerimîne bûkên herdu çavan  
lêvîn şeqitî  
nêrînên qetran benzewêtî  
sing û berên zozanî  
ev panzdeh sal in şer  
ranewestandin  
Ji mêt ve  
bi du kulîlkên hêşran  
yek sor û yek spî  
bi hezkirina du hezar û şeşsed salî  
li hêviya te me...  
Zû were  
Dil bûye pereng bi hesreta esmer e!

## DOST ÇIYAYI

# Çend gotin li ser felsefa huner

N. ZAXURANÎ

Heger mirov di vê mijarê de mîna ku filozofên îdealist dibêjin, bi “nerîneke aqilmendî birame”, mirov dibîne ku ramana mutlaq xwediyyê roleke serekî ye, ji bo zanyarêne felsefa îdealist yên ku hewl dane, ku peywendiyêne huner bi felsefê re deynin û li gora vê yekê şîrovêne xwe di derbarê hunerê de li dar bixînin. Lewra, li gora wan ramana mutlaq bi awayekî dîrekt, ango bi awayekî rast û rê tê diyar kirin. Dê ji ber vê yekê be, ku his û pêjnên îdeayê (ramanê) bi mirovî weke xweşikbûnê têne his kirin. Ji ber ku ev fenomena (diyardeya) hisî ya îdeayê ya ku di nav şax û perê ramana mutlaq de dicîrisîne, divê ku mirov mîna îdeal bi nav bike. Bêguman, gava ku mirov bi vê nerînê nêzî pirsgirêkê bû, îdeaya ku mirov weke xweşikbûnê destnîşan dike, ji îdeaya ku weke rastiyê diyar dibe, bi ferq e. Ji ber ku ramana mutlaq ya ji aliyê bîreweriya estetikî mîna xweşikbûnê û ya ku ji aliyê zanistîya felsefi ve mîna rastiyê ji aliyê mirovî ve tê his kirin, her yek e. Lî, divê bê gotin ku awayêne hiskirinê ji hev cuda ne, ne weke hev in. Bela vê yekê jî, weke xweşikbûnê ji îdeayê re îideal tê gotin. Mirov dikare bibêje, ku kesê di vê mijarê de herî serê xwe êşandiye, sertaca îidealîzma Germanistanê yê ku mînak sitêrka fecrê dicîrisand, Hegel e. Hegel tu carî di kar û barê xwe yê hunerî de ku di nav rapêçana xwezayê de jî dikare xweşikbûn peyde bibe, red nekiriye, lê wî li pêşberî vê yekê bi israr îdea dikir, ku xweşikbûna huner ji xweşikbûna xwezayê delaltir e. Ji ber ku li gora wî xweşikbûna bi teng hunerî berhemê ramana mutlaq bi xwe ye. Raman mutlaq bi saya hebûna huner xwe bi xwe dirapêçe.

Ji xwe, mîna ku tê zanîn, berhemên ramana mutlaq ji yên bi reng xwezayî bi rû-mettir in. Dê ji bo vê yekê be, ku Hegel di kar û barê xwe yê hunerî de bêtir bala xwe dida ser berhemên bi reng hunerî. Lê, ji ber vê nerîna Hegel ya sînorkirî mirov parîkî xemgîn dibe, bê çima wî li xweşikbûna xwezayî mîna diyardeyeke xwedî bi rûmet destnîşan nekiriye. Ez bawer dikim, ku Melayê Cizîrî bi vê helwesta wî hisi-yaba, wê wî gelekî lewm lê bikira. Ji ber ku, gava mirov li ser sistêma Hegel ya ku li dorbera xweşikbûna hunerî rapêçaye, hûr û kûr dibe, mirov dibîne, ku wî dev ji felsefa xwezayê berdaye. Bi hemû hêza xwe ew li ser felsefa ramana mutlaq dirame. Ji vê yekê wîrdetir, gava ku Melayê Cizîrî diçû nav bexçe û baxê Mîrê Cizîra Botan û di nav awaz û dengên şalûl û bilbilan de bi awayekî şâirane tavêt ser hebîba xwe ya xemrevîn, ne bi tenê di nav evîna xwedê de ku Hegel mîna ramana mutlaq bi nav dike, mest dibû, herweha di nav xeml û xêza rengîn ya baxê Mîr de sewdan ji serê wî diçû.

Lê, mirov dikare, pirs bike: Heger ku bê gotin, ku xweşikbûna bi reng hunerî fenomena hîsî ya îdeayê ye, ma mirov dikare vê yekê çawa şîrove bike ? Bi ya min ev pêşneyare balkêş hinekî girikî ye. Ji ber ku bersiv gelekî zelañî diyar e. Mîna ku tê zanîn, îdea ji yekîtiya subje û objeyê ve tê holê. Ev yeka ha jî, ji bo kar û xebata bi reng hunerî tê wateya yekîtiya naveroka giyan û şîklê wê yê ku li dorbera wê tê rapêçan. Anglo giyan û made, subje û obje di çerçewa yekîtiyeke bi aheng an jî di nav kombînazyonekê de bi hev diguncin. Ji ber ku wezîfa huner ya serekî ew e, ku îdeayê bi awayekî îndîrek, lê bi alîkariya his û pêjnan vebêje. Lê, divê baş bê zanîn, ku mirov vê yekê nikare bi alîkariya ramana pakî saf pêşkêş bike. Bêguman, rûmet û réza wê pêşkêşkirinê di naveroka îdealê û ahenga di navbera aliyê wê de ye. Naxwe bêqusûrtî û birêkûpêkbûna berhema bi reng hunerî di ahenga naverok û rapêçana wan ya bi reng hîsî de ye.

Lê, divê neyê fêmkirin, ku berhema hunermendî berhema xwezaya ramana mutlaq e, an jî bi saya bîreweriyeke weha hunermend kar û barê xwe yê bi reng hunerî bi rê ve dibe. Ji ber ku gelek mirovê kuhunermend bêyî ku ji vê yekê hayadar bin kar û barê xwe yê hunerî li dorbera xweşikbûna ku Hegel weke xweşikbûna giyan(geist) bi nav dike, li dar dixin. Bi rastî jî, gava ku mirov hewl dide gelek berhemên bi reng hunerî bixwîne, an jî li wan dinere mirov wî çaxî têdigihê ku him hunermend him jî bîner gava ku tiştek li berhema hunerî tê zêde kirin, pê dihise ku berhema hunerî bê wate dibe, anglo ji çerçewa xwe ya hunerî derdikeve. Dê ji berevajiya vê yekê be, ku herdû - bîner û hunermend - pê dihisin ku naveroka berhema hunerî ya bi reng giyanî û şîklê wê yê bi alîkariya his û pêjnîn hunermendî li

dorbera wê tê rapêcan, bi awayekî bi rêk û pêk bi hev biguncin. Bi alîkariya vê birêkûpêkbûnê jî mirov têdighî, ku berhemâ hunerî birrek ji birrê rastiyê ye. Ev yeka ha jî, bi xwe re kêmboûna têgîhiştina bîreweriya estetikî neyêne. Ji ber ku mirov bi alîkariya kar û barê felsefi bi işaret / îmajên bi reng hunerî dihise, ne ku bi alîkariya bîreweriya estetikî bi îmajên bi reng hunerî şah dibe. Bi gotineke din, bi saya ramandina bi reng felsefi mirov bi hîsên bi reng hunerî yên ku ji îmaj û pêjnan pêk tê, şah dibe. Mîna ku tê zanîn, ev yeka ha jî bi temamî ji afirandina bi reng hunerî cuda ye. Ji ber ku hunermendekî gelekî bi nav û deng dibe, ku haya wî ji felsefî nebe. Herweha, mirovê filozof jî, dibe ku di warê hunerî de zehf ne şehreza be, ango mirovê filozof ne xwedîyê qabiliyeteke ku bikaribe senfoniyekê an jî, tabloyeke rengîn yeke hunerî biafirîne.

Ji aliyê din ve jî, divê baş bê zanîn, ku berhemên hunerî yên bi rêk û pêk ji nave-roka xwe ya ramanî û şiklê wê yê ku ji hîsan pêk tê, lê bi hevdu re diguncin, têne pêk anîn. Her du ûnsûr bi gelek alî hevdu radipêçin, mîna goşt û xwînê jiyanê didin hev. Lê ci heye, ku hercar mirovê hunermend di serpêhatina afirandina berhemâ hunerî de nikare vê yekê bi dest bixîne. Ji ber vê yekê jî, mirov bi alîkariya têkiliyên di navbera van ûnsûran de yên ji hev cuda berhemên bi reng hunerî yên ku li ser hîmê nivşê huner yên ji hev cuda têne afirandin, bi dest bixîne.

Ya yekê ew e, ku naverok li ser hîmê vegotina hunerî ne zelal e û di nav rapêçana hîsî ya ku li dorbera naverokê tê rapêcan nayê xwiya kirin. Heger ku mirov vê yekê bi gotineke din bixwaze bibêje: Mirovê hunermend dazwaza xwe ya ku ji dil û can tê, ji vegotinê bêtir, wê dest nîşan dike. Atmosfereke bi reng sîrrî peyde dibe. Mîna ku tê zanîn, ji vî cureyê huner hunera sembolî / remzî tê gotin. Biqasî ku ji berhemên dîrokî yên ku di derbarê huner de hatina nivîsandin, tê fêmkirin ev celebê huner di serdema Mistriyên kevnar de hatiye berhem kirin. Ji ber ku hunera Misra kevnar him ji aliyê naveroka xwe û him jî ji aliyê şiklê xwe ji berhemên hunerî yên sembolî têne pê. Ji xwe, hunerê sembolî ji di nava xwe de tê dabeş kirin. Bi rastî jî, gava haya mirovî ji hunera Misra kevnar yê sembolî û ji ya Hindistanê hebe, hingi jî, ji mirovî ve cudabûna di navbera wan de tê xuyakirin. Bê çawa Misra kevnar û Hindistan di warê vî besê huner de xwedîyê cihékî girîng in, şîrîn ci-hûyan jî yên bi reng olî ji hunera sembolî xemilandîne.

Dikare bê pirs kirin: Ma gelo ji ber ci di serdema Mistriyên kevnar û Hindistaniyan de ev celebê huner di nav jiyana civakî ya wî çaxî de şax û per da bû?

Bêguman, mirov dikare di vî warî de li ser gelek sedemên cur bi cur raweste. Lê, bi ya min, hoyâ herî serekî ew e, ku di serdema jiyana civakî ya wî çaxî de mirovan-

tî di derbarê jiyan û dorbera xwe de xwediyyê têgihiştineke sîrrî bû. Ji ber vê yekê jî, his û pêjnên mirovên hunermend yê demê jî li dorbera fenomenên sîrrî dihatin rapêcan.

Nivşê didoyan yê huner ji aliyê naveroka ku ji raman û pêjnên giyanî pêk tê, lê bi awayekî bi rêk û pêk bi şiklê xwe yê ku ji rapêçana hisî pêk tê, bi gelek alî bi hevdu re diguncin, mirov dikare destnîşan bike. Bi rastî jî, gava ku naveroka berhemê ya hunerî bi şiklê xwe re negunce, dê ahenga di navbera wan de bê tune kirin. Ev cureyê huner jî, mirov dikare mîna hunera klasîk destnîşan bike. Bê çawa hunera sembolî ji awayê vegotinê bêtir, bi sîrrê ku ji işaretan dihate holê, ji aliyê hunermendî ve dihate berhem kirin, herweha hunera klasîk jî ji giyan ku bi awayekî konkret di nav rapêçana şiklê xwe de tê afirandin, mirov dikare bide danasandin. Mîna ku bi hêsanî tê fêmkirin, ev cureyê huner di rengê mirovan de bi goşt û xwîn dibe. Ji ber ku di serdema ramandina hunermendêن serdema klasîk de Xwedê mirovê ku ji aliyê mirovan ve dihate payebilind kirin bi xwe bû.

Bê çawa hunera sembolî ji serdema Hindistan û Misriyên kevnar ve hatiye destpê kirin, herweha hunerê klasîk jî di serdema girekiyên kevnar de hatiye pê. Di kar û barê hunermendêن girekî yên serdema hunera klasîk de mirov bi hêsanî dibîne, ku naverok û şikil bi hevdu diguncin. Ji ber ku naveroka giyanê di nav rapêçana şiklê xwe de yê ku ji hîs û pêjnan pêk tê, mîna sitêrka sibehê diçirisîne. Ji ber ku naveroka berhemên klasîk bi hemû hebûna xwe hewl dide ku vebêje, ne ku mîna naveroka berhemên sembolî destnîşan bike.

Lê, ci heye, gava ku hunera klasîk û xweşikbûna wê ya bi reng olî li dorbera giyan tê rapêçan, nikare wî têr bike. Dê ji ber vê yekê be, ku nivşê huner yê sêyemîn ku bi navê romantîk tê bi nav kirin, di nav rapêçana jiyana civakî de ji aliyê hunermandan ve tê rêsandin. Ji ber ku di nav rapêçana van hunermendan de mirov dibîne ku giyan di pêvajoya ebediyata - mabest ji ebediyetê pêvejoya bê serî û bê dawî ye - xwe de êdî nema di nav çeperê hisan de dihile, bi gotina herî sivik dev ji çeperê hîsan berdide. Mîna ku me li jor jî gotibû, hunera klasîk xwediyyê naverok û şiklekî ku bi hevdu dikevin. Lê, divê bê zanîn, ku giyan ne bi tenê bi bedenekê ye û ne jî kombinîze dibe: Ew xwediyyê ebediyeteke bi reng Xwedayî ye. Lê, li pêşberî vê yekê, hunerê romantîk ligel amanc û niyetên xwe hunereke ku li ser bingehê Mesîhiyetê / Filehiyyê pêk tê bi xwe ye. Ji ber ku tu şikil yê ku li ser bingehê wisan pêk tê, nikarin naverokê ya ku li dorbera ramanan bi goşt û xwîn dibe, têr bikin. Hunermendêن romantîk jî, weke hunermendêن hunera sembolî li dar dixin, hê giyan mîna giyanî ji aliyê wan ve nehatiye li ber ketin. Ji ber ku ew mîna xaçerêzekê an jî

mîna pirsekê li meydanê bê bersiv maye. Ew ji şirovekirina naverokê wirdetir, bi tenê wê destnîşan dikan. Ew ji berevajiya vê yekê, giyanê mîna Xwedê pesend dike. Ji ber vê yekê jî, tu hîsên dinyewî an jî yên metaryalî yên ku ne ebedî ne, nikarin wê têr bikin.

Li gora Hegel hunera romantik li dorbera jiyan ya ebedî çalak e, wê ji xwe re dike mijar. Bêguman ev jiyan ya ebedî çalak e, wê ji xwe re dike mijar. Bêguman ev jiyan ya ebedî çalak e, wê ji xwe re dike mijar. Bi rastî jî, li gora bir û baweriya olên ezmanî giyan ji bo ku ji nû ve bê vejandin, dimire. Ew tê wê wateyê ku giyan bi saya mirinê dîsa dikare li xwe vegerê. Ma ne ji ber vê yekê ye, ku misilmatî dibêje: Dê Isa pêxember piştî mirina xwe dîsa rabe ser xwe, him jî li Şamê.

Bêguman, gava ku haya mirovî ji berhemên hunerî yên hunera romantik hebe, mirov dibîne, ku hûnermendêne vê ekolê berhemên xwe li ser hîmê pevcûna bi tevgêr û kirdariyê hunandine. Bi pirranî hunermendêne romantik li ser mûzîk, şîir û resmî çalak in. Ji ber ku hunera avaniya mîmarî nikare ji xwe re mîna ku jê tê xwestin, hindirûyê jiyanî ji xwe re bike mijar, an jî vebêje. Heçî peykertraşıye jî, bêtir hunera klasik ya kevnar ji xwe re dike mijar. Lî, divê newê ji bir kirin, ku jiyanî ya ji derve bi tenê vedibêje, ji xwe re dike mijar. Lî, li ba vê yekê, di kar û bare şîrê de berhem bi alîkariya gotinan, ango ji îmajên hisî yên ku bi alîkariya vegotina zimên têne vegotin, têne hûnandin. Dê ji ber vê yekê be, ku hunermendêne romantik meremên xwe yên hunerî bi alîkariya şîran tênin zimên. Ji ber ku bi vî awayî hêsan e, ku mirovê hunermend berhemên xwe biafirînin.

Ji aliyê din ve, divê bê zanîn, ku herçiqas hinek huner bi hinek nivşê huner yên giştî yê serekî re diguncin jî, divê ku ev yeka ha bi yekalî neyê fêmkirin. Mînak, weke me beriya niha jî destnîşan kiribû, ku hunera sembolî li dorbera fenomenen mîmarî tê afirandin. Ji ber ku hunera sembolî ya ku li dorbera kar û barê mîmarî tê rapêçan, bûyerên sirri bi awyekî afrîner, vedibêje, lê nikare jiyanê mîna ku jê tê xwestin, bi gelek alî şirove bike. Lî dema ku mirov vê yekê dibêje, nayê wê wateyê ku berhemên hunerî yên ku li ser bingehê hunera klasik û romantik têne afirandin, li dorbera serçaviyên mîmarî nayêne afirandin. Bi rastî jî, gava ku haya mirov ji perestgehê serdema girekiyên kevnar hebe, mirov dibîne, ku ji bo Xwedayê bi reng mirovî hatine afirandin, lê li himberê vê yekê gava ku mirov ser mizgefîn ku di dema misilmantiyê de hatine ava kirin, dirame, mirov dizane ku ji bo Xwedayê ku ne erd û ezman têra wî nakin, di nav xemlî xêza xwe ya bi reng mîmarî de dirapêçin. Ango, Xwedê bi hebûna xwe ya bê serî û bê binî, ango ebedî, mirov nikare bi awayê vegotinê, ya ku li ser bingehê dinyewî tê pêk anîn, tasawûr bike.

Herweha mirov dikare bibêje, ku hunermendiya bi alîkariya necariyê tê pê jî, mirov nikare di çerçewa hunera klasik de bi sînor bike. Ji aliyê din ve jî, divê mirov bibêje, ku hunera romantik jî di çerçewa resm, muzîk û şîrî de nayê bi tixûb kirin.

Vêca, heger ku mirov ji navbera nivşê huner yê herî bedewî qenc hilbijêre, mirov nivşê hunera klasik ya ku naverok û şîklê wê bi awayekî bi rêk û pêk bi hev diguncin, ji xwe re hilbijêre. Ji ber ku di serpêhatina afirandina berhemên hunerî de çi naverok û ci jî şîklê berhema hunerî hevdu dixemilînin. Ango, yek bêyî yekî nabe.

Lê, heger ku mirov bîreweriya estetikî weke qonaxekê ji qonaxa diyarbûna Xwedê pesend bike, wî çaxî jî, divê mirov pesend bike, ku nivşê huner yê herî bi rêk û pêk hunera romantikî ye. Ji ber ku di nav rapêçana berhemên hunerî yên romantikî de giyana ebedî di nav çeperên hîsî de nahile. Bi rastî jî, gava ku mirov hinek şîrîn Melayê Cizîrî dixwîne, miorv bi vê yekê dihise. Ji ber ku di nav rapêçana şîrîn Melayê Cizîrî de ji bîreweriya estetikî wîrdetir, liqayî bîreweriya olî dibe. Heger ku mirov vê yekê bixwaze bi awayekî din bibêje, tu fenomenike dînyewî nikare wesfê Xwedê vebêje. Ango, huner nikare bibe alîkar ji bo Xwedê ku bi xwezaya xwe ya rengîn bîhise.

Bêguman, gava ku Hegel hewl dida ku bi alîkariya kar û barê xwe yê li ser huner di çerçeweyeke dîrokî de bi rê ve bibe, çerçewa netewî ji xwe re bingeh digirt. Lê, çi heye, ku tasawûra wî ya dîrokî îdealist bû. Li gora wî rastiya dîrokî berhema giyanî ye. Mîna ku me berê jî destnîşan kir, Hegel ev giyan weke *Ramana Mutlaq* bi nav dikir. Hegel di kar û barê xwe yê hunerî de ji vê yekê hereket dikir: Ramana Mulaq pêsiya pêşî di nav xeml û xêza xwezayê de geş dibe, piştre jî di nav perê jiyana civakî de tê kemilandin û di dawiya dawiyê de jî ramana mutlaq bi alîkariya bîreweriya estetikî, felsefî û olî xwe nas dike. Ev perspektîfa Hegel ya îidealîst dibû kelem jê re ku vê yekê fêhm bike. Bê huner çawa ji bo gesedana civakî ya pîrozî bi gelek alî dikare bibe wesîte, herweha ew dikare bibe wesîta ji bo serpêhatiyê dîrokî û civakî yên ne erêni jî. Bela vê yekê jî, nerîna Hegel ya li ser huner bi nerîna hunermendêni romantikî ve digunca. Ji ber ku hunermendêni romantik di kar û barê xwe yê hunerî de ji perspektîfeke realist wîrdetir, wan dixwest ku nerînen xwe yê li ser huner bi alîkariya bîreweriya olî şîrove bikin. Bela vê yekê jî, nerîna wan ya li ser huner hinekî sematîk ma. Ji ber ku nerîna wan ya li ser huner ne bi alîkariya peywendiyan jiyana civakî ya konkret dihatin bi cî û war kirin, ji beravajiya vê yekê wan bi perspektîfeke abstrak li ser pirsgirêkîn hunerî kar û barê xwe bi rê ve dibirin.

Bêguman, di vî warî de gava ku mirov li ser şîrîn Melayê Cizîrî diraweste, mirov dibîne ku mij û morana olî bîreweriya estetikî kêm û qels kiriye. Lê, gelo mirov di-

kare Melayê Cizîrî weke hunermendekî romantîk destnîşan bike? Herçiqas di hûnandina şîrîn Melayê Cizîrî de û di hunermendiya hunermendên romantîk de ol cihekî girîng digre jî, mirov nikare wan bi hevdu re muqayese bike. Ji ber ku şârtiya Melayê Cizîrî li ser hîmê tasawûfê ku koka wê digihê serçaviyên jiyana Mezopotamya ya kevnar, ku ew jî bivê-nevê di bin bandora felsefe û tasawûra Zerdeşt de ye. □

## C A R Î N

Jîna min a kesnedî bi loq hat û rewan cû  
Geh li kaşê rastî geh li gaza derewan cû  
Gava giham qerexê xweşî û bêminetî  
Cendek li erdê pij bû jê b' nihêni rewan cû

**ROJEN BARNAS**

# Deryavanê pîr

JUHANI HINKKANEN

**H**ewaqilif vebû, belkî yekem car piştî sedan salan. Ez di kuna deriyê teng re ketim çaviyê (hucreyê), min deriyê biqilik girt û bi heyrane tê gihîştîm ku dikarim normala li ser lingan rabiwestim. Dixwiya ku gravîtasyongenerator û ku hin sîstemên din jî ên jiyanparêz hê di tevgerê de bû ji ber ku pîvîn min xwiyandin ku germahî têra xwe bilind bû û hewa jî kêtî nefeskişandinê dihat.

Ez bîskekê li benda serrastbûna pestê mam, piştre min kumzirx (mixfer) ji serê xwe kir û bîn kir hewa. Ew ziwa û bitoz dihesî û tijî bînek bijan bû. Min hewl da ji şaltera bi rex deriyê derê ve ronahiyê vêbixim lê nebû loma min kilçan ji ber keme-tra xwe vekir û bi xêra ronahiya wê min qilifê deriyê jorîn vekir.

Êdî ne li bîra min e ka ez li benda dîtina ci bûm, belkî wehşiyêñ rûs, mutantêñ duserî yan jî afirandiyêñ hê ecêbtir lê ez pêrgî yên wisan nehatim. Yekemîn tiş, ê ku çavê min pê ket, cesed bû, cesedê mîrekî lê ew ne xwediyê du seran û ne jî yê yekî bû. Ew bi awayê groteskî bi dîwarê kontrolçaviyê ve hatibû werîsandin, min niyet kir bibêjîm ser ber bi jêr de lê nexwe wî ser tunebû.

Min bi lezgînî çavêñ xwe li hawirdor gerandin. Afirandiyek jîndar nedihat dîtin û ne jî dengek bihîstin. Qet nebe jî, niha bi tenê bûm. Min hevalê mirî hinekî bi dîqettir seh kir û agahdar bûm ku ew mumyabûyî û kevirreq bû. Ew jî mîj de mîribû, herî kêm bi dehsalan, û mirinek hovane.

Zêde tiştekî din di kontrolçaviyê de tune bû. Tenê du derî hebûn, herdu jî girtî, yek ber bi fermangehê û yek jî ber bi guverteya rîwiyan de diçûn, qet nebe jî, eger

ew keşti li gor nifşkeştiyê Zemînê hatibû avakirin.

Bêguman min fermangeh hilbijart. Ji bo destpêkirina lêkolinan ew baştirîn cî bû. Qilifdîsk bi hêsanî zivirî û min hinekî derî vekir. Tu nîşan ji jiyanê nedixwîyan lo-ma ez bi bêdengî ketim navenda aştiya devjêberdayî.

Min çend pêngav pêşde avêtin û bi nefesgirtinê re rawestîm. Tarî û girtî bû lê dî-san jî ev ciyê bêşînor piştî derbaskirina bi mehan di mekîka teng de ji min re jiyanek hilfirende bû. Dengvedana madenî ya pêngavê min sawêrane dibihîzî û bi lê-dana dilê min, a ku guhan jî dibihîst, ez li pey xîça teng a kilçana xwe çûm.

Aliyê pozikê bi dermonîtorên mezin û ekranên kompûterê diniximîn. Ew tarî bûn, yek ji monîtoran peritandî bû û ew di bin qatêن tozê, yên ku tukesekî û tutış-tekî bi dehsalan destê xwe nekiribûyê, hatibûn niximandin. Paldankên operatoran li fermangehê belavkirî bûn û li navendê, ji yên din bilindir, sê yên din, ji yên ku ya navîn a kaptan bû, hebûn. Di ser hemûyan re banek bilind û tarî, hema mîna gumbetê hebû.

Ji bili monîtora şkandî hertiş destlînekirî dixwiya. Eyarker di neutralrawestêن xwe de bûn, pîvan sıfir nîşan didan û destikên bikaranîna kompûteran di rewşa aram de hatibûn qilifandin. Ango hertiş, mîna ku mirov di valahiyê (fezayê) de bi nifşkeştiyan rîwîtiyê dike, bû.

Lê li aliyê din ez li pîstekê, ya ku diviyabû yek nifşkeştiyek bi tenê jî lê tune bûya, rastî vê keştiyê hatibûm. Û hê jî min afirandiyek jîndar nedîstibû.

Niha sê derî li ber min hebûn. Ji aliyê rastê ve ez anîha ketibûm jor, ê navîn ser-derî, yê ku dibir asansorêن guverteya rîwîyan û derecegehê, bû lê niha yê aliyê çepê ji hemûyan pêtir bala min kişand. Ji bili ku mirov dikarîbû xwe bi rîya wî bigihîne hewaqilifek din, herwiha rî diçû nobetgeha kaptan, a ku pirranî caran pêlewar lê-ne, jî.

Sazûmana çaviyê jî mîna ya fermangehê baş bû. Dawiya dawîn min navê wê wendabûyî-devjêberdayiyê di yekemîn rûpelê vê pêlewara tradîsyonalî ya bidestni-vîsandî de dît. Utnapistim, li wir nivîsandî bû, û min recifek di hestiyê pişta xwe de hes kir ji ber ku min ew nav dizanî.

Utnapistim yek ji yekemîn nifşkeştiyê Zemînê bû û mezintirîna dema xwe. Sala 2130yan ew digel pêncêzar rîwîyan ji bo rîwîtiya asmanî ya dused salan ber bi gerestêra beta ya stêristana Herkules, a ku dişibe planeta me, dest bi rîwîtiyê kiribûn. Mesaja dawîn berî pêncî salan ji keştiyê hatibû wergirtin û ew mesaj ji dûriya bîstûpênc salan hatibû şandin. Ew kurt bû û tê de qet qal ji tiştek nenormal nehatibû kirin.

Piştre bêdengiyê dest pê kir. Piştî çar salan êdî peywendî qut bûn. Keştiyên çavdêran Utnapistim li ser rê û dokgeha wê nedît. Ji destpêkê ve lêgerîna wê di valahiya bêsinor de xeyalek vala bû û piştre tiştek ji keştiyê nehatbihîstin, heta ku meteorradara min ew piştî nêzîk şeşsed salan li nêzîk asteroïdnâvçeya alfa Draconis dît.

Pêlewara li ber min beşa pêncem bû, û yekemîn not li gor dema subjektîv arêwîyan 38 salan piştî çûna keştiyê hatibû ragihandin. Wê dida diyarkirin ku tam piştî tamîrê yê normal keştiya çavdêran ji wan vebûye û di hîpervalahiyê de wenda bûye.

Bi xwendina hinek ji wir hinek ji vir, min pirtûk ber bi pêşde qulipand. Xwezaya notan, heta ku bi qasî sed rûpelan pêşde çû, rotîn bû. Min xetên lakonîk du caran xwendin heta ku ji çavêن xwe bawer kir. Me heretîk kuştine, tê de dihat. Em sermotoran bi kar tînin û ber bi biheşte de seyr dikan. Piştre tenê tiştên vala hebûn.

Rêwîyan kursa keştiyê guherandibû. Ew yek ji wan tiştan, ên ku nedihatîn kîrin, bû. Nifşkeşti di praktîkê de fişek, ên ku ber bi rojbenda hedef de hatibûn berdan, bûn. Motor tenê ji bo lezahiya destpêkê, rawestandin û manovera rêberiyê di nêzîkbûna armanca dûr de dihatin bikaranîn ji ber ku mazota tu kaniyan têra zêdekirina lezahiyê di rêuwîtiya tonahîsalên dehan salan nedikir. Û bêguman pirranî caran bikaranîna motoran di destêن çavdêren mîna min de bû.

Gerên navstêri ji pirranî afîrandiyêن aqilmend re tenê bi nifşkeştiyan mumkun in, û ew ger bi sedan salan demê dixwazin. Kurterê jî heye lê kêm dikarin wê bi kar bînin. Ew di dîmensiyona hîpervalahiyê, ya ku carna jê re servalahî jî tê gotin, re diçe, û ev dîmensiyon niqteyên dûr ên valahiyê bi hev re girê dide û bi demkî leza ji ya tonahiyê zêdetir jî mumkun dike.

Gerîna di hîpervalahiyê de ne problemek teknîkî yan lojîstîkî lê pêtir a ruhî û psîkolojî ye. Her kiwanîfîzîkzanek dikare bê serêşî prensîpa dîmensiyongeneratorê tê bigîhe û bi vê yekê, çiqas girseyê bixwaze, rabiguhezîne hîpervalahiyê. Lê ji sedmîlyonan an mîlyaran mirovek dikare di hîpervalahiyê de bigere bê ku aqilê xwe yan jî, qet nebe, ruha xwe ji dest bide. Ji van kesen kêm çavdêr tê hilbijartîn.

Çavdêr di unîversumê de kevtirîn organîzasyona jîr e. Ji destpêka wê ya rast tu belgeyên piştrast nîn in lê li gor lejendant ew abadîn e û herdem hebûye. Ew ji hemû cîhanan wan afîrandiyêن ponijende, yên ku baldirêjiya hemû nexweşiyêن ruhî yên hîpervalahiyê hene û bi dilê xwe dixwazin bibin çavdêr, li xwe kom dike.

Karêن çavdêran pirralî ne, beşek ji wan ji kesen din re nihînîkirî û famnekirî ne jî. Ji wan karan tamîtkirin û çavdêriya nifşkeştiyan ên herî piçûk in tevî ku mirovîn adî ji hemû karêن çavdêran pêtir ji wan cure karan agahdar in. Ez bi xwe xelkê

Zemînê, ya ku ev demek pirr dirêj e Utnapistim jî jê çûye, me. Ez berî Utnapistimê jê derketim lê gelek jê ciwantir im. Piştî çûna xwe ez hejdeh salan pîr bûme lê di wê navberê de li Zemînê heftsed sal derbas bûne. Ez niyet nakim tucaran lê vebigerim ji ber ku ez ê êdî wê wek mala xwe hes nekim.

Em hemû çavdêr goriyên (qurbanê) relativîzmê ne û loma di tenêtiyê de hatine destbiserkirin (mehkûmkirin). Bi çûnê re em dizanin ku belkî em ê êdî tucaran hevalên xwe yên berê nebînin.. Bi vegerîna me re dibe ku ew bi pîriyê miribin an jî bi xwe bi firîna di hîpervalahiyê de xwe gihadibin ayendeyek hê dûrtir.

Pêlewarê gelek pirs şiyar dikirin lê tenê piçek dibersivandin. Dixwiya ku serokatiya keştiyê hê di destpêka firînê de xwe ji rîwiyên din îzole kiribû, û dawiya dawîn hera serhildanê rewş ber bi xerabbûnê de çûbû û encam jî kuştina serokatiyê bû. Hin taybetmendiyên olî, yên ku min tiştek jê seh nekir, girêdayî vê mijarê hebûn. Ji bo standina bersivan min biryar da ku xwe bigihînim guverteya rîwiyan û li wir li bersivan bigerim.

Hê di destpêkê de asteng li ber min bûn. Serbersifk (serkorîdor) ji berî ku bigihe dereceyan bi dîwarek madenî yê xerabçekirî dihat rawestandin. Ne ecêb bû ku dev ji kontrolçaviyê hatibû berdan. Rîwiyan bi hermetikî xwe ji her cure kommunîkasyona bi cîhana derve re qut kiribû.

Dîwarok zêde stûr nedixwiya û zarzor wisan bû. Bê pûckirina strukturên bingehîn madenên qayîm ji wan re nehatibûn peydakirin loma min ê bikariya bi alavên keştiķa xwe wan bi asanî biherifinim. Lî tevî vê yekê jî min biryar da ku pêşî li rîgehîn din ên potensiyonel, mîna rîyên cîgir, asansorêni ji bo tamîrkirinê û kanalên hewaguhêziyê, bigerim lê ew jî girtî bûn.

Ambarên mezin ên guverteya rîwiyan bi otomatikî li derî hesabê bûn ji ber ku bê nasîna rewşê vekirina wan bi hêza mîrekî ê gelek talûke bûya. Rijnek piçûk, a ku bi sedsalan berî niha di hundurderiyê wan de qewimîbe, dikarîbû bibûya sedema dekompresyona teqende ya hemû keştiyê. Tenê derfetek di destê min de ma, herifandina dîwarokekî. Ü eger min bikariya, bi bêdengî.

Wek ciyê herî baş min derece, yên ku li quncikek ji yên guverteya tamîrxaneyê bû, dît. Min bi seqbêrî dest bi sojandin-birrîna kunek piçûk, a ku min tê re tenê tarîtî û bêdengiyek bêhempa dît, kir.

Piştî guhdariya bîskekê min karê xwe domand, û di nîv saetê de kun ewqas mezîn kiribû ku min karî xwe tê re biavêjim hundur. Bi çûna min a ber bi jêt de bi pêngavêni biseqbêrî min yekem car di vê keştiyê de xwe ewqas hêrsbûyî hes kir. Ez ji tarîtî û bêdengiyê ditirsîm lê raman ji bidawîhatina wan hê pêtir ez dierjengan-

dim. Demek dirêj ez di nav dewletên miriyan de gerîm. Nifşkeşti ji hemû afirandiyê bi destêni mirovan çêkirî ecêbtir in, lêgerîna çardeh guverteyên Utnapistimê digel bersifkên wê yên bi kilometreyan dirêj û bi hezaran çaviyan ê bi hefteyan dem bixwara. Keştikên piçûk, ên ku pirranî caran ji aliyê çavdêran de têni bikaranîn, dikarin bi balafirêni Zemînê re bêni berhevdan lê nifşkeşti bi buxarkeştiyêni berê, yên ku li oqyanûsêni Zemînê diseyirîn, bêni muqayesekirin.

Piştî mana roja pêncem di çaviyek piçûk de ez pêrgî yekemîn nîşanên jiyanê hatim. Mîna Robinson Crusoe min raste-rast li şûnpiyên taze, yên ku di tozê de çap bûbûn û li bersifka teng bûn, dinerî. Dawiyê min ê lêgerî bidîta lê li şûna ku min ew vebigeranda nav mirovan, min xwest zû ji vî nenasî birevîm û wî di nav van şkeftên bidestçêkirî debihêlim. Lê xwesteka min bêhêvî bû.

Lê di heman demê de tê gihîştîm ku dereng bû. Biryar êdî ne di destêni min de bû. Xwediyê şûnpiyan li ber deriyê çaviyek deh metreyan dûr bû û çavêni wî di ronahiya biriqende ya kilçana min de diçîrisin. Min hewl da bipeyivim lê nikarî. Zimanê min werimî û cemidî dixwiya û min nikarî bêjeyen têgihende derbînim. Ew hat nêzîktir. Ew rût bû û mîr bû, pirr pîr û hincirî dixwiya. Wî destê xwe yê hestîn raberî kilçanê, ya ku min bi bêagahî xistibû, kir û mîna jîndarekê ew rakir û pêşkêşî min kir.

Min ew bi mekanîka robotane jê wergirt û bi devê nîvvekirî li pîremêt, yê ku hewl dida bi bawerane bibişire, dinerî.

Ev ne rast bû! Nexwe ez şareza bûm û ew wehş. Di wê demê de hemû bendewariyên min ên binbîr şiyar bûn û dixwiya hemû tevlihev bûbûn.

Pîremêt li benda min bû. Diviyabû min tiştek bianiya ziman lê di wê rewşê de min ê çi bigota?

– Ez çavdêr Jon im, dawiya dawîn min bi zimanê rûsî, yê ku hema min ji bîr kiribû, got. Min bawer kir ew tê bigihe ji ber ku pêlewar jî bi rûsî hatibûn nivîsandin.

Wî bi bêdengî raste-rast li min nerî. Tîrsa min hêdî hêdî verevî lê min xwe nearam û şermîn hes kir. -Ma tu dizanî çavdêr çi ye? Ma tu qet ji peyivîna min fam diki? min domand tevî ku tê gihîştîm ku eger bersiv neyêni be, pîrsa dawîn bêwec bû. Bi heyrane pîremêt, mîna ku fam kiribe, serê xwe hejand. Piştîre wî nîşandektiliya xwe ya destê rastê bir ber guhê xwe û dîsan serê xwe hejand. Min di cî de mebesta wî averû kir. Wî hewl dida kerriya xwe bide ragihandin.

Yekemîn ramana min ew bû ku pîrsan li ser kaxizekê binivîsim lê zarzor min alavîn nivîsandinê derxistibûn, wî carek din jî serê xwe hejand û bi bişîra xwe ya nihi-

nî û xemgîn bişirî. Ez jî hinek bi zorê lê bişirîm û min pêñûs û têñûs raheşandin paxilberîka xwe. Kenda kommunîkasyonê di navbera me de di-ser-re-neçûyî dixwîya. Tenê raman jî ji afirandina zimanek nîşandekî ez dierjengandim. Wê yekê dê demek dirêj bixwesta û ji bilî vegeŕîna keştiya xwe ya nas û li wir serrastkirina vê bahoza ramanan pêtir min tiştek nedixwest.

Lê tiştek diviyabû herî zû bê zelalandin. Eger ev rîwiyên din dijîbûn, ew li kû bûn? Belkî ez ê bi wan re baştîr bi ser biketama ji ber ku ew hemû ê ne kerr û lal bûna.

Ji bo kalo zelalkirina bi nîşandekan û xîçandina wêneyan demek dirêj ajot. Da-wiya dawîn bawerîm ku mebest jê re hatibû ronîkirin, û ji jest û serhejandinê wî tê gîham ku ew bi tenê di keştiyê de bû. Lê dîsan jî min zanî ku heta min Utnapis-tim heta guverteya jêrîn seh nekiribûya, min ê nikarîbûya piştrast bibûma.

Wisan min tevî bêdiliyê jî pêşdeçûna xwe domand, û pîremêr mîna kûçikek bi-bawer lê bê tu nîşanên radestbûnê li pey min dihat. Min ew mîna zarokek bimeraq an çavdêrek derve dihesiband, û bi herikîna demê re hebûna wî ya berdewam bi min re rewşa min a ruhî bi erêni bandorand. Wî hesa piştnerastiyê ya valatî û tenêtiyê afirandî pûc kir û di heman demê de agahdar bûm ku aniha bi coşek bilind li benda dîmenên li pişt derî bûm.

Yek ji pirsêن min ên demek dirêj ponijandî bi gîhîstina me ya guverteya nehem re bersiva xwe stand. Çandiyên hîdroponîk ên vir bûbûn û hê jî li wir bûn lê zîrr bûbûn û wek kevz- û kivarkxalîçeyen gewr-qehweyî di guverteyê de belav bûbûn. Wan ê têra xwarina grubêñ mezin jî bikira, qet nebe jî, bi qasî ku çerixandina xwardemeniyê bixebitiya.

Lê ew grubêñ mezin li kû bûn? Ci li wan qewimîbû?

Roja din pîrsa paştîr cure bersivek stand. Ew ne tiştek dramatîk û bi rastî ne libendê-nebûyî bû. Problem pûçbûna xwezayî ya teknîka kivîkevn bû û encam jî misoger. Starkirêñ fisyonreaktora kevnar bi herikîna demê re dest bi rijînê kiribûn û radyasyon bûbû sedema mutasyonan û dawiyê kîmbûna jidayikbûnê. Tenê demê ê nîşan bidaya ka kengî keşti ê bi termamî bi kêt jiyanê nehata.

Edî min newêrî bê startaxima cil lêkolînêñ xwe bidomînim. Anîna wê taximê ji keştiķa min ê zêde dema min bixwara û qelafeta wê ya req û giraniya wê ê meşîna min hêdî û zehmet bikira lê şansa min bû ku gera min a lêkolînê ber bi dawiyê de diçû. Lê hê surprîzek mabû û eger ez hemû vê dîdarê ji bîr bikim jî, ew ê heta da-wiya jiyna min li bîra min be.

Ez westî li serbersîfka guverteya jêrîn digerîm heta pêrgî cotderiyek mezin hatim.

Bi niyeta min a vekirina wî derî û meşîna ber bi pêş de re min hes kir ku pîremêr di zenda min re girtibû. Min li wî nerî û bi lez serê xwe hejand. Dixwiya ku li pişt derî tiştek, a ku wî nedixwest ez bibînim an ew bi xwe jê fitirsî, hebû Lê ew ci dibû bila bibûya, diviyabû min ew bidîta. Diviyabû min bersiv bistanda.

Min ew ji xwe dûr xist û derî vekir. Pîremêr qîjek tûj berda, yekemîn û dawîn deng, ê ku min jê bihîst. Ü dema ku mejiyê min dîdarêñ kilçana min nîşandayî tomar kirin, ez bi xwe jî qîrîm û ji vekirinê bihêztir û bileztir daxist.

Kêm mabû ez ê ji wir birevîma. Hemû jîxwebaweriya min komkirî wenda bûbû. Pîremêr di quncikekê re paldayî hemû bedena xwe kişandibû nav hev û kinîna (kinkinkirina) bi bêdengî re direcifi.

Min xwe spart stûnekê û hewl da ramanên xwe berhev bikim. Hêdî hêdî aqilê selîm ser ji tîrsa îrrasyonalî ya min heskirî stand. Min dîsan derî vekir û xwe mecbur kir bi aramî û hûr-kûr li erjenga berî bîskekê binerim.

Derî rê li ber audîtorekê, ya ku mîna amftiyatroyan heta bilindiya ban dirêje-kursî hebûn, vedikir. Audîtorî mişt-tijî bû. Herwiha mirovên li erdê rûniştî û yên ku pişta xwe dabûn dîwar hebûn, û dixwiya ku ew wan hemûyan raste-rast li min dinerîn.

Lê wan bi çalika çavêñ vala dinerîn. Ew mirî bûn, û pêwîst nîn e ku mirov ji miryan bitirse. Dawiyê ez pêrgî rîwiyêñ wendabûyî yên Utnapistimê hatibûm.

Heta wê bîskê mirî, yê ku ez ras tî rastî hatibûm, laşê bêser ê di kontrolçaviya hewaqilif de bû, û min texmîn kiribû ku mirî, mîna ku banek bû, li çerxê hatibûn ve-gerandin ji bo ku bibin element û piştre jî xwarin. Ez bawer im demek dirêj wisan hatibû kirin lê ji ber sedemekê, belkî ji ber biserneketinek teknîkî, ew kes anîbûn vir. Di keştiya girtî de tu rê ji bo pûckirina wan tune bû. Hewayê ziwa laşen wan mumye kiribûn, û min hejmara wan wek ji pêncsedan zêdetir hesiband.

Ji bo kirinê zêde tiştek di desten min de tune bû û eger ew pîremêr tê de nebûya, min ê Utnapistim li wir bihişa û debiketima. Lêkolînên min dan xwiyandin ku ne keşti û ne jî pîremêr ê demek dirêj xwe negirtina. Ew bi otomatîkî hatibûn mehkûmkirin ji ber ku min ê nikariya wî bi xwe re bibim. Wî ê nikariya di hîpervalahiyê de xwe rabigirta ji ber ku ew ne çavdêr bû. Stemkarî bû min ew di Utnapistimê de bihişa lê bi xwe re birina wî ê hê jî zordartir bûya ji ber ku di hîpervalahiyê de ji berî mirinê dînî û janêñ dojeyî jî dihatin.

Kesek ji min xwînsartir û bêhestir ê belkî ew bi yekcarî bi lez û, hêvîdar im, bi bêşî jî bikuşa lê tutiştek wisan ji min nedihat. Hemû alternatif hevqas bêmoral dixwiyan. Ma diviyabû ez li wir bimama û bi wî re bimirima?

Ji hertiştî bijantir bêbiryarî bû. Ez bi rojan li fermangehê, li cî, yê ku diviyabûê pîremêr bûya ji ber ku ji hemû rîwiyêñ Utnapistimê ew jînmayî bû, li wit ez rûdiniştîm û min raste-rast li monîtora şkestî dineri. Pîremêr bi xwe li guverteya rîwiyan dima û tu hêzekê ê nikariya ew ji deriyêñ bi kewandinê (lehîmandinê) girtî dûrtir baniya. Dawiyê min çareyek asanâtir û, bawer im, tirsokanetir jî hilbijart.

Min pêlewaên keştiyê û hemû materyalên din jî yên nivîsandî û tomarkirî, yên ku ketin ber destêñ min, ber hev kirin û di hewaqilifê re raguhezandin keştiya xwe keştiya xwe. Piştre min ambarêñ wê ji xwarinan, ên ku pêwîstiya min pê tune bû, vala kirin û ew xwarin birin guverteya rîwiyan. Bi rastî ez aram bûm ku min pîremêr nedît. Kî dizane ew di kîjan quncika wê keştiya bêşînor de bû loma lêgerîn ê bêşûd bûya. Ji ber vê yekê ez vegeŕim jor û raguhezîm keştiya xwe.

Hê bîskekê min hişt keştiya min li tenîşa Utnapistimê biheje û carekê kêm mabû ez ê vebigerama. Piştre min xwe tûj kir, keştiya xwe lezand dûriyek biewle û min xwe ni bihêzkerâ mejîpêlan ve girê da. Dema ku şalter, a ku ez ji rastiyê dûr xistim û di sînorê nebînende re avêtîm wê cîhana kaotik a ku jê re hîpervalahî tê gotin, min kewgirînek nas û gurmînek di guhêñ xwe de hes kir.

Ü niha, pişti dehsalan jî Utnapistim û rîwiyê wê yê dawîn carna têñ bîra min.

Wergera ji finî: **HUSEIN MUHAMMED**

Çapa orijinal: Vanha Merimies

Ji pintûka TÄHTIPUU - 33 kotimaista titeisnovellia

### Sererastkirin:

Di xeta yekem a rûpelê 89an a hejmara 3oyan a NÛDEMê de ev beş ji çfroka Antti Oikarinen *Du Ciwan û Cenawer* ji nav bêjeya "tab-çik" ketiye. Ez serrast dikim û hêviya lêborînen ji xwendevanêngiranbiha dikim.

...ureyên piçûk rûniştin. Aioran bi aramî kevçî li şorbeya bibuxar dida. Xizmêñ wî bi xwarinê re bimeraq berre-berre li salona mezin û piştre jî li biçimê kûd ê Cenawer, ê ku bi destêñ jinikê dihat xwarandin, dinêrin.

Aioran sêniya xwe danî erdê, qurçek dirêj li meyqedeha xwe da û bi dilxweşî nefesberda.

– Ez spas dikim, Cenawer.

Cenawer bi seqbêri serê xwe çemand ji bo ku kevçiyê nêzîk dibe nerijîne.

– Ciye dilxweşiyê ku mirov di dema gerrêni wiha zehmet de li ciyek ewqas mîvanperwer bîna xwe bide.

Aioran dîsan firrek ji qedeha xwe vexwar.

– Eraq pîr xwes e. Ez bawer im tu dixwazî nûçeyan bibihîzî. Cardin Vargan zam daniye ser gomrikên xwe di navbera Welatên Nû û yên Kevin de. Li wir li Bakur dîsan rewş ber bi xerabbûnê de diçe. Melvor û Gurgas Varg şiyar kirine, Endinton li xwe bidiqqet e. Tê bî-hîstîn ku Vargan cure peymanek bi mîrzayê Nakabatolê re heye.

– Ax gidiyo, Dorgul dixwaze wir!

– Ew xwe li her aî diceribîne. Bibe şer. Belkî li Başûr li Andolê yan jî li Bakur li hember Welatên Kevn. Kes nikare planêni wî bizane.

Cenawer bi gurmîckên dest gogeçavêni xwe perixandin û piştre vekirin.

– Lî ji bo pevçûnê mezintir dibe ku hê çend sal mabin. Loma bawer dikim baştıri e em niha hinekî li ser bazirganiyê bipeyivin. Tu dibînî, ev sî sal di ser re derbas bûn.

Aioran çavek avêt jinikê ya ku gepa Cenawer paqîj dikir.

– Min yeke nû heye.

Jinikê hew paqîj kir.

– Nexwe tu ji Rojavayê tê. Pirranî caran tu wan ji Welatê Ciohdikê tînî, ji cure kerxaneyekê dikirri.

– Ev tenê pêrgîhatinek e. Wisan lê ket ku me keçikêk, a ku li gora serê xwe digerrî, li Rambol- mah- Thaciyê dît, û em fikirîn ku dibe tu di demek nêzîk de pêwîstû wê bibî.

– Ez dixwazim wê bibînim.

– Meraq meke.

Aioran bi zimanê xwe tiştek ji xizmîn xwe re got, û pişti sohbete kurt du ji wan ji salo-nê derketin.

Tukesekî li jinika pîr, a ku bêtevger li rex kursiya Cenawer li ser piyan bû, nedînêri.

Tukesekî ji Sornayê re negot ka ê wê kû de bibin, Bejnboştîn piçûk, kirêt û bîno ew di kevirbersîfka teng de ber bi pêş de dehf dida. Sorna çend caran s^ewis^î (tilpekî) lê des-tênm bihêz ên bejnbostan, ji berî ku ew bikeve, ew zehf dikir. Bersîf bi qumas^ek stûr bi dawî dihat. Dema ku bejnboştîkî qumas^ rakir, ê din di guhê Sornayê de pistî:

– Niha tu ê xwedîyê xwe bibînî.

Û piştre ew ber bi salona mezin de hat dehfdan.

Li quncika salonê sobe digel agirê hillkirî hebûn. Bi xêra ronahiya çirûskêni agir wê du bejnboştîn rûniştî dîtin. Li ber singê wan jinikek pîr a porspî li ser lingan û... afirandiyek kapose yê xwedîyê serek bêsinor. Ev afirandi li wê zivirî.

Carekê ew rû jî rûyê mirovan bû lê niha ew bi awayekî erjengî çemîbû û guherîbû.

Sornayê ê qîjek berdabûya lê wê destêن wî afirandî dîtin. Ew ji yên bejnbotan kurttir bûn û hema hinekî ji navpişte dest pê dikirin, bê mil. Tilî kurt û stûr bûn. Baş zelal bû ku bi wan destan tiştek ê nikaribûyabihata kirin. Weyla rebeno!

– Rojbaş, wî bi dengek tijîawaz, ê ku mîna yê mirovek adî bû, got.

– Ez Cenawer im.

– Ez Sorna Mirabutis im, ji bajarê Vorgitseiyê, Împaratoriya Melvor.

Cenawer bi rêzgirtinê serê xwe çemand û çend gotin ji bejbostan, ên ku bi xwetewandinê derketin, re gotin.

– Tu dikarî rûnî, kerem bike.

Sorna rûnişt. Cenawer li rûyê Sornayê nêri. Ew ciwan, bohêz û pirçer bû. Hemû taybetmendiyê rûniştvanê Welatên Kevn di wê re diyar dibûn.

– Tu çawan hatî vir?

– Bejnbotan ez anîm, wê hinekî bi galteyi got.

– Ez dizanim.

– Ez di keştiyekê, ya ku ê ji Vogritseiyê ber bi User de seyr bikira, de bûm. Ji berî tengava Vargê bahozê keşti girt û ji Dramwo dûr ber bi başûr de derbas kir. Me hewl da ku xwe bispêrin fiyorda Thaz. Dixwiye ku em bi ser neketin. Ez li qeraxê şiyar bûm û li alîkariyê gerim. Ji berî ku ez giham wê bibinim, bejnbotan ez dîtim.

– Belkî te ê tu alîkariyek din ji Rambol- mah- Thazê nedîtibûya. Û tu dikarî ji wan re kevirkêş bibêjî. Ew wî navî dinirxînin.

– Dixwiye ku tu vê pêngavê bi pitrastî diavêjî.

– Çima na, nexwe heta niha baş boriye, wî, teví ku di nav xwe de bi awayekî din hes dikir ji, bi gernasî ilan kir.

– De ka tu ji min re nabêjî, tu kî yi? Ke...


## Mizgîna me li we!

**E**dî hûn dikarin bi riya Internetê jî li NÜDEMê binerin. Adresa  
Maloka NÜDEMê ku di pêvajoya avakirinê de ye, ev e:  
[welcome.to/nudem](http://welcome.to/nudem)

E-maila Nûdemê jî ev e: [nudem@telia.com](mailto:nudem@telia.com)

# Ronesansa çanda kurdî li Sovyeta berê

WEZİRÊ EŞO



**D**i sala 1953an de, Stalin weke ku jê re dihate gotin, bavê gelan, wefat kir. Piştî wefata wî, partiya komunîst û hukûmeta Sovyetê zor û zilma wî û hogirên wî ya li ser gelên Sovyeta berê rexne kirin û pir kes û gel yên ku ji aliyê wî ve hatibûn gunehkarkirin, girtin û sergom kirin, ji wan lêbûrîn hate xwestin. Bêguman, di nava wan de birek ji kurdan jî hebû. Qedexa li ser ziman, edebiyat û çanda kurdî jî hate rakirin. Erebê Şemo jî ji sergomê vege riya Ermenistanê. S. Tovmasiyan girecir û ronakbîrên me kurdan li dora xwe civandin û bi wan re li ser pirsgirêkên çanda kurdî yên ku ji bona ji nû ve vejandina wê girîng bûn, gotûbêj kir. Ji xwe, ev civîn bêyî agahdarkirina Moskowayê nehatibû lidarxistin, dibe ku li ser agahdariya Moskowayê ew civîn hate pê. Piştî vê civînê, rê ji bo pêşvebirina edebiyat û çanda kurdî, ji vê yekê wîrdetir, ji bo kar û barê li ser kurd-nasiyê hate vekirin.

Bêguman, mirov dikare ji vê yekê re bibêje: Ronesans. Ji ber ku, weke ronesansa li Ewrûpa Rojava bû, ku di sedsalên navîn de bi lêvegera çanda kevnar ya Girek û Romayê hatibû pêk anîn. Belê, dema ronesansa kurd piştî bêdengiya salên 40î kin bû, lê ew dişibiya vemirin û ronesansa welatên Ewrûpayê.

Di sala 1955an de careke din dest bi weşandina rojnama Riya Teze hate kirin, ya ku weke rojnama fermî ya partî û hukûmeta Komara Ermenistanê dihate qebûlki-

rin. Bi qasî 30 salî Mîroyê Esed berpirsiyariya wê kir. Piştî demeke kin Tîtalê Efo bû berpirsiyarê wê, lê piştî wî hetanî niha jî Emerîkê Serdar berpirsyariya wê dike. Di eynî salê de, bi serkêsiya Casimê Celîl beşa axaftinên bi zimanê kurdî di radyo-ya Ermenistanê de hate vekirin. Piştî Casimê Celîl, Xelîl Mûradov bû berpirsiyarê wê, lê piştî wî jî Ehmedê Gogê û Keremê Seyad bûn berpirsyarên wê.

Di nav Yekîtiya Nivîskarê Ermenistanê de bi berpirsiyariya Heciyê Cindî kar û barê seksiyona nivîskarê kurd hate geşkirin. Li weşanxana dewletê birê weşandina pirtûkê kurdî hate sazkarin. Di destpêkê de Ema Üsiv bû berpirsiyar û redektora wê beşê, lê piştî wê Casimê Celîl bû berpirsiyarê wê. Û dest bi weşandina pirtûk, berhevkirin û berhemên şâîr, nivîskar û zanên kurdan hate kirin. Gava sala 1958an Iraq ji nav pakta Bexdayê derket û ket nav bloka “diji” împeryalîzmê, Yekîtiya Sovyet politîka xwe li Rojhilata Nêzîk aktîftir kir, lê di eynî demê de, gava serhildana kurdan li başûrê Kurdistanê hate destpêkirin, îmkan jê re çêbûn, ku kerta kurdan ji bo kelka xwe bi kar bîne. Lê, ji bo birêvebirina politîka xwe ya di derbarê kurdan de bi giştî pêkanîna bingehê zanyariyê pêwîst bû. Dê ji ber meremên politîkî be ku di sala 1959an de du navendên kurdzanînê bi hev re hatin vekirin: Yek li Êrîvanê, lê ya din jî li Petersburgê bû. Heciyê Cindî bû serokê beşa kurdnasiyê yê Înstîtuta Rojhilatzaniyê ya akademiya Ermenistanê ya zanistî li Êrîvanê, lê Qanatê Kurdo bû serokê kabîneta kurdzaniyê ya Akademiya Sovyeta berê ya zanistiyê li Petersburgê. Piştî Heciyê Cindî, Xalit Çetoyêv û Şekroy Mihoy bûn serokên vê beşê. Di eynî demê de dest bi lêkolînên li ser kurdnasiyê li Moskowa, Bakû, Samarqand û Tıvlîsê hate kirin. Li Ermenistanê dîsa dest bi weşandina pirtûk, ziman û edebiyata kurdî ya ji bo zarokên kurdan hate kirin. Li gundên kurdan ev kar careke din hate birêvebirin. Lê, ji bo gihadina kadroyên dersdar li Êrîvanê di dawiya sala 1950î de xwendingeha kurdî ya pedegojiyê hate vekirin. Di pey wê re, beşa kurdnasiyê li Fa-kulta Rojhilatzaniyê û li unîversîta Êrîvanê hate vekirin.

Rast e, ku şanoya kurdî ya dewletê careke din nehate vekirin, lê di şûna wê de dîsa li gundê Elegezê şanoya kurdî ya gelêri hate vekirin.

Li Êrîvanê û navçen Ermenistanê yên ku kurd lê diman, komên kurdan yên stranbêjan bi destê Aramê Çeçan, Sûsika Simo, Şamilê Beko, Egîtê Cimo û yên din hatin perwerde kirin.

Emînê Evdal li Êrîvanê muzeyeke kurdî ya piçûk vekiribû, lê piştî mirina wî ew hate girtin. Di salê dawî de mirovekî kurd di şareza gundê xwe de li ya Şahûmiyanê li navça Ecxemyazînê, li mala xwe muzeyeke pir balkêş ya çek û aletên kurdî vekiribû.

Pêşveçûneke edebiyat û çandê yeke diyar li paytextê Gurcistanê, li Tıvlîsê hate

pê. Bi serokatiya Baxçeyê ïsko seksiyona nivîskarên kurd li nav Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê hate saz kirin. Herweha, Baxçoyê ïsko û birayê wî, Ezîzê ïsko di dibistanên Tîvlîsê yên ji hev cuda de dersên ziman û edebiyata kurdî didan zarokên kurdan.

Di wan salêن dawî de li radyoya Gurcistanê beşa axaftina bi zimanê kurdî bi serokatiya Keremê Angosî hate vekirin.

Cerdoyê Esed ligel çend hevalên xwe komên kurdan yên stran û govendê organîze kirin. Herweha, Mirazê Ûzo li Tîvlîsê şanoya kurdî vekir.

Li paytexta Gurcistanê, di van salêن dawî de wênekêşen kurd yên şareza pêşve çûn. Di nava kurdên Azerbeycanê de pir heyf e, ku di wê demê de tiştekî qenc ne-hate pê. Ji ber ku ew weke kurd temirîn. Her bi tenê, li Bakûyê ji aliyê çend kurd-zanan ve lêkolîn li ser kurdzaniyê hatin pêkanîn. Di nav kurdên Turkmenistanê de jî tu tiştekî bi kêt i qenc ji bo çanda kurdî nehate pêkanîn.

Kurdên Qirgizistan û Gurcistanê yên ciwan xwe li xwendinê girtin, lê nikarîbûn tu karekî li ser edebiyat û çanda kurdî bi rê ve bibin. Bidesxistina deh salêن dawî (hetanî sala 1988an) ya herî mezin pêşvebirin di warê edebiyat, çand û kurdzaniyê de li Ermenistanê hate lidarxistin. Hema li vir jî, artêseke ronakbîrên kurd yeke mezin hate gihadin. Pir balkêş e, ku bi tenê li gundekî vê navçeyê yê kurdan yê Elegazê biqasî 60 keç û xortêن kurdan xwendina bilind bi dest xistin.

Em niha, bi giştî hewl bidin, ku navêن wan nivîskar, zanyar û rojnamevanêن kurd yên ku li Sovyetê berê û nexasim li Ermenistanê rabûn, rêz bikin.

Li ba nivîskarên nivşê pêşî yên ku bingeha edebiyata kurd li Sovyeta berê danîn, ku navêن wan êdî nas e, nivîskarên nivşê nû jî pêşve hatin: Nadoyê Xudo, Qaçaxê Mirad, Üsivê Beko, Mîkayilê Reşîd, Eliyê Evdilrehman, Mîroyê Esed, Sihîdê İbo, Şikoyê Hesen, Fêrikê Üsiv, Baxçoyê ïsko, Ezîzê ïsko, Simoyê Şemo, Karlênen Çeça-nî, Cerdoyê Esed, Şemsî, Xelîl Miradov, Ordîxanê Celîl, Emerîkê Serdar, Rizaliyê Reşîd, Tosinê Reşîd, Eskerê Boyik, S. Siyabendov, Aramê Çeçan, Egîtê Xudo, İsmailê Diko, Babayê Keleş, Egîtê Ehmed, Ehmedê Hepo, Sîma Semend, Korda Mad, Ezîzê Gerdezerî, Çerkezê Reş, Şerefê Ezîz, Ehmedê Gogê, Mecîdê Silêman, Vanikê Elîxan, Celîlê Eco û yên din.

Wek rojnamevanêن kurd jî, di rojname Riya Teze de û di beşa axaftinêن kurdî ya radyoya Êrivanê de bi demên kin û dirêj kar kirin û yên ku bi nav û deng bûn: Cerdoyê Genco, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casime Celîl, Mîroyê Esed, Qaçaxê Mirad, Şekroyê Mihoy, Xelîl Miradov, Emerîkê Serdar, Tîtalê Efo, Fêrikê Üsiv, Şikoyê Hesen, Mîkaîlê Reşîd, Karlênen Çeçanî, Tîtal Miradov, Mirazê Evdo, Şerefê Esîr, Eliyê Evdilrehman, Egîdê Xudo, Hesenê Qeşeng, Ehmedê Gogê, Tîmûrê Xe-lîl, Tosinê Reşîd, Girîşayê Memê, Pirîskê Miho, Yûrayê Şao, Vanikê Elîxan, Rizga-



Di destpêka salên sihi de civîneke kur Jên Ermenistanê. Di nava komê de ronakbirê kurd Heciyê Cindi, Casimê Celîl, Eminê Evdal û Cerdoyê Gêncô ji hene.

nê Cango, Sêx Hesen, Hesenê Üso, Cemalê Üsiv, Cemîla Celîl û Sîma Semend bûn.

Yênu ku weke wergêr kar kirin: Mîkayilê Reşîd, Memê Eylaz, Emerîkê Serdar û Îşkanê Esko bûn. Yênu ku di demêni ji hev cuda de spîkêrtiya beşa axaftinê kurdî kirine: Ordîxanê Celîl, Nûrê Palatovayê, Eznîva Reşîd, Sêvara Evdo, Meksîmê Xemo, Keremê Seyad, Mîroyê Cangir, Gulîzara Casim û Lusiya Huseyn bû.

Bingeha kurdnasiyê li Ermenistan û Rûsyayê, dostê gelê kurd û ronakbirê ermenî yê mezin Xaçatûr Abobiyan danî, lê di serdemâ Sovyetê de Heciyê Cindi û Emînê Evdal rêberiya wê dikirin. Weke serokê beşa kurdnasiyê û berê wê jî profesor Heciyê Cindi di nav kar û barê civandin û lêkolîna ser folklorâ kurdî de dewreke nû vekir, lê Dr. Emînê Evdal di nav kar û barê lêkolîna li ser etnografiyê de roleke sereke leyist. Pişt re kurdzanên nû ji salên 1960î vir de xwe gihadin. Yênu ku li ser beşa kurdnasiyê xwe gihadin, ev in: Profesor Şekroyê Mihoy, ku pişt re bû serokê kurdnasiyê, profesor Celîlê Celîl, Dr. Meksîmê Xemo, Profesor Şerefê Eşîr, Dr. Xalit Çetoyêv, profesor Kinyaz Mirzoyêv, Dr. Çerkezê Reş, Dr. Memoyê Xalit, Kurdzan Şikoyê Hesen, Dr. Tahar Abbasîyan bû.

Divê, em bi giştî keda vê beşa kurdnasiyê, ya Înstîtuya Rojhîlatnasiyê ya Akade-

miya Ermenistanê bînin ber çavan û layiqê nirx bibînin. Di vê beşê de lêkolînên kûr û bi pir alî li ser folklor, etnografi, dîrok, zimanzanîn û edebiyatê dihatin li dar xistin. Heciyê Cindî û Emînê Evdal monografiyêna fundamental dîniyîsin û diweşandin. Şekroyê Mihoy, Celîlê Celîl, Şerefê Eşîr, Xalit Çetoyêv, Karlênen Çâçanî û Tahar Abbasian li ser dîroka - ci ya nû û ci ya kevnar - gelê kurd mijûl dibûn: Dîroka kurd û Kurdistanê ya di serdema Împaratoriya Osmanî de ji destpêka sed-sala 19an hetanî destpêka sedsala zoan bi saya lêkolînên Celîlê Celîl hate zelal kirin. Şekroyê Mihoy bi lêkolîna li ser pirsgirêka otonomiya kurdan ve mijûl bû û di derbarê wê de ji monografiyêna xwe nivîsin.

Şerefê Eşîr ji, pirsgirêkên têkoşîna kurdan ya li başûrê Kurdistanê ji monografiya xwe re kirin tema. Lê Xalit Çetoyêv, Karlênen Çâçanî û Tahirê Emer berhemên xwe di derbarê dîroka kurdêne Ermenistanê de nivîsin. Monografiyêna Meksîmê Xemo di derbarê zimanzanîna kurdî de ne, lê yên Memoyê Xalit di derbarê etnografiyê de ne. Şekoyê Hesen çend gotar di derbarê zimanê kurdî de nivîsin, lê sed heyf e, ji ber mirina bê dem ew kar nehate dom kirin. Celîlê Celîl ligel birayê xwe Ordîxanê Celîl bi berhevkirin û lêkolînên li ser folkora kurdî ji mijûl bû û pir berhevokên berhemên zargotina kurdî weşandin.

Rast e, beşa kurdzanînê weke berê tune, lê weke ku em ê pişt re bibînin, kar û barê kurdzanînê li derveyî Ermenistanê ji bi serfîrazî dom dikir.

Weke ku me berê ji gotibû, beşike kurdzanînê li Petersbûrgê hebû û niha ji heye. Bingeha wê Horsêp Orbêlî yê bi eslê xwe ermenî bû, danî, lê piştî zemanekî kin Profesor Qanatê Kurdo weke 25 salan seroktiya wê kir. Li vir, lêkolînên li ser zimanzanînê (Q. Kurdo û profesor Zera Usîv) hatin pêk anîn û wan her dû zanyaran xebatêna fundamental (bingehîn, sereke) li ser zimanzanînê li dar xistin û weşandin. Herweha Q. Kurdo lêkolîn di derbarê dîrokzanîn û edebiyatzanîn de li dar xistin. Lê, ev beşa kurdzanînê bi piranî li ser bidestxistina destxetên kurdî yên kevnar hatin pêk anîn. Her wisa ji, di derbarê şâtrîn kurd yên klasîk yên ku di sed-sala navîn de jiya bûn, hate lidarxistin.

Profesor Ordîxanê Celîl ji roja vebûna vê beşê ve, karê xwe dom dike û her lêkolîn, berhevkirin û weşandinan li ser folklor û edebiyata kurdî didomîne. Li Moskowayê, Profesor Çerkez Bakoyêv lêkolînên xwe li ser zimanzanînê li dar dixe û kar û barê xwe yê weşandinê ji didomîne. Li vir profesor İran Farîzor kar û barê xwe yê li ser kurdzanînê dest pê kir û her kar û barê xwe di vî warî de didomîne.

Li Aşxebadê ji Dr. Mamêd Nazarov lêkolînên xwe li ser etnografiyê li dar dixistin û di vî warî de her çalak e. Di nav komeke Akedemiya Azerbeycanê ya zanyariyê de komeke kurdzanê kurd li ser dîroka gelê kurd mijûl bû. Li vir du - Gêlavêj û

Rehîm Qazî - emîgrantên (penaber) ji Kurdistana Rojhilat kar û barê xwe yê li ser kurdzanînê pêk anîn. Her wisa kurdên ji Azerbeycanê jî yên bi navê Huseyn Kurdoxlu û Şamîl Eskerof jî di wî warî de çalak bûn.

Li Tıvlîsê Dr. Lamara Paşayêva, li Akedemiya Gürçistanê ya zanistiyê lêkolînên xwe yên li ser etnografyayê pêk tîne. Li vî bajarî nivîskar û dersdarê kurd Bexçoyê Îsko di derbarê dîroka kurdên Pêşqafqasyayê de nivîslî û weşand.

Hunermendiya kurdî û nexasim hunermendiya stranbêj û mûzîka kurdî jî li vir nehate ji bîr kirin. Dr. Nûra Cewarî çend xebatên hêja di derbarê vî şaxê hunerê de li dar xist. Starnê kurdî ji nava gel civandin û li gorê notayêñ muzîkê ji nû ve weşandin. Sazbend Cemîla Celîl çend pirtûkên stranê kurdî bi nota dana çapê, ku ew ji ber zarê zarbêjan girtibûn. Gelek lawêñ gelê kurd ji Kurdistanê berê xwe dan navendêñ kurdzanînê yên li Sovyeta berê, ku li wir bikaribin di nav şaxêñ kurdzanînê de yên ji hev cuda lêkolînên xwe yên zanistî kûrtir bikin. Ev yeka ha bawer bi ke ji dawiya salêñ soî dest pê dike û hetanî niha jî dom dike. Pir keda Q. Kurdo ya ji bo gihadina kedroyêñ kurdan ya ji bo dersdarî û kurdzanînê hate xerc kirin. Li Petersbûrg, Moskowa û Bakûyê van navêñ ku dê li jêrîn bêne bibîranîn, lêkolînên hêja li dar xistin: Ezîz Şemezinî, Marûf Xeznedar, Kaûs Kaftan, Nesrînê, Îzeddin Resûl, Kemal Mazhar, Cemşîd Heyderî, Anvar Kadir, Abdurehman Hecîmaruf, Huseyn Hebeş, Kurdistan Mukriyanî û yên din.

Yê ku demeke dirêj li Petersburgê ma, Dr. Kerîm Eyûbî - ku beriya niha wefat kir - û çend monografi li ser edebiyata kurdî nivîsin û dane çapê, divê ku mirov bi bîr bîne.

Li Sovyeta berê di nav komên kurdzanînê de kurdzanêñ ku lêkolînên bi nirx li dar xistine lê bi eslê xwe ne kurd in, hêja ye ku mirov navêñ wan jî di nav rûpelên dîroka me de bi bîr bîne, ev in: Sêda (Margarita), Rûdenko, Jêniya Vasîlyêva, Jaka Mûsayêliyan, Ishak Sukerman, Olêgvilcêvîskî, Xalfîn, Lazerûyev, Hasretiyan, Sakolov, G. Akopov, Al. Mêntêşasvîlî, Yû. Avaliyanî, Îr. Smîrnova û yên din.

Gava mirov kurdzanîna li Sovyeta berê binixîne, pêwîst e ku beriya hemû tiştî mirov bide diyarkirin, ku navenda kurdzanînê ya herî mezîn di nav temamiya dîroka Kurdistanê de û heta mirov dikare bibêje di nav ya cihanê de û Kurdistan jî di nav de li Yekîtiya Sovyetê hate pê û li gora mezînahiya xwe jî keda herî bi nirx ji bo lêkolînêñ li ser kurdzanînê pêk anîn. İro jî bêyî bikaranîna berhem û lêkolînêñ kurdzanînê yên ku li Sovyeta berê hatin lidarxistin, em ê nikaribin lêkolînêñ ku li vir an jî yên ku li Kurdistanê bibin, pêk bînin. Her bi tenê dimîne, em berhemêñ kurdzanînê yên ku li Sovyeta berê hatine berhem kirin, ji zimanê rûsi û ermenî wergerênen zimanê kurdî da ku ev berhem bibin malê gelê kurd, lê yên bi kurdî

yên ku bi tîpêن kîrîlîkî hatine weşandin, wergerînin ser alfaba latînî da ku hemû kurd bikaribin jê îstîfade bikin.

Ji nava kurdêن Sovyetê hunermendêن hêja yê herî delal derketin û piraniya wan bi saya radyoya Êrîvanê nav û dengekî payabilind qezenc kirin. Li navça Axbaranê li gundê Camûsvana Mezin humermend û stranbêjekî kurd yê bi navê Ehmê Çolo hebû. Lê li navça Talînê yekî bi navê Şêx Kamîl ku jê re digotin Aşıq Nazûk hebû. Birayê wî yê dawî Şêx Şamilê Beko hê dimîne, fiq û zurneke wisa lê dixist, ku hunermendê timamiya Rojhilata Navîn dikarîbûn ji ber vê yekê çavreşiyê bavêjinê. Lê, tu bawer biki, şagirtê wî, Egîdê Cimo ji wîbihurîbû. Van herdu hunermendan bi sazbendiya xwe kedeke mezin kirin nava karê dengxana beşa axaftinê ya kurdî ya li radyoya Êrîvanê. Em nikarin navê hemû sazbendê kurd li vir rêz bikin, ji ber ku ew gelek in. Lê, kîjan guhdarê radyoya Êrîvanê li dengê Şeroyê Biroza heyr û hişmetkar nemaye. Dengbêjekî ku bi eslê xwe ermenî ye, keda wî ji bo pêşvebirina hunermendiya kurdî ya stranbêjiyê zehf e. Bêguman, ew hunermend jî Karapêtê Xaço ye. Dengê wî hê jî li radyoyê tê weşandin.

Gava gîlî dîsa hate ser beşa axaftinê kurdî ya radyoya Êrîvanê pêwîst e em bibêjin, ku dengxana herî dewlemend ya awaz û stranê kurdî li vir hatiye sazkirin. Nîrxê wan yê ji aliyê etnografiyê ve gelek e. Ew dengxana xezîneyeke hunermendiya kurdî ya awaz û stranê kurdî ye, ku divê em hemû kurd xwedî lê derkevin: Ne-hêlin ew kasêt winda bibin. Ji ber ku piraniya sazbend û dengbêjên kurdan yên xwedî nav û deng çûne ser dilovaniya xwe û gelekî zehmet e, ku yên weke wan divê dema me de derkevin. Ji bona lêkolînê li ser hunermendiyê jî ev dengxana dikare pir bi kêt bê.

Pêşketina kurdan li Sovyeta berê bi tenê bi pêşketina edebiyat û çanda wan, lê wisa jî bi ya kurdzanîn û hunermendiya kurdî nayê diyar kirin. Nîşaneke wê pêşketinê ew bû, ku bicihanîna mafê kurdan yê neteweyî bû, ku kurd bi piranî li gora eslê xwe yê kurdî dihatin hesab kirin û her wisa jî dibûn karkerên dewlet û hukûmetê. Bêguman çend kesen bi nav û deng yên ku ne bi tenê di nava komara xwe de dihatin naskirin, herweha ew li seranserê Yekîtiya Sovyetê dihatin naskirin jî ev bûn: Yek ji wan Fêrikê Egît Polatbêkov (ji malbata Elî Axa ye ku beriya niha me bibîr anî) bû. Ew li Rûsyayê beşdarekî Şoreşa Oktobirê û endemekî hukûmeta Sibirya yê Navendî bû. Her wisa ew şairekî payebiliind bû, lê ci heyf e, ku di 21 saliya xwe de bi destê gardîstên Sipî hate kuştin. Şoreşvanekî kurd li Azerbeycanê hebû yê ku li seranserê Sovyetê dihate naskirin. Ew wezîrekî hukûmeta Azerbeycanê Çingiz İldizim bû, ku hogirayetiyeke nêzîk bi Sergey Mironoviç Kurov re dikir. Di destpêka salêن 1920î de Kurov Serokê Azerbeycanê yê ji aliyê partiyê ve bû, lê piş

re bû serokê giştî yê seranserê Yekîtiya Sovyetê weke endamê Polîtbûroyê yê Komîta Navendî yê partiya Komunîst ya Yekîtiya Sovyetê. Gava Kîrov ji Azerbeycanê çû Petersburgê, wî û Çîngîz İldîzmê kurd ji hev re tim û daîm name dişandin. Ü Çîngîz İldîzim di dawiya hemû namên xwe de dinivîsi: "Hogirê te yê kurd Çîngîz İldîzim". Belê, kurdîtiya xwe eşkere dikir. Belkî ji wê yekê ditirsîya ku wê wî pişt re li Azerbeycanê mîna azerî nîşan bidin. Pişt re, Çîngîz İldîzm bingeha Metalûrgiya Yekîtiya Sovyet mîna berpirsyarê Kombîneya li Magnîtagorski danî. Tu guman nîne, ku ji ber organîzevanekî bi rîk û pêk bû, ew ji bo vî karê dijwar kirin berpirsyar. Çîngîz İldîzim wezîrê Sovyeta berê yê yekemîn bû, ku bi serlîdانا fermî çû Dewletê Emerîka yên Yekgirtî. Erebê Şemo tevlî kar û barê Şoreşa Oktobirê hê di dema şoreş nehatibû lidarxistin de, bûbû. Lî, ew sala 1918an bû endamê Partiya Bolşevîkan û tevlî Şoraşa bûrjûvazî ya li Qavqasyaya Bakur bû. Pişt re ew bû karkerekî Komîta Navendî ya Partiya Ermenistanê ya Komunîst ku weke berpirsyarê kêmawetewa yên li Komara Ermenistanê hate hilbijartin.

Şemo Têmirov bû berpirsyarê nobedarên sînorê Sovyet li Ermenistan û Tirkiyê. Beriya vê yekê, ew bû serokê navça Hecî Xelîl (pişt re yê Elegezê) ji aliyê partiyê ve. Di destpêka salên 1920an de Cerdoyê Gêncô jî weke serokekî partiyê li vê navçê kar dikir. Nadoyê Xudo Maxmûdov komunîstekî herî pêşî bû li Ermenistanê, ku nav û dengê wî li seranserê Yekîtiya Sovyet hatîbû nas kirin. Ew bû serokê çend navçan li Ermenistanê (Axbaran û Hoktêmbêriyan). Ew giha meqamê wezîrê Hukûmeta Ermenistanê, lê bi qasî 20 salan cîgirê wezirê avtotiranspotê yê pêşî bû. Nadoyê Xudo çend caran hate hilbijartin weke dêpûtatê parlementoya Ermenistanê, lê carekê jî yê Yekîtiya Sovyetê.

Semend Siyabendov bû serokê navça Elegezê, hate bi hilbijartina weke debûtatê parlementoya Ermenistane bû, lê, di salên dawî de bû cîgirê wezîrekî hukûmeta Ermenistanê.

Mîroyê Esed weke berpirsyarê rojname *Riya Teze* çend caran hate hilbijartin, lê wisa jî weke cîgirê kadroyê parlementoya vê komarê jî hate hilbijartin.

Xalit Çetoyêv di partiyê de weke Înstrûktor (Mûfettîş), lê wisa jî weke serokê navcen Elegez û Talînê kar dikir.

Ji kurdan di demên ji hev cuda de Egîtê Meto, Avtandîlê Fetî, Sîsa Huseyn, Tîtalê Efo, Salihê Bekir bûn serokê navçan.

Üsivê Beko bû endamekî Dadgeha Ermenistanê yekî herî bilind. Tîmûrê Lêşo gelek salan cîgirê dozkarê komarê yê Ermenistanê bû.

Bayloz Razgoyêv serokê navçen ji hev cuda yê KGB bû. Keleşê Qeymez bû cîgirê serokê navça Axbaranê. Tîtalê Huseyn hetanî niha jî xebata çekdar ya organên Er-

menistanê yê milîsiyê dike.

Lê, herweha di nav kurdan de pir kes jî bûn muxtarên gundan. Mînak, heger şansê wî hebûya, dê Kotê Şîrîn bibûya serokê gundê Hekko li navça Têlînê.

Komunîstekî kevin di nava kurdên Azerbeycanê de Memê Polatov bû, yê ku xebata serokatiya çekdarî li navça Têlînê pêk dianî.

Heger xwendina Rizgoyê Ato hebûya, wî dikarîbû serokatî li welatekî bikira: Wilqas zane û dûrdîtî bû. Ew jî bolşevîkê herî pêşî bû di nava kurdan de û di artêşa meraşalê Yekîti Sovyet ya Siyarê M. Bûdiyonî de bi mîrxasî ser ketibû.

Me li jor got, ku li Sovyeta berê, nexasim li Ermenistanê artêşike ronakbîrên kurd yeke mezin hate pê, ku bi serfîrazî xizmeta edebiyat û çanda kurdî, kurdzanîn û hunermendiya kurdî kir. Lê, ji nav kurdan ronakbîrên din jî derketin yên ku xwe li edebiyat û çanda kurdî negirtin, lê weke kurd mîna kadroyên bikêrhatî yên xwendiyêni mistewên ji hev cuda li Ermenistan û Sovyeta berê derketin holê. Profesor Sihîdê Îbo doktorekî zarakan yekî herî diyar bû li Sovyeta berê. Du keçen kurdan jî weke doktorên bi nav û deng dihatin nas kirin: Firîca Hecî û Donara Maxmûdova. Şîaliyê Eşo bi qasi 20 salan li nexweşxana bajarê Spîtakê berpirsyarê beşa Şîrûrgiyê (cerahiyê) bû û bû şehîdê erdheja sala 1988an.

Giyorgiyê Xudo mîna doktor meqamê profesortiyê qezenc kir. Ezîzê Gerdenzerî bûye doktorê zanîstiya doktoriyê. Ev pir sal in, ku Simoyê Şemo û Sûtoyê Cindî xizmeta cansaxiya rûniştvanan dikan. Doktorên kurdan bi taybet li Ermenistanê pir in, ku em nikarin navê hemûyan li vir bi bîr bînin. Her bi tenê ez dikarim li vê gotinê vê yekê zêde bikim, ku keç û lawêndan kurdan ji aliyê doktoriyê ve gelekî şahreza ne.

Feyzoyê Egît hê di ciwantiya xwe de bû doktorê zanistiya doktoriyê, lê piştî demeke kin bû profesor di şaxê xwe de. Lê Ezîzê Xeto bû kîmyager. Ev li Ermenistanê bûn. Lê, li Qazakistana dûr jî ji nava kurdên sergomkirî profesor û akedemisan derketin. Ew jî Nadir Nadirov e.

Di nav refê dersdariyê de jî kurd diyar bûn û çend dersdarên kurd yên ku layiqî mistewa bilind bûn, ji aliyê hukûmetê ve hatin teqdîirkirin jî ev in: Emînê Evdal, Cewoyê Mamo, Baxçoyê Îsko, Ezîzê Îsko û Sihîdê Mirad.

Emînê Evdal weke zanê xetên telefon, radyo û televizyonê li Ermenistanê, pişt re jî li Sovyeta berê nav û dengekekî bêhempa qezenc kir. Ew li Moskowayê bû cîgirê wezîrê hevgirêdanê.

Arsên Poladov piştî xelaskirina xwendina xwe li Moskowayê hate Êrivanê û li Ermenistanê cara pêşî bingehê şanoya bêzar (pandomîmayê) danî. Lê Samvîlê Koçoy weke doktorê huqûqnasiyê bû endamê rôexistina huqûqnasên Yekîtiya Sovyetê.

Heta di nav refîn hunermendiyê de jî kurd li Sovyeta berê diyarî nas bûn. Nazê Şîray, ku sêwî mezin bûbû, weke artîsta sîrkê yeke pir şehreza berî derketina xwe ya ser arena (meydana) sirkê bi spîkêr dida anons kirin ku ew hunermendeke kurd e. Belê, wê eslê xwe ji bîr nedikir û bi nav û dengê xwe, navê gelê me bilind dikir.

Pilot û firokvan jî ji nava kurdên Sovyeta berê derketin. Stalîkê Üzo Caferov û Mîkayîlê Kamîl Bagirov firokên cengê yên ku ji deng zûtir diçûn, diajotin.

Gelek kurdên Sovyeta berê asimîle bûn û heyf e, ku bi navê netewê din têne nas kirin. Dibêjin, ku du mîrxasên Yekîtiya Sovyetê yên ji Azerbeycanê bi eslê xwe kurd in. Îsbat hene, ku serokkomarê Azerbeycanê, Heyder Eliyev jî bi eslê xwe kurd e. Belkî gelek hene ku bi eslê xwe kurd in, lê haya me ji wan nîne. Akedemisan Hovsêp Orbêlî pir rast dibêje, ku kurdan gelek lawên xwe yên hêja di nav gelên biyanî de yên weke karmendên dewletê, zane, helbestvan û mûzikvanên bi nav û deng winda kirine. Em hêvî dikin, ku ew lawên gelê kurd li netewa xwe vegerin yên ku wek Orbîl dibêje: Bi kar û barê xwe dîroka gelên din dixemînin, lê ew gel îro me weke netewa nasnakin û nabînin.

Bi kurtî dîroka kurdên Sovyeta berê ev e. Nexasim edebiyat û çanda wan guher-tinê bingehîn kirine nav jiyan û çarenûsa gelê kurd yên li Sovyeta berê. Belê, çarenûseke dîrokî yeke pir giran para me kurdan ketiye. Her carekê, gava ku stêrka me li ezmên dertê, vêdikeve, ges dibe bi piranî ne ji ber gunahê gelê kurd, lê ji ber hovîtiya dagirkirêni biyanî ewrekî giranî reş tê ser wê stêrkê, wê winda dike. Gelo ne wisa bû, gava dagirkirêni sedsalên navîn, Tîrkîn Selçûkî, Moxol, Tîmûrleng hatin û xanedanên kurdan yên Şeddadiyan, Merweniyan ji holê rakirin, ku wan bi aştî û dilpakî serokatî ne bi tenê li kurdan, lê wisa jî li pir gelên Rojhilata Nêzîk dikirin. Gelo ne wisa bû, gava Faristana Şahînşâhiyê û Tîrkiya Sultanî xurt bûn, mîrîtiyên kurdan ji holê rakirin, Kurdistan di nav hevdû de perçe kirin û kirin meydana cengen li dijî hev, kirin gola xwînê. Gelo wisa neqewimî, gava wê li gora peymana Sewrê Kurdistan bihata damezrandin, lê ji ber polîтика serokên Tîrkiyeyê yên ni-jadperest û komployêne dewletên Ewrûpa yên rojava yên li gora menfaeta wan û bi taybetî polîтика dewleta Sovyetê ya neyartiyê ya di derbarê kurdan de ew peyman hate fesx kirin.

Di salên dawî de pir bûyerên trajîk li welatê me kurdan, li Kurdistanê hatin pê. Em li ser wan hemûyan ranawestin, lê em ê bi tenê li ser bûyarên ku li Yekîtiya Sovyetê hatine pê, rawestin, ku bûn sebebê perîşanbûna kurdên li wî welatî û bi çarenûseke reş ya mezin li ser edebiyat û çanda wan bandor kirin.

*Di hejmara bê de: Hilweşîna Yekîtiya Sovyetê û çarenûsa kurdên li wî welati*

## **Bo NÜDEMê**

Bi borîna çendîn salan li ser têkiliya min bi Nûdemê re ez van gotinên li jér  
rêzkirî diyari Nûdemê dikim:

### **NÛDEM**

Rengên wênan  
awayê ziman  
gotinên nivîsarان  
rohniya hêzê  
hêviya jinê  
şêwê girmijinê  
di NÛDEMê de  
verevandina  
gumanên tarî  
û  
rakirina ji xewa giran e...

**ELEND DARVIN**

# Mebrûre

## FELAT DILGEŞ

Wê salê me dest bi dibistana navîn kiribû. Li ser hev pênc salên me li dibista-na bi Razeman (Yatili) a Farqînê derbas bûbûn. Di nav van pênc salan de, hema bibêje me hemû marşen leşekerî yên li ser mîrxasiya mehmedcîkan ji ber ki-ribû. Ya herî girîng em bi tirkî jî hîn bûbûn. Kêm zêde zimanê me digeriya ku em ya di hişê xwe de bibêjin.

Piştî cûyina Hemedê Helawfiroş, êdî nema kesî helaw difirote me. Çimkî em bi tirkî hîn bûbûn. Hemedê Helawfiroş, tam sê sal û nîvan li ser hev helaw firotibû me. Ya rast me hemûyan dizanîbû ku helaw jî wek xwarinên din ên ku li dibistana bi Razeman derdiketin belaş e, belê me nikarîbû ku em ji mamosite an berpirsiyârên dibistanê re bibêjin ku Hemo helawê bi peran diforoşe me.

Ji hevalên me Zekiyê Dirêj, Fadoyê Boşatî, Henoyê Hurweş, Emerê Mirtiv çend caran destê xwe bilind kirbûn û xewsitbûn ku giliyê Hemo ji mamosite re bikin, da ku êdî ew hew helawê bi pere bifiroşe me, belê tu carekê jî bi ser nekitibûn. Bi ser de, têr lêdana xwe jî xwaribûn û li cihê xwe rûniştibûn. Çimkî, Hemo serokê sinifê bû û wezîfa wî ya esasî ew bû, ku kî bi kurdî bipeyive an nerihetiyê bike ji mamosite re bibêje. Delîl li halê wî kesî bû ku di lîstra Hemo de cih bistanda, nema kesî dikarîbû ew ji lêdanê xelas bikira.

Lêxistina bi daran li derekê, ketina destê Salih Xoce sosreteke mezin bû. Salih Hoce, bi wê bejna xwe ya dirêj, bi wî laşê xwe yê sitûr û bi wan destên xwe yên gir li kê betefiqiya, li kê bihata xezebê an li kê bixista, nema ew biselihiya. Salih Hoce, wek rewtekî dirêj, mîna hirçekî xurt bû. Roja ku ew li dibistanê notirvan bû, deng

ji tu kesî dergediket. Nema kesî nerihetî dikir û nema kes bi derengî diçû dersa xwe. Di roja ku ew li dibistanê notirvan bûya de, serê sibê zû dihat û zarok hişyar dikirin. Hê gava ku li derê menzela rû me dixist, em ji tırsan ji nav nivînan hildipekiyan.

Salih Xoce du caran dihat; yek serê sibê bi tariyê ve, dudo, nîv saet an cil deqe bi şûn de. Di cara duduyan de gava hat, kî di nav nivînan de bûya ji wî çûbû. Salix Xoce bi çemilê wî digirt, wek rovî ew ji nav nivînan dikişand; bi herdu desten xwe bi cêñikêñ wî digirt û ew bilind dikir hewa. Piştî ku bi qasî dequekê an du dequeyan ew li hewa hêst, destê xwe yê rastê ji cêñikê berdida û pê re sîleyek wisa datanî, ku şîngîn ji ber goyan diçû. Wî rojê ciyê destê Salih Xoce wek morê li ser çavê zarok dima.

Bi taybetî roja ku Salih Xoce notirvan bû, wê rojê heta ji destê min dihat, min nedihîst ku çavên wî bi min bikevin. Ez wê rojê serê sibê zû, beriya hemû kesî ji nav nivînan radibûm û min nivînen xwe xwesik bi keys dikirin. Çimkî Salih Xoce, nivînen kê xarabûyi bidîta, ew kes biçuya kuderê jî, illa dihat ew didît, bi cêñikêñ wî digirt, ew radikir hewa û dû re sîla xwe ya bajarî lêdixist û ew berdida. Pişt re ji weha digot, "şer ji cihê xwe kifş e. Ket kurê kerê, ma tu çima nivînen xwe çênakî!"

Ez şaş û mat dimam; bê çawa Salih Xoce bi cêñikêñ zarakan digirt û ew radikirin hewa. Ez şaş dimam ku çawa ew porê çênikêñ wan ji cih nakişê û xwîn nabêje bilq û di wê derê de navêje.

Di rojênotirvaniya Salih Xoce de lista Hemo jî pirr tije nedibû. Wê rojê her kesî bê gilî û gazin heqê helawa xwe dida. Dîsa jî Hemo, çend kesen ku rika wî ji wan dihat, kesen wek Zekiyê Dirêj, Fadoyê Boşatî û Henoyê Xurweş, di qontejana daîmî ya Salih Xoce de dinivîsand û ew ji lêdana Salih Xoce mehrûm nedihêstin.

Henoyê Hurweş jî bi girî û bêpîriya xwe protîpekî Salih Xoce bû. Te digot qeyê golikê weş (beraz) e. Salih Xoce, di dora xwe ya notirvaniyê de bi kêmanî rojê sê caran bi cêñikêñ Heno digirt, ew bilind dikir; heyâ jê dihat bi destê rastê sîleyek bajarî ya sitûr li Heno dixist û ew berdida. Piştî ku Heno diket erdê, wek golikê li pey gayê ku zîtik xwariye, orînek jê dihat û diçû li cihê xwe rûdiniş. Di ber xwe de bi dizîka digot, "Ez di diya Salih Xoce nim!" Li vir pê re Hemoyê helawfiroş bi nermî destê xwe bilind dikir û bi tirkî çêre Henoyê Hurweş ji ji Salih Xoce re tercûme dikir. Hingê sehna bi cêñikan girtin û bilindkirinê li ser hev sê carê din jî diajot. Tenê gava ku Heno diket erdê orînek wek golikê ku ga zîtik lê xistiye jê diçû û hew. Piştî ku Salih Xoce ji hundir derdiket, Heno dest pê dikir û dikeniya. Te digot qey yê ku ew lêdan xwariye, ne Heno, belê ew dîwarê ha ye. Hemoyê helaw-

firoş, vî kenê Heno ji bo lêdana cara bê deyn dinivîsi. Belê qet ne xema Heno bû.

Hasil Hemo muxtarê gundê bêzar û bêziman bû. Tişte herî baş ew bu ku mirov nekeve tora wî, xwe ji bela wî dûr bixe. Riya vê yekê jî di şuştina gora wî de derbas dibû. Kî ku baş gora wî bişûsta û dilê Hemo xweş bikira, Hemo bela xwe jî wî dikir. Şuştina gora wî jî ne wisa hêsan bû, diviyabû baş bi sabûnêbihata şuştin û piş re bi aveke zelel, çend caran li ser hevbihata carfîkirin. Li dera ku me sabûn nedidît em ser û çavê xwe bişon, pêwist bû ku me gora Hemo bi sabûnê bişûsta.

Yê min, ez bi şuştina gorê razî bû. Belê min dikir nedikir Hemo bi şuştina min razî nedibû. Pirrê caran ji min re digot, "Ev gore baş nehatîye şuştin. Here dîsa bişo!" Ji bo ku ez serê sibê têra xwe lêdanê nexwim, mecbûr min cardin gore dişûst û dianî.

Ji hevalên me Zekiyê Dirêj, Fadoyê Boşatî, Emerê Mirtiv bi emrê xwe mezin bûn. Her yekî ji wan bi kêmanî di sêzdeh -çardeh saliya xwe de dest bi dibistana seretayî kiribûn. Hemedê Helawfiroş jî mezin bû. Herçî ez bûm, ez li ber wan pirr hûr û biçûk dimam. Min di heftsalîya xwe de dest bi dibistanê kiribû; ez hergav nexweş, bêhal, qels û bêhêz bûm.

Di nîvê sala siyan de karê Hemedê Helawfiroş gellek zehmet bûbû. Edî çavê me hemûyan vebûbûn û Hemedo hew karibû helawê bifiroşe me. Bi ser de Zekiyê Dirêj hergav bela xwe tê dida û em jî li hember wî digijigijandin. Rojekê serê sibê zû, hê Hemedo di nav nivînan de bû, Zekiyê Dirêj ez hişyar kirim û nav di min da, da ku ez herim Hemedo hişyar bikim û çêran pê bikim. Ez çûm ber serê Hemedo û min bi dengekî bilind got,

– Hemedê Helawfiroş, rabe ezê di xwişka te ! Hemed tu bersîv nedabû min. Belê piş re min pirr şerm kiribû û ev yek bi salan ji bîra min derneketibû.

Di nivê sala sisiyan de, Hemedê Helawfiroş ji destê me dev ji dibistanê berda. Sêwiyeq ji sêwiyeq Minara Qot kêm bû. Hemedo bi tirkiya xwe bi qasî sê salan padışahî li ser serê me kiribû, belê dawiyê, piştî ku em jî hînî tirkî bûbûn, hukmê zimanê wî nemabû.

Herçî Fadoyê Boşatî bû, tu carî ji xwendinê hez nekeribû. Bi zor û kuteka bavê xwe dihat. Her hefte bi pismamê xwe û çend gundiyan xwe re ji dibistanê firar dikir. Bi roja duşemê ya heftê re, Fado û hevalên xwe di hervazên Minara Qot de, ber bi dibistanê ve hildikişyan. Tam di vê navê de, em birrek zarok digihîştin hev û me bi keviran êrîşî ser wan dikir. Me nidixwest ku ew cardin bêñ dibistanê. Çimkî wan firar kiribû û çûbûn malen xwe. Belê me çi jî bikira em bi Boşatiyan re nedîçûn serî. Hemû jî şerûd bûn û wan bi keviran zora me dibir.

Bi lêxestina zengilê dersê re, Boşatî beriya me li cihê xwe rûdiniştin. Êdî hew kes bi ser wan de diçû. Ji xwe di şerê yek bi yek de kesî ku bi Fado ve bizeliqiya tunebû. Fado, xortekî lihev, xweşik, bejndirêj û navmil fireh bû. Porê xwe bi alî paşîn ve şe dikir û poçaxê xwe bi şe sis dikir. Çavlixwe bû Fado. Her sibe beriya her kesî jinav nivînên xwe derdiket û diçû ruyê xwe kur dikir. Sabûna xwe ya bibîhn di dolaba xwe de vedîşart. Tizbiya xwe ya xortaniyê ji xwe nediqetand. Digel ku ji çend rojan carekê oxilme ji çedibû, Fado tu car tizbiya xwe bi destê tu mamosteyî ve bernedida. Kesî nizanibû ku di van demên oxilmê de tizbiya xwe çawa vedîşere.

Ku bi dest biketa, Fado cixare ji dikişand; belê perê wî tunebû. Gava ku yekî xêra xwe cixareyekê bidayê, bi minet ji wan disitand û sipasiyên xwe dianî ziman.

Dengbêjiya Fado ji hebû, gava ku kêfa wî li cih bûya; destê xwe dikir qula guhê xwe û stran digotin. Ji sitranên mêttxasiyê gellek hez dikir. Bi gotina van sitranañ re ji xwe diçû.

Fado mêttxas bû. Ji bilî bavê xwe ji tu kesî neditirsîya. Ciqas ji dibistanê bireviya, bavê wî bi guhê wî digirt û ew bi zorê dianî û dikir dersê. Belê heta ku li pêş mamosteya me ya jin têr li Fado nexista, ji hundir dernediket. Kîngê ku qîjîna Fado û hawara mamostê li hev qelibîn, ji vê qîr û hewarê mamostê sefa rû me -ku çav kiri-bû mamosteya me ya jin û ji pey nediqetiya- bi bazdan derket û hat, bavê Fado ew berdida û di derî de derdiket.

Hingê Fado, ser û çav sorbûyî li cihê xwe rûdinişt. Hasil Fado bi zor û kuteka bavê xwe dibistana seretayî xelas kir.

Di sala ku me dest bi dibistana navîn kir de, heval û pismamên Fado kêm bû-bûn, hema bibêje ji Boşatê ew tenê mabû. Bi destpêka dibistana navîn re, êdî Fado ji guherîbû û dizanibû ku ew pê di ber xwe bide, dîsa wek hergav bireve û here malê, wê bavê wî cardin bê û wî bihetikîne. Loma Fado dev ji revê berdabû. Tu car hişê wî ne li ser xwendinê bû, belê dîsa ji dihat.

Her di eynî sala ku me dest bi dibistana navîn kir de, mamosteyeke jin hat dibistana me. Navê wê Mebrûre bû.

Mebrûre kî bû, ji kuderê hatibû, li kuderê xwendibû, ne me dizanibû û ji xwe ne ji me hiş dibirê. Belê Mebrûre ji me re bûbû mamoste û diket dersa me ya tirkî.

Mebrûre keçke zerîn, tind û bedew bû. Te digot qey ji Yeşîlçama artîsên tîrkan girtine û anîne. Ji mamosteyekê zêdetir, dirûvê artîseke sînemayê pê dixist. Çavên xwe kil dikir, dev û lêvên xwe sor dikirin; etekekî kurt û bilûzekî teng li xwe dikir, wek xezalekê bi rêve diçû; çîçkên wê mîna sêvan li pêş wê kil dibûn. Bi ku ve biçuya çavê her kesî li ser bû. Ne tenê şagirtên dibastanê, zewicî an azib, çavê mamostey-

yan jî li ser wê bû.

Ü Mebrûra ku hemû çava li ser xwe dîtibûn, hê bêtir xwe dixemiland, hê bêtir çav kil dikirin, hê bêtir lêv sor dikirin.

Hê di rojêne pêşîn de hemû şagirt û mamoste bi hatina wê hesiyabûn. Herkesî giliyê wê dikir.

Bi dîtina Mebrûrê re xortên dibistanê yên heşerî hêç bûbûn. Şev û roja wan Mebrûre bû. Yê ku digot, "Şev min weha Mebrûre di xew de dît", yê ku digot, "Şev min di xew de weha Mebrûre ramûsa," yê ku digot, "Şev ez weha bi Mebrûrê re razam." Hed û hesabê gotinêni bi vî awayî tunebûn. Belê ji ber ku Mebrûre mamoste bû, di nav sînorêni dibistanê de tu kesî newêribû bela xwe tê bida, an gotinek jê re bigota.

Bi hatina Mebrûrê ya dersê re, çavê her kesî li çimên wê yên tazî bûn. Kesên ku di dersêni din de hergav xwe didan paş û dixwestin ku ji çavê mamosteyan dûr bin, di dersa Mebrûrê de li rêza herî pêşîn rûdiniştin. Hin sakulan li ser tengê derpiyê Mebrûrê bi hev re şert digirtin. Mebrûre bi xwe jî ji vê rewş û guherîna sefê haydar bû, belê qet deng nedibir xwe.

Çend hefte bi şûn de me Mebrûrê çêtir nas kiribû. Di vê demê de Mebrûrê li çend kesan ji me jî xistibû. Kesên ku Membrûrê pirs ji wan bikira û bersîv nesitanda, Mebrûrê bi cetwelêni di destê xwe de li pêş her kesî li wan dixist û xuya bû ku ji vê yekê jî gellek kêf disitand. Yek ji yên ku ji Mebrûrê lêdan xwaribû jî ez bûm. Ez ku, min zû bi zû ji tu mamosteyî lêdan nedixwar; ji ber ku ez şagirtekî feqîr û di halê xwe de bûm.

Membrûre li ber çavê min reş bûbû.

Fado ji pey Mebrûrê nediqetiya. Mebrûre bi ku ve biçûya, ji dûr ve bûya jî Fado li pey bû. Haya Mebrûre jî ji vê yekê hebû. Heta Fado ji bo Mebrûrê, li pêş çavê wê çend caran şer kiribû.

Rojekê Mebrûre, bi mamosteyeke jin a din re derdikeve sûka Farqînê. Fado dîsa li pey e. Şerê bi sêwiyêni Minara Qot re ne zor bû, belê bi tolazên Farqînê re derketina serî ne hêsan bû. Tolazên Farqînî yên ku çav bi Mebrûrê diketin, ro li navê rojê di nav kuçeyan de gotin jê re digotin, êrîş dibirin ser. Wê rojê Fado ji bo Mebrûrê bi çend kesan re şer kiribû, bi zor Mebrûrê jî nav destê hin tolazan xelas kiribû, belê serê xwe jî di çend cihan de dabû şikandin.

Ji wê rojê bi şûn ve Fado û Mebrûrê heval bûn. Ü ji wê rojê bi şûn ve êdî Fado ne Fadoyê berê bû. Fadoyê berê çûbû, yekî nû hatibû. Fado qure û pozbilind bûbû, te digot qey kurê Mîrê Merwaniyan e. Êdî Fado, xwe ne wek şagirtekî dibista-

na navîn, belê xwe wek mamosteyekî didît.

Di vê navê de mamosteyê din ên dibistanê jî Mebrûre nas kiribûn û hemû kesî xwe jê dûr dixist. Çimkî Mebrûrê tu paxav bi wan jî nedikir û herkes wek belayekê jê direviya. Bejn û bala wê, kincên wê, hal û rewşa wê, tebat û lebata wê destûr nedida ku pê re hevaltî bê kirin û di dereke wek Farqînê de mirov li rû wê bê dîtin. Loma mamosteyan xwe jê dûr dikirin.

Di rewşa ku herkes wek belayekê ji Mebrûrê direviya, Fado ji Mebrûrê re dibû dost. Ji tırsa Fado, me jî newêribû ku em tiştekî jê re bêjin.

Ü rojekê gotineke seyr, xebereke ecêb di nav sêwiyê Minara Qot de digeriya. Herkesî xeber ji hevdû re digot û belav dikir. Di demeke kurt de hemû sêwiyê Minara Qot û taxa Tekelê ya Farqînê bi nûçeyê hesiyabûn.

Fado bi Mebrûrê re dizewicî!

Fadoyê ku hê teze dest bi dibistana seretayî kiribû, bi mamosteya xwe Mebrûrê re dizewicî. Gotin wek birûskê belav bûbû. Herkesî ji hevdû dipirsî

– Ma rast e, ma bera jî Fado bi Mebrûrê re dizewice?

– Na loo! Tu henekên xwe dikî?

Rastî rast bû.

Çend roj bi şûn de Fado û bavê xwe li derê Mebrûrê xistibûn û Mebrûrê ji wê xwestibûn.

Fado û Mebrûrê bûbûn dergistî. Bavê Fado ji sûka Diyarbekir ji bûka xwe û ji kurê xwe yê zava re du gustîrik kiribû.

Gustîrika Fado di tiliya wî de bû. Êdî ew dergistiyê Mebrûrê bû.

Fado ji Mebrûrê re bûbû dergistî, belê ji dibistanê û mamosteyan re bûbû bela û mabû. Êdî Fado li xwarinxanê li ser masaya mamosteyan rûdinişt û bi wan re xwarin dixwar. Bi ser de Fado ne ji ber mamosteyekî radibû û ne jî bi qasî misqalekî ew dihesibandin.

Rojekê mamosteyekî bi navê Mehmûd, li Fado hêrs bû û jê re got:

– Piçekî bi terbiye û bi edeb be. Ma tu ji bîr dikî ku tu hê şagirt î, hem jî şagirtê sefa pêşîn ê dibistana navîn!

Li ser vê yekê Fado gelekî hêrs bû, mîna boxeyekî qîriya û weha got:

– Tu kî yî ku tu ji min re wisa dibêjî! Ma tu mamoste yî! Wa ye dergistiya min jî mamoste ye. Tu çi dibêjî. Çi ferqa te û dergistiya min heye. Dergistiya min jî mamoste ye, tu jî mamoste yî! Tu kî yî ku tu bi min re wisa dipeyivî!

Li ser vê yekê mamoste Mehmûd di cihê xwe de rawestiya û deng ji xwe derne-xist. Çimkî dizanibû, heke tiştekî din jî bibêje wê Fado lêxe.

Piştî ku Fado bi Mebrûrê re bi dergistî bû, êvaran diçû ba wê, heta dereng li ba Mebrûrê dima û dû re dihat li ba me radiza. Di van deman de em şagirt hemû di mereqa Fado û Mebrûrê re de bûn. Me meraq dikir, ka gava ku bi tenê ne çi dikin. Me ji hev re digot, ka gelo gava ku bi tenê ne, Fado Mebrûrê maç dike, miz dide û dikeve paşila wê Mereqa me ya herî mezin ev bû. Gava ku bi şev Fado dihat û li ba me radiza, ev yek qet li xweşa me nedîçû û me ji hev re digot,

– Ma çima ev Fado naçe û li ba Mebrûrê ranazê. Ji xwe Mebrûre bi tenê ye!

Hingê yekî digot:

– Çenabe ku li ba. Mebrûrê razê. Heke li ba Mebrûrê razê ewê wî ji dibistanê bi-avêjin.

Tu bersîvekê di vê pirsê de em razî nedikirin. Me dixwest ku em ji Fado bipirsin, belê hem em jê ditirsiyan û hem jî me şerm dikir.

Carna bavê Fado jî ji gund dihat, hin tişt ji bûkê re dianîn, ew û Fado heta dere-ğê şevê li ba Mebrûrê diman.

Şerê mamosteyên dibistanê yê bi Fado re berdewam bû. Mudûrê dibistanê bi xwe jî bi vê yekê aciz bû û dixwest ku bi awayekî Fado ji disbistanê dûr bixe. Alîkarê Mudur ê ku bi xwe jî kurd bû, carekê gazî Fado kiribû û pê re peyivibû. Bi awayê ku hat gotin alîkarê Mudur ji Fado re weha gotibû, "Fado, lawo hê tu pirr ciwan ï. Tu vê jinikê nas nakî. Hem jinik ji te mezintir e. Em bi xwe jî nizañ in ku kî ye û çi kes e. Îcar ev mesela bi dergistibûnê ji kuderê derket. Te bayê xwe anîye û we di nav xwe de bi keçikê re nîşan çêkiriye. Kurê min, te aqilê xwe xwaxwî! Ev çi hal e. Ev keçik bi te dileyize. Sibê wê lêxe ji van deran here û tê di navê ði bimînî, bi ser de tê ji xwendin û dibistana xwe bibî. Neke, were dev ji vî karî berde!"

Belê ev gotinên alîkarê Mudur qet li xweşa Fado neçûbûn. Hetta Fado ji Alîkarê Mudur re weha gotibû:

– Ev jinik êdî namûsa min e. Her kî ku gotinekê jî li ser wê bibêje, emê hevdû bikujin. Eve min got û çû!

Gefen Fado qet li xweşa alîkarê Mudur neçûbûn, belê dîsa aAlîkarê Mudur ew li ber heyeta dibistanê parastibû û destûr nedabû ku wî biavêjin.


Sala me ya pêşîn a dibistana navîn bi vî awayî derbas bûbû.

Dotira salê gava ku em zivirîn dibistanê, dîsa şagirtan gotin ji devê hev direvandin.

Havînê Mebrûrê tayina xwe derxistibû û bi dereke ku nayê zanîn ve çûbû. Fado û bavê xwe bi tu awayekî rastî şopa wê nehatibûn.

Bi ser de, Fado ji dibistanê hatibû avêtin. □

# Ne Hollywood, lê Hol-î-Tor



BRADER

Weke hûn xwendevanên hêja jî dizanin Hollywood navenda film, filmçêker û aktoran e li Emerikayê û cihekî pir navdar e. Gelek film, filmçêker, aktor û artîstên ku di çapa cihanê de meşhûr in ji vê navendê derketine. Hema bêje çi aktorên ku niha jî dixwazin di çapa cihanê de bibin xwedî nav û karyereke mezin bi van xewn û xeyalan diçin navenda Hollywood ya Emerikayê. Dibe ku çûyina Hollywoodê zêde ne zehmet be. Lê ji bo ku mirov li wir bibe doxa bivirekî an jî xwediye navekî pir zehmet e. Ji lîstikên osmaniyan bêtir li wir dek û dolab, qulp û hîle hene. Her welitek xwediyekekê Hollywoodeke xwe ye. Lê her Hollywood bi navekî ye û li gora çapa welatê xwe ye. Bo nimûne li Fransa Canes heye. Li Almanya Berlin e. Li Holandayê Amsterdam e û li Tirkîseyê jî ku bakurê welatê me ji nêzîk ve eleqeder dike, Yeşilçam heye. Mesele rehmetiyê Yılmaz Güney ji Yeşil Çamê bi rê ket. Helbet Yılmaz alternatifek bû û Yeşilçamê alternatifek weha qebûl nedikir. Loma ew digel qereqol û zîndanên xwe li hember Yılmaz Güney ketin têkoşîneke mezin. Herçiqas di demeke kurt de ew bi ser ketin jî lê di demeke dûr û dirêj de Yılmaz Güney bi ser ket. Yılmaz Güney piştî jiyanek zîndanî berê xwe da Fransayê. Yanî berî Canesê. Canes Yılmaz Güney piştî jiyanek zîndanî berê xwe da Fransayê. Yanî berî da Canesê. Canes Hollywooda Fransayê ye û em dikarin bibêjin ku tesîra wê li ser hemû Ewrûpayê heye. Yılmaz Güney ne ji bo nav û karyera xwe çûbû Fransayê. Ji ber ku ew girtî bû, ew qedexe bû, wî ji zîndana Îmraliyê firar kir û berê xwe da Fransayê. Bêî ku ew here Hollywoodê wî bi xe-

bata xwe ya li derveyî welêt xwe bi cîhanê da qebûlkirin. Ji xwe niyetekê wî ya wisa jî tunebû. Ez bawer dikim ger temenê Yılmaz Güney dest bida ne ku ew ê biçûya Hollywood lê wê Hollywoodbihata cem wî.

Heyf û mixabin ku gelê kurd careke din mîrxasekî xwe bêwext winda kir. Di vê roja bîranîna wî de em careke din wî bi rêz û bi hurmet bi bîr tînin. Û mîna ku Rojen Barnas di Nûdemê de gotibû:

Ne wextê mirinê ye.

Erê ne wextê mirinê bû Yılmaz!...

Lê xebatê alternatif û ji bo pêşdebirina çand, huner, sînema û tiyatroya kurdî her berdewam e. Xebatê pir balkêş têne kirin. Tiyatroya Jiyana Nû li ber çavan e. Lê ev xebat bêî alîkarî, bêî şopgerîn û lêkolîn û ya herî girîng bêî rexnekirin wê çawa bi pêş bikeve. Ew nagîhîje tu qonaxan jî. Dev ji Hollywoodê berdin, bi vî awayî em ancax xwe bigihînin Holî-î-Torê.

Hûn ê niha bibêjin Holî-î-Tor çi ye? Ev ji ku derket? Heger hûn bi sebir û aram vê nivîsa min a ji edebiyatê dûr, bi selametî bi dawî bînin, ez hêvîdar im hûn ê hingî min fêhm bikin bê çîma Holî-î-Tor.

Hûn dikarin bibêjin ma navekî din nema. Ger ya tirkan Yeşilçam be bila ya me jî Çama kesk be. Ma gelek tiştêne me ne wergerên tirkî ne?

Na heyran na, çenabe. Rast e, her tiştêne me di bin tesîra tirkan de maye, qet ne-be bila sînemaya me ne di bin tesîra tirkan de be. Hinek dikarin bibêjin hema bila "Karaçam" be. Na heyran, na, ne reş û ne jî qer. Navê ku çam di nav de bin me navê. Ji xwe li welatê me zêde çam tuneye. Çamên ku hene jî qereqol, dibistan û tabûrên tirkan bi awayekî sexte li xwe rapêçane. Yanî çam li welatê me gelekî kêm e. Hevriz hebûn, mazî û berû hebûn, lê mixabin ew jî ketin ber agirên operasyonan û hatin qirkirin.

Ya baş ew e ku navê sînemaya me Holî-î-Tor be. Hûn ê bêjin, çîma? Sebra we jî kêm e ha!

Hol, qonax e, yanî holik e. Tor, ew jî herêmeke welatê me ye û li bakurê Kurdistanê ye. Gelek taybetiyêne wê hene. Çend ji taybetiyêne wê ku mirov bihejmêre; mîrxasî, ciwanmîrî, berberî, serhişkî û hek û pek jî. Ev hinek ji taybetmendiyêne Torê ne. Lê taybetiyêne herêma Torê ne ev bi tenê ne. Ji aliye çand, huner û torê ve herêma Torê xezîneyeke herî mezin ya welatê me ye. Ji xwe di civatan de tiştê herî balkêş jî ev e.

Ka em dîsa vegerin ser mijara xwe ya sînema û şanogeriyê ji bo ku bersivêne pir-sên jorîn zelaltır bibin.

Ev çend sal in ku televizyona kurdan çêbûye. Herçiqas ji aliye destêne qirêj ve ca-

rinan ekrana wê tête reşkirin jî, ew bûye çav û guhên gelê kurd. Bi saya vê televizyonê ev çend sal in berhemên hunermend û siyasetvanê me bi tevahî digihîje gelê me. Ev jî hem civatê hem jî xwediyê berheman pêş de dibe. Yek jî van berheman jî şanogerî ye. Bi destpêka televizyona kurdî re cara pêşî tiyatro li ser ekranê hate temasêkirin. Gelek kom derketin holê. Lê koma destpêk û balkêş ku damarên gelê kurd mîz dida, Koma Ahmedê Xanî ye. Ji ber ku Koma Ahmedê Xanî mijarên xwe ji nav jiyanâ gel ya rojane hildibijêre û bi awayekî mîzahî pêşkêşî gel dike. Lê di warê ziman û edebiyatê de tiştek nedida civatê. Neyê jîbirkirin ku bi derengî be jî gelê me di nava ronesanekê de ye. Ji ber vê yekê divê berhemên me bi pîvan bin û gavekê li pêşîya gel bin. Ne ku ez dibêjim em gelekî modern bin û jî gel bi dûr bîkevin û têkiliyên xwe û gel jî hev qut bikin. Lê berhemên bi taybetî bi zîmîn ve girêdayî ne, divê ne herêmî bin. Divê ew neteweyî bin. Helbet Koma Ahmedê Xanî bê iştisna şanogerî nexwendine, lê bi salan e berhemên xwe tîne ser ekranên televizyonê û neteweya kurd li wan temaşe û guhdarî dike. Ev jî karê wan dixe qonaxa neteweyî. Lê mixabin ziman û devokê ku bi kar tînin di warê herêmî de dimîne. Yanî Koma Ahmedê Xanî devoka herêma Torê bi kar tîne. Hema bêje ew mijarên xwe jî ji wê herêmê hildibijêrin. Ev jî karê wan di nava sînorên herêmekê de dihêle û ev me bi pêş de nabe. Pêwîst e hemû karêne me li gora normên neteweyî bin. Ruhê neteweyî çiqas xurt bibe herêm jî pê re xurt dîbin. Lê gava neteweyekî weke neteweyê kurd ku hê nû bi çarpiyan dimeşe, em giraniyê bidin ser herêman û bidin pêşîya neteweyê, ew zarok nikare bi ser lingan bikeve û bimeşe.

Em gelekî dereng mane. Divê em em hemû saziyên xwe li gora normên neteweyî ava bikin û yên ku hene jî em wan li gora normên neteweyî xurt bikin, nû bikin.

Rast e, gelek saziyên me çêbûne, weke televizyon, parlemento, federasyona li Swêdê, Enstituya Bruksel, ya Parîs û Berlînê û bi dehan partî, rêkxistin, komele û Akademiya Çand û Hunera Kurdî. Şikir ji Xwedê re van avahiyên ku min li jor ji-martin bi piranî di warê cografi de neteweyî ne. Lê di warê siyasî û kiryaran de ji Koma Ahmedê Xanî herêmîtir in. Gelek komeleyên me hene bi xal û xwarziyan, bi ap û biraziyan li ser lingan in. Yanî ji heremî jî ketine, di warekî malbatî de ne. Ji xwe navê wan li ser wan in. Komele. Yanî komik. Lê partî, enstitû û akademî?

Hela partî karê siyasetvanan e û enstitû jî karê zanistî yê nivîskaran e. Lê akademî? Ez weke hunermendekî kurd pêwîst e akademiya çand û hunera kurdî bi he-vokêkê rexne bikim. Ew çiqasî li ber xwe dide û projeyên mezin dide ber xwe. Lê mixabin ji warê komeleyekê ku li ser şopeke siyasî ye, hê xwe rizgar nekiriye. Gelek caran dikeve warên teng û dest û lingên akademiye li hev digerin. Nimûne: Gava birêz Ocalan hate Romayê ev tiştên ku min li jor anîn ziman gelekî zelal hate dîtin.

Bi dehan nimûneyên wenî hene ku mirov dikare bîne zimên. Gava akademiya kur-dî bixwaze bi hunermendekî kurd re kar bike çenâbe ku fikir û ramanê wî yên siyasî bide ber çavan. Pêwîst e bi tenê berhemên wî li ber çavan bigire. Heger saziyên me wisa teng bimînin, wê xebatê wan jî teng bimînin. Helbet wê xaniyên wan jî teng bimînin. Fireh nabin. Yanî nikarin bibin Hoolywood, Canes, Yeşilçam. Ancax bibin Hol-î-Tor. Ew jî têra Koma Ahmedê Xanî nake. Heger Koma Ahmedê Xanî xwe ji devoka Torê (Ez ne li hember devokê herêmî me. Ev dewlemendiyeke zimanê me ye) yanî herêmî xwe rizgar neke, nagihîje ziman û normên neteweyî. Qet nebe kurmanciyeke neteweyî lazim e. Ew jî bi xebat û bi kadiran çedibe. Deri-yên xwe ji kadirên cûr be cûr yên herêman re vekin. Berî her tiştî divê xwe di warê fizîkî de ji herêmî xelas bike. Tiştê ku ez dizanim kadirên Koma Ahmedê Xanî tev ji herêma Torê ne. Yek ji Dersimê bi navê kalê Zerdeşt hebû, ew jî di nava komê de hînî kurmancî bûbû. Yanî ew jî bi torîkî dipeyivî. Beriya Sîrac û Remo, Kalê Zerdeşt ji tîpa "E" yê re digot "Aa" Heyran ji "E" yê re bêjin "E" û ji "A" yê re jî bêjin "A". Gotinan nerm bibêjin. Yan na hûn ê di Hol-î-Tor de jî di sinifê de bimînin haa!

Em wek temâsevan û guhdarêñ Medya TVê li hêviya we û xebatêñ we yên nûne. Me gelekî bêriya we kiriye. Ji ber ku zêde reng û dengê we xuya nake.

Ha! Ez ditîsim hûn ji ber sedemên malî nikarin wextê xwe bidin hunerê. Mala minê! Kî dizane hûn her yek li kîjan deverê ci karê giran dikin? Êvaran westiyayî vedigerin malê. Sibehê zû dîsan diçin kar û heta êvarî dixebeitin. Ü dîsa westiyayî vedigerin nava zarokan. Qedeха çayê nîvco li ser masê, dixana cigarê li hewa cemidî û qapaxêñ çavêñ westiyayî li ser hevdu. Ez dizanim. Sosyal dijwar bûye. Nema qebûl dike. Dibêjin madem hûn hunermendêñ welatê xwe ne û naskirî ne, wê çaxê hatina we gelek e, hûn ne hewcêyî alîkariyê ne. Ya karê em bidin we hûn ê bikin, yan jî bila gelê we û saziyên we alîkariya we bikin. Bi kurtî sosyal dibêje: "Hûn li ku hêkan dikin, li wir qaqa bikin." Yanî fêda we li kê hebe here gazinêñ xwe bi wan bikin.

Ê em şoreşger in birê min! Ma çedibe ku em ji hunerê pera bixwazin? Ayip olur ha, hevalê hêja! Heger ev tiştên ku ez dibêjim rast bin (tirsa min jî ew e) rexneyêñ min ji bo Koma Ahmedê Xanî vala ne. Heger civatek, gelek nikaribe hunermendêñ xwe xwedî bike, ne xwedî maf e ku hunermendêñ xwe rexne bike.

Min zû de di kovara NÜDEMê de gotibû: "Ji bo ku mirov bikaribe wek hunermendekî kurd li Ewrûpayê bijî, hunermendiyeke din lazim e."

Pek li vê ecêbê! Hol-î-Tor jî çûye, haya min jê tune... □

# Dîlbera min

YAQOB TILERMENİ

**H**er tiştî bi barana wê rojê dest pê kir. Di vê mehê de, baraneke wisa nehatibû dîtin; baraneke li dijî xwezayê; baraneke ku bi şilkirina xwe mirov xweşik dikir; baraneke bêhempa û abadîn bû. Wek hercar li zanîngehê, li ser çalakiyan me nîqaş bi hevûdû re dikir. Em çend heval li bexçeyê zanîngehê hatibûn ser hev. Hevalên me giş, ji bo ku şoressertiya xwe nîşan bidin, weke her tim bi peyvên tûj hevûdû rexne dikirin û kesî li kesî guhdar nedikirin. Ji bo weha, her yekî çend kevareyî jî, di xwe de dihewandin: Simbêl boq, rû tahl, kinc qilêrî, pirr bieseh.

Cara ewil bû, min ew li wî bexçeyî didît, dema em di nîqaşan de bûn. Baran dibariya. Bi çend taybetiyên xwe payizê dest pê kiribû. Darêñ di bexçeyê zanîngehê de, hêj pelên xwe neweşandibûn; lê xemgîniya havînê li ser pelan, bi zerbûnekê berî bi çend rojan ez li vir bûm digot. Me çiqas xwe ji baranê diparast, me xwe di-da alî, dîsa jî em ji şilbûnê xelas nedibûn. Di nav hevalên me de, min ew nuh didît. Navê wê Dîlber bû, bi Dilşa re hatibû. Dilşa, ew ji bo naskirinê hanîbû. Barana ku em şil dikirin, rahmeke xweş bera hundirê min dabû. Çiqas ez tev li axaftinan di-bûm jî, bala min li ser wê bû. Ez diqlıqlîm, bi çavine şermokî min li aliyê wê dini-hêrî. Ji mirinê re çawa tiştek nikare bibe asteng, ji awirêñ evînê re jî tu tişt nikarîbû bîba asteng; carekê min ew dîtibû. Wexta ku Dilşa, em bi hev naskirin da, ez ji peroşînê li bin guhê hevalên xwe ketim. Çavêñ min li şilbûna wê hay bûbû. Baranê, porê wê yî dirêj mîna ku şeh kiribe, rê dida. Lîvên wê ji sermê sorbûna xwe wenda kiribûn, wek dara bêav û zuha xuya dikirin.

Em ji bo daxwazên xwe yên demokratîk û akademîk di tevgerê de bûn. Me ders

boykot kiribûn. Li gorî agahiyan, dîsa çend gund hatîbûn şewitandin. Divê em li dijî vêya derketana. Divê me çalakînî ku deng baniya li dar xista. Ji bo weha em li ber deriyê dersxaneyan disekinîn û me nedîhişt tu kes têkevin dersan.

Hêj sala min î duduwa bû lizanîngehê. Ez ji gellek aliyî ve bi pêş ve çâbûm. Ci hekî min î cuda di nav hevalan de hebû. Ez ji vê navendê aciz bibûm. Ci tişten min dikir, giş ji bo derketina ber bi çavan bû. Pêdiviya min, ji hezkirinê û ji naskirinê hebû. Ez pirr dixebeitîm. Tişte ku kesî nedîwêribû xwe tê de derxista, min bê-pirs xwe diavêtê. Bila ez di çavên hevalan ketama, bes bû. Ji ber vê rewşa min, carekê apê min bi taybetî bi min re axivibû. Ji min re gotibû: "Kurê min, çavê min li ser te ye, tişte ku ez dibînim tu şoreşgerekî tûj xuya dike. Lê ez bawer im, şoresgertî bi pereyê malbatê nayê kirin. Kengî ku tu bû yî berpirsiyarê xwe, wê çaxê bi pereyê xwe tu çer dikî, kêfa te dizane."

Tu carî ez nedibûm ez. Vêya apê min jî ferq kiribû. Werr ez li gora hinekî din dijiyam. Hest û dilînên min tu car dergediketin derveyê min; werr bidizî diman. Ku mirovekî hinavêن min vekira û lê binêriya, wê bigota ev ne Welat e. Piştî ku min Dîlber dît û pê ve, bêtir ez derdiketim ber çavan. Min ew dît û pê ve dinya li ber çavên min tevlihevtir bûbû. Ewrêñ reş wek perdeyekê xwe bera ser min dabûn. Ewrêñ heta iro ku her yek li aliyeckî bûn, iro giş civiyabûn ser hev. Ne rojêñ min roj bûn û ne şevê min şev. Tew, xew qet li min nemabû. Min pakêtêñ cixaran derxistibû duduwan. Ez wek berê ne li ser xwe bûm. Di nav koma hevalan de, ez wek mirovekî gêj xuya dibûm. Kesî ji rewşa min fêm nedikir. Jixwe min jî ev tiş dixwest. Ezê çawa ji wê re bêjim? Ezê ci ji wê re bêjim? Bîst û çar saetan fikara min ev bû.

Dîlber keçekte pirr lihevhatî bû. Xweşikbûneke wê yî bêhempa û kêşyeke wê yî tijeraz hebû. Bejina wê dirêj û porê wê jî mîna bejna wê rast û dirêj bû. Ser çavên wê fireh, çavên wê wek ên xezalan mezin û xweşik bûn. Bi hatina xwe re, ji hêla herkesî ve hatibû pejirandin. Li ku çalakiyek, li ku tevgerek çêbiba ew li wê derê bû. Heta nuha min gellek keçikêñ xweşik dîtibû. Lê werr min di wan de kêmasînin dîtibû. Dîlber ji gişa cuda bû. Hem ji hêla xweşikbûnê û hem jî ji hêla fikarê, li gora dilê min bû. Hinek keçik henin ji hêla xweşikbûnê pirr balkêş in, lê di hal û hereketêñ xwe de pirr kêmasiyêñ wan henin. Hinek qîz jî, ji hêla fikarê, ji hêla jîrbûnê têra xwe henin, lê bi qasî mistekê jî xweşikbûna wan tunene. Dîlber bi herdu aliyê xwe jî li gora dilê min bû. Pirr peyvşérîn û mirovhez bû; dostê dostan bû. Xweşikbûna di derûniya wê de, xwe di derveyê wê jî de dida der. Carekê du caran, em herdû bi tenê li cem hev rûniştibûn. Min biriqandinek di çavên wê de dîtibû.

Qet şika min nemabû; wê ji...

Ev bajar bi baranê, min ber bi xwe de dikişand. Baran bibariya ne gengaz bû ku ez nemeşiyama. Baranê ji, ji vî bajarî hez dikir; dixwest ku zû bi zû erda bajêr ramûsîne. Li ser ruyê erdê bi milyaran mirov hebûn, lê yek ji nedîşibîyan yê din. Li vî bajarî ji çend milyon meriv dijîyan. Her merivek bi serê xwe cîhanek bû. Kur ji hebûn: Kurên ku ji keçikêñ gewr hez dikirin, ên ji keçikêñ esmer hez dikirin û ên ji keçikan hez nedikirin; her hinek bi serê xwe bûn. Lê tiştekî bi misogerî hebû ku xwe di hinavêñ her mirovî de veşartibû. Ev ji, hezkirina qedexe bû. Her keçek li ber dilê wê Memek hebû; her lawek li ber dilê wî Zînek hebû. Ne bi Mem re, ne bi Zîn re hêza gotina "Ez ji te hez dikim" tune bû. Kesî hezkirin li kesî qedexe nedikir. Qedexebûn di serê mirovan de cih girtibû. Baranê bêtirs û bêxof erda bajêr diramûsand, hezkirina xwe bi mînakî diyarî erdê dikir. Lê, me sûd jê wernedigirt.

Min pîrt ji baranêñ vî bajarî hez dikir. Du şev berê, ji ber êşa dilê xwe, nîvê şevê ez rabibûm, derketibûm derve. Barana ku dibariya, ez ber bi derve kişandibûm. Baran ji min re bibû sedema nerakerinê ji. Nêzîka pêncî deqî ez li kolanêñ bajêr meşiyabûm. Ji min û kûçik û pisîkan pê ve tu kes li kolanan tune bûn. Qey kûçik û pisîk ji bi tayê ketibûn; bes, ew ji baranê ditîriyan, ji baranê direviyan.

Beyana sibehê ez bi xwe hisiyabûm. Ji ber barana ku bi şev li min kiribû, tayekê ez girtibûm. Min nedixwest ez tu kesî bibînim. Sebra min di hundur de ji nedihat. Bi dijwarî ez rabibûm ser xwe, min bi gellek kincêñ sitûr xwe pêçabû. Di rojêñ weha de, ez diçûm bexçeyê nav bajêr. Bi tenê ez çûbûm, li ser kursiyekê rûniştibûm. Min kursiya xwe sipartibû darekê. Darê hîn pelê xwe neweşandibû. Qirika min xetimîbû, bes min cixare li dû cixarê pêxistibû. Ez carina, di nav xewn û xeyalêñ kûr de, wenda dibûm. Jixwe min dixwest ez bi serê xwe bimînim û êşê bikişînim. Lê wek her car, dîsa hinek dihatin li nik min dirûniştin. Nedîhiştin ku ez li gor dilê xwe êşê ji bikişînim. Dibûn manihê her tişti. Hevalê ku li cem min rûniştibû, dest bi peyvê kiribû. Lê kirtînî ji, bi min neketibû. Vê carê henekê xwe bi min kiribû Mahrûmo tu çawa însanî! Mirov tê cem te, tu silavekê ji li mirov nakî! Dîsa min dengê xwe nekiribû. Min di dilê xwe de gotibû: "Ma kê ji te re gotiye wer li cem min rûnê?" □

## **Qala mirinê meke lawiko**

**Kawa Nemir**

qala mirinê meke lawiko  
ditirsim  
bi wan çekan melîze lawiko  
ditirsim dikim vegeŕime malzaroka Yadê  
lawiko  
ditirsim  
dema ku tu mezin bûyî memire lawiko  
ditirsim

tu qala mirinê dikî lawiko  
li kuçeyên kavil binêre  
dipdirêj keçikek li kêleka berateyê cewrikekî  
çî dibêje jî mirovahiyê re di dêst de guleke canliber  
li ber pozê wî cewrikî, lê ye bêhn bike

qala mirinê meke lawiko  
li gorepanêñ xalî binêre  
herkesî bar kir, dîsa jî man ez û tu  
çaven me dimînin kuşdaran  
stranêñ şikestîne  
bayê felekê  
dimînin li van deran  
ters û talan  
qala mirinê meke lawiko  
em ditirsin

binêre lawiko  
mirî dibihurin  
mirî dimeşin  
mirî tê dikoşin  
mirî dibezin  
mirî vedijin  
mirî dimirin  
ev e tiştê di tûrîkê mirinê de  
hespekî spî yî pêlîstokî  
ji lawikêna xakî te diyarî

### **Lawikê Qayışkêş**

Lawik her roj li dolmîşê siwar dibe  
Lawik her roj li Qeregumrikê peya dibe  
Derkî lêwik heye, alem pê dizane  
Lêwik dil daye keçeye şilftazî  
Ku kes bi dilniwaziyê bêbavê nizane

Lawik karker e, qayışê bi heft duwalan re dikêşê  
Da bi buhayê gulekê, xal û xetekê ji gerdenê binoşe

### **Kawa Nemir**

# XALID SITAR: "Dilê Kurdistanê di dilê min de ye"

S. SULEVANÎ

**D**i nav van sih salên dawî de, jimara hunermendên kurd li derveyî welêt, li cîhanê û bi taybetî jî li Europa, Amerîka, Australia û Japonyayê ber bi mişebûnê ve diçe. Yek ji wan hunermendên jêhatî Xalid Sitar e.

Xalid Sitar li başurê Kurdistanê, bajarê Kerkukê sala 1952 ji dayik dibe û di malbateka xizan û kurdperwer de mezin dibe. Di çar saliya xwe de diya wî diçe ber dilovaniya xwe, bavê wî diçe çiya, digehe rêzên şoreşê nav hêza pêşmergan û loma jî berpirsiyariya perwedekekirina wî dikeve ser stoyê bapîrê wî. Ji wê demê pêde bine-mala Xalid di tirseke berdewam de dijîn ku rojekê rejîma dağirker bi ser wan de bêñ û wan bêser û şun û winda bikin. Li bajarekî wek Kerkukî ku her kurdbûn bi tenê, gunehike cezaya wê digehe kuştin û darvekirinê vêce wê çawa be ger endamekî malbatê di nav rêz û cerga şoreşê de be. Ji ber van sedeman hunermend di şazdesaliya xwe de bêgav dimîne, dibistanê bicih dihêle û ew jî diçe çiya û digehe şoreşê.

Ew her çend delîvek wilo baş bi dest neketiye da jiyana xwendin û hunerî berde-wam û bi pêşve bibe lê, ew her dem ji evîn û heskirina hunerê nêzîk bû. Digel zehmetiyan ew xwe û hunera xwe bi pêşve dibe. Her çi tişt bikeve destê wî, ew pê xêz dike û hunerê diafrîne vêce ci rejî be, pênûs be, dar be, ber be, li ser kaxezê be, li ser axê be, li ser dîwaran be; wî hewlîn xwe dane bo çêkirina hunerê. Her çend wî dibistana hunerê nexwendîye lê, ew mamostayekî hunerê ye.

Naveroka tabloyên Xalid tijî ye bi gotin û têgehiştinên wek Kurdistan, kurdistanî, kurd, kurdî, kurdbûn û peyvîn din ku xwe bi vê peyvê kurd dipêçin. Her mijarek jî di dawiyê de digere bo welatekî bê sînor û bindest, bo mirovahiyê. Di her tabloyekê de felsefek heye, dîtin û boçûnek kurdî û mirovahî heye. Ew dixwaze bi rîya tabloyên xwe bala me bikşîne ser êşekê û li dermanekî digere. Rastiya Kurdistanê bi nimûneyên bê dawî radixe ber çavêن me. Ew li xweşiyê nagere, lê li nexwesiyyên Kurdistanê digere, li huner digere. Qîrîna zarokekê, girîna zilamekî, hawara jinekê, rondikên kalekî, tevkuiyekê, kuştina miletikî, raperînekê, serhildan û serx-

webûnekê radixe ser tablo û dike huner. Ew girêdayî dozekê ye, girêdayî pirsa miletê xwe ye. Belê ew girêdayî doza miletê xwe. Di programa pêşengehekê de (Galleri Tio) derbarî Xalid Sitar weha tê nivîsin: "Hunerê Xalid realiteta Kurdistanê rave dike. Bêzarî, îşkence û kuştina ku li miletê kurd rê kirin dibin îlham û mijar bo tabloyên wî."

Kurdisan bi natur û xwezayîya xwe ya ciwan dibe jêder bo tabloyên hunermend. Ji deşten fireh û bi ber heya şax û çiyyâyen binecîh û bilind ber bi asman, ji gelî û newalên kûr û asê heya çem û rûbarêن pir û dirêj, ji ava sar û zelal heya baxçen bêhnxwêş û behîşî, heya daristan û spîndarêن bilind. Ev spehiyên han dibin insiprasyon û hunermend bi xaka welêt girê dide. Lê hezar heyf e ku ev behîşta ser zemîn dibe meydana agir û xelk di ajdeh de dijîn. Bombebaran, sotandina gund û bajarêن Kurdistanê, malwêranî, îşkence, şerê dagirkiran ser kurdan, şerê navxwe û gelek xirabiyêن din, dibin mijarêن negativ û xemgîn di tabloyên Xalid Sitar de. Ew wêne dikêşê û dibe şahidê dema xwe, ew dibe hevalbendekî Herodotus dema dibêje: "Ez bêgav im behsa her tişte tê kirin û gotin bikim. Lî, ez ne bêgav im bawerî bi hemîyan bînim."

Çawa di jiyanê de xweşî û nexweşî heye, her wisa tabloyên Xalid jî nîşana vê yekê dide û dibe werger bo jiyanâ kurdî, rengdan bo realiteta li Kurdistanê. Ew nexweşîyan dike tablo, rûdanêن biçûk û mezîn, elementên rojane; dike wêne û pêşkêşî te-maşevanêن tabloyên xwe dike. Ew xweşiyê û ciwaniyê di reng û objektên tabloyê de dibîne, di felsefeya tabloyê de dibîne û ya giringtir di mesaja xwe de wek hunermend dibîne.

Xalid Sitar bi giştî sê rîbazên hunerî bikar tîne: realism, ekspresyonism û impressionism lê, di dema dawî de hewlên wî bo rîbaza abstrakt jî heye. Bi rîya van rîbazên hunerî ew dixwaze rastiya Kurdistanê ya tal, nazik û dijwar; xêz û rengîn dike ser tablo. Ew bi awayekî serkevtî û harmonî yariya digel rengan dike. Di piraniya tabloyan de rengîn germ hene lê bi hostayî ew rengîn sar jî bi kar tîne. Berfa sar dema zivistanan û tava germ dema havînan xêrê û bereketê didin axa Kurdistanê her wisa ew rengîn sar û germ di tabloyan de, spehî û ciwaniyê didin berhemên Xalid.

Rengîn tabloyan jî mirov dikare bêje ku bi çend qonaxan derbas dibe:


Qonaxa yekem li Kurdistanê bû. Wî wê demê gelek rengîn reş û spî bi kar dianî.

Qonaxa duwem jî wî gelek rengîn purteqalî, sor û zer bi kar anîye.

Qonaxa sêyem jî ew derbasî rengî benefsecî (lîlav) yê vekirî/tarî û gewr dibe.

Qonaxa çarem jî mirov nikare bêje ku rengekî an çend rengîn taybetî bikar tîne.

Mirov hîç hest bi konsentre kirîna rengekî taybetî nake, ew hema bêje hemî rengan bikar tîne û bi awayekî zeq û beloq. Li vir kontrast nav rengan de heye û qey tu bê-



"Xalid Sitar  
Qîrîna zaroke-  
kê, girîna zila-  
mekî, hawara  
jinekê, rondi-  
kên kalekî,  
tevkijiyekê,  
kuştina mile-  
tekî, raperîne-  
kê, serhildan  
û serxwebû-  
nekê radixe  
ser tablo û di-  
ke huner."

jî ew reng di nav şerekî de ne. Di van tabloyan de mirov hest bi nearamiyekê, neji-jiyekê û nerehetiyekê dike.

Qonaxa pêncem jî ew rengên volkanî yên tox û tarî bikar tîne û mirov nikare pir rengan bibîne, ew hebin jî, ew veşartî ne an jî ya rastir ew têr winda kirin ber û di nav wan rengên zil û egresîv de wek yên volkanî.

Xalid navan li tabloyêñ xwe naked, ew naxwaze têgehiştin û dîtinêñ wî bibin asteng û bandor bo têgehiştina bîner û temashevânêñ tabloyêñ xwe, bi gotinek din ew naxwaze bala temashevân bikşîne ser dîtineke taybetî. Lê, ew dixwaze her temashevanek duf dîtin û têgehiştina xwe, tabloyê şirove bike.

Heya nuha çend pêşengehêñ wî çêbûne:

1979 li Silêmaniyê-Kurdistan; 1983 li Silêmaniyê; 1986 li Karlstad û Karlskoga-Swêd; 1987 li Stokholm-Swêd; 1988 li London-Ingiltere; 1988 û 1990 du pêşengeh



41 x 57 cm

P: Azadî bo te wek mirovekî kurd û hunermend tê ci iêgehiştinê? Mebesta min bi azadî jî, mafê mirov e, bi taybetî bo kesevê kurd ku ji wenatekî bindest û parçekirî tê.

B: Ger ez nebêjim min azadî nedîtiye, min gelek kêm dîtîye. Ger mirov jî azad nebe ew nikare tişte di dilê xwe de wek huner pêşkêş bike. Erê tu ê bikaî hineê azadiyê bi dizî bo xwe peyda bikî, her wisa tu dikarî hunerekê simbolik jî biafrînê lê, tırsa dijmin wê her li pêşîya te be û tu wê di haletaka psîkolojî ya taybetî bijî. Bêgoman di her diyardekê de tiştên baş û xirab heye, tiştên positîv û negatîv heye, bi nebûna azadiyê dibe hunermend serîhilde û berhemên hêja û orijinal biafrîne û dibe hunermend têkbiçe û bişkê ber dijwariyên jiyanê. Azadî rêyeka giring e bo hunermend da bikare xwe bi pêşve bibe û berhemên baş pêşkêşî gel bike.

P: Nuha em ji azadiya hunermend biçin bo azadiya huner. Bêgoman azadî li huner jî pêwist e. Îro azadiyek yekcar mezin heye di awayê karkirinê de û di naverokê de li hine janr û rengên huner. Hunermenden gavêن mezin avêtine nexasim ger em azadiya nuha rûberî azadiya bi pêş sed salan de bikin, emê vê yekê baş bibînin. Tu dibinê

li Swêd; 1994 pêşengehek bi hevkarî digel Lunds Aktivitetscentrum; 1995, 1998 û 1999 çar pêşengeh li Lund-Swêd.

Da em hunermend ji nêzik ve nas bikin me ev hevpeyvîn pê re çêkit.

**Pisyar:** Dilê Kurdistanê Kerkuk, bajarê biçûkatiyê, tê ci wateyê bo te?

**Bersiv:** Dilê Kurdistanê di dilê min de ye. Kerkuk qet ji bîra min naçe, wek qible her dem rû û berê xwe didimê. Hîvidar im rojekê ji rojan bikarim vegerim Kerkukeke bi formekî din, bi şêweke din ku bêhna kurdewarî têde bimîne wek caran û xelk têde bi biratî bijîn. Kerkuk navekî paqîj û ciwan hebe.

*huner mendek heye bi dest û lepêن xwe tabloyan çedike, yekî din bi pêlav yan pêxwas diçê ser tabloya xwe û rengan belav û li hev dike. Xelk gelek caran li hine huner mendan û tabloyên wan tênagehe. Erê kêmâsi nik huner mend e an jî nik xelk e ku li huner tênagehe?*

B: İro cudahiyek mezin heye mîna te gotî bi pêşî sedsala borî, bi taybetî pişt hunerê klasikî û dibistanên pişti wê hatin. Huner mendan karîn xwe vekin ser tiştên taze û azaya wê hebin ku tiştên nû biceribînin her çend destpêka her tiştekî gelek bi zehmet û bi dijwarî ye û xelk bi hêsanî wan napijirînin. Bo min giring nîne mirrov tiştekê taze bikar bîne yan ne, an jî bi çi awayê hunera xwe çêke, vêce çi bi dest be çi bi firçe be û çi bi materialek nû be. Ya giring bo min ewe ku dema huner mend berhemên xwe pêşkêş bike, ew dîtinekê, bîrekê, pirsyarekê, felsefekê raxe ber çavêن temâsevan ku lê hizir bike, bîr bike û bi encamekê derkeve. Ya giring ew e huner xizmetekê bike û hestê mirov bicolîne. Ewa tu dibêjî rast e ku hine huner mend hene bi dest yan bi lule rengan pifdide ser tabloyê. Bêgoman eve bê wate nîne û her huner mendekî/ê mebesteke xwe ya taybetî di wê yekê de heye.

P: *Wek di her fenomeneke taze, azadiya huner jî tiştên pozitîv û negatîv digel xwe anî. Gelek xelk heye li vê azadiyê û li vî hunerê taze tênagehe. Erê hoyâ vê huner mend e yan xelk e ku li huner tênagehe. Li vir mebesta min tenê kurd nîne lê belku di pila yekem de xelkê welatên pêşketî ku bi rastî li huner têdigezin.*

B: Bila ez pêşî behsê tabloyen xwe bikim. Dibe te jî ew note kiribe ku di tabloyen min de hîç alozî têde nîne û ew gelek hêsan e. Ez bawer dikim xelk jî bi hêsanî lê têdigehe. Ya rastî ez hêste negehîştime wê baweriye ku dest bi hunerê taze (stîl, material û şêwe) bikim lê, dibe di pêşerojê de dest bi vî rengî jî bikim. Rast e, xelk heye ku li huner tênagehe, ew jî ne gunehê temâsevan e, her wisa ne gunehê huner mend e jî. Huner mend hewl dide dîtinên xwe pêşkêş bike duf dîtin û têgehişti na xwe. Lî li vir ez dixwazim bêjim ku huner mend berpirsiyar e beramber temâsevanî, eger ew temâsevan li hunerê wî/wê huner mendî/ê tênegehe jî, gereke ew temâsevan çêsekê, xweşiyekê jî wê berhemê bibîne bi kêmî ji reng û awayê çêkirina wê berhemê.

P: *Di vê kontekstê de tu temâsevanê kurd çawa dibînê?*

B: Bêgoman miletê me xwedan zewq e, ew ji huner bi giştî hez dike. Mêze bike, ji alê muzîk ve, teatir ve, dans û hunerên din ve millet bi çavekî baş lê dinêre û hurmet ji huner mendan re digire. Lî, mixabin rewşa Kurdistanê ewqas baş nîne û rî nehatiye dan bo milletê kurd da xwe bi pêşve bibe di van huneran de lê, digel vê yekê jî xelkê kurd hewl didin kultura xwe bi pêşve bibin û li huner mendan xwe xwedî derkevin. Ez demekê li Sulêmaniyê jiyyame, hîç mehek derbas nedibû bêyî ku pêşengehek yan çend pêşengeh bêñ vekirin. Xelkê bajêr jî bi dilxweşî pêşwazî

wan pêşengehan dikir. Kurd hember milletên din di vê yekê de gelek baş in.

P: *Rengên tabloyên te mirov dikare di çend qonaxan de bîne ziman. Demekê te tenê reş û spî bikar anîye, paş zilbûna rengê purteqalî, rengê benefşî, pir reng û dema dawî jî rengên volkanî. Ev guherîna peryodîk jî ci tê û bo çî?*

B: Her hunermendek digel huner, dem û guherîna jiyan; tê guhertin û bi vê jî hunerê wî/wê jî tê guhertin. Guherîna rewşa politîkî, ekonomî, sosyolojî û civatî hîkariyê ser hunermend dike û di encam de guherîn ser tabloyê jî çedîke. Reng, yek ji elementên serekî ne di tabloyekê de û ew baş tê xuya kirin ber çav.

Ji ber vê yekê û digel van guherînan de reng jî tên guhertin. Di rastiyê de di destpêkê de min gelek guh nedida reng û her reş û spî bikar dianî bi taybetî ew dema ez li Sulêmanîyê bûm. Piştî hingê min hez kir ku bi reng jî kar bikim. Helbet di her tabloyekê de mebesta min heye ji rengên wê tabloyê lê, bi awayekê giştî mebesta min nebû ku ez di her peryodekê de rengekî serekî an çend rengan bikar bînim. Diyar e mîna min li jor gotî dibe ew girêdayî guherîna jiyanâ dewrûpişta min e.

P: *Di naveroka tabloyên te de mirov hest bi nexweşiyekê û êşike kûr dike, erê bo çî?*

B: Eger te tiştek hebe, merc nîne tu nivîskar bî, rejîsor bî, rojnamevan bî an jî her ci bî, ger ew tişte te hebit di xizmet tiştekî pîroz de bikar bîne bo mebestekê. Min ku ev piçek huner heye hez dikim di xizmeta tiştekê de terxan bikim. Pêşî xizmeta xelkê xwe û milletê xwe pê bikim. Ez jiyanâ milletê xwe di êşekê de dibînim, ew di xeweke giran de ye û pêwistî bi hişyarbûnekê de heye. Armanca min ew e duf hêz û şiyana xwe bala xelkê bikşînim ser wan eşan.

P: *Tu karê hunermendêñ kurd li Kurdistanê û li derveyî welêt çawa dibîni? Erê ci*



25 x 35 cm

*têkeliyek navbera huner-mendên li welat û dervey welat heye?*

B: Na, mixabin ci peywendiye wisa nîne. Kêsen ku ez bi xwe nas dikim peywendiya min bi wan re heye. Lê kesen din dibihisim ku pêşengehek li filan cihî an jî li filan paytextî çêkirine lê, agah-dariyek tekûz û baş mixabin me nîne, ne navbera kurdên li welat û derveyî welat û ne jî di nevbera hunermendên li derveyî welat navxwe jî heye. Lê bi dîtina min hunera kur-dî ci li welat û ci li diaspora bi pêşve diçe. Hunermendên baş hene, bizeka hunerî heye û biyanî bi çavekê hurmetê lê dinêrin. Di vê yekê de ez optimist û xweşbînim. Ji xwe li Kurdistanê hunermendên baş baş hene û ew berhemên xwe bi berdewarmî pêşkêş dikin. Di çend serdanê min bo Kkurdistanê di van çend salên dawî de bi taybetî li Sulêmaniyê her dem pêşengehêن cudacuda hebûn, eve jî dilê mirov geş û xweş dike.

P: *Hinek hunerê dikin bo baziganiyê, tu ci dibêtî?*

B: Di rastiyê de ez bi şâş nabînim eger hunermend tabloyên xwe bifiroşe, belkî gelek baş e jî. Eger tabloyeka hunermendekê kurd li mala mirovekê swêdî be, el-manî be, amerîki be an jî her milletekî din be, ew jî dibe xizmet û xizmeteke dûr û dirêj e jî. Ew tablo wê her bimîne û xelkê wê malê wê behsê tabloyê û mijara wê tabloyê bikin. Lê ez tablo çenakim bi mebesta firotinê çunkî ew mijarêni di tabloyên min de şêwe û naverokek taybetî heye. Wek te dîti di tabloyên min de trajidî heye, problem heye, raxistina kêşa kurdî heye ku dibe europîyek hez li temâşekirina wan dîmenan neke û ew mijar ne gelek xweş bin, her çend di pêşengehêن min de, tablo hatine firotin û heya biyaniyen bi çavekî baş pêşwazî li wan mijaran kiri-



25 x 35 cm

ne digel dijwariya naverokê. Lî ez bi mebesta firotinê tablo çênakim.

P: *Mebesta min ji vê pisyarê ew e, erê başbûn û berzbûna hunermendekê mirov dikare bikîve bi firotina çend tabloyan û buhayê wan tabloyan?*

B: Bêgoman ne. Eger mirov rûne û tabloyekê çêke û hizir li wê bike ku gereke ev tablo bê firotin, ez bawer dikim nerxê hunerê wê tabloyê gelek namîne. Baş e eger mirov tabloyekê çêke bi dilê xwe û bi mijareke baş ku xelk jê sûd wergire. Di berzbûna hunermendekî jî gelek faktur dilîzin û hîç ne merc e ku ew hunermendekî super be.

P: *Ev herdu rîbazên hunerî, realism û ekspresyonism, gelek hunermendên kurd bikar tînin çunkî ew rastiya Kurdistanê ya tal, nazik û dijwar werdigerînin ser tablo û dîkin huner. Bi dîtina te bo ci rîbazên din wek surialî, abstrakt, futurism... û hwd gelek kêm tê bikar anîn bi taybeti li welat?*

B: Baş bikar anîna rastî û realiteti li Kurdistanê di huner de wê xizmeteke qenc bo mirovahiyê bike. Li vir jî mirov dikane du mebestan bîne ziman, ya yekem hişyarkirin û nasîna milletê xwe bi rastiya xwe ye û ya duwem jî nasîna milletê xwe û hunerê wî milletî bi xelkên biyanî ye. Bêgoman mebest her tenê pirsa polîtîkî nîne belkî pirtir rastiya sosyolojî ye. Bikaranîna van herdu rîbazan bi dîtina min hunermend nêzîk dike ji millet û mirovahiyê. Ew nêzîk dibe ji rastî û reşa wî milletî her wisa ez bawer dikim ku millet jî hez ji vê guhezîna hunerî dike, hez ji vejandina rastiyekê tal di berhemeke hunerî de.

P: *Tekniķa hunerî ya cudacuda heye wek bikaranîna rengê zeytî ser texte an ser qumaş, rengê akrêl, rengê avî û pastêl, pênuşen cuda û hwd. Tu kijan teknîkê bikar tînî?*

B: Bi rastî min hemî ew teknîk bikar anîye lê, di vê dema dawî de ez gelek akrêl bikar tînim her wisa gelek pênuş û graft jî bikar tînim.

P: *Îro her kes behsê ITê û soreşa informasyonê dike. Tu vê pêşveçunê di warê tabloyan de anku tablo çêkirin bi kompiyotirê cawa dibînî?*

B: Ci goman tê de nîne ku ev pêşveçûn hatiye da bimîne û wek di her warî de, di warê huner jî, kompiyotir cihê xwe kirîye. Rast e mirov dikare gelek tiştan bi vê navgînê bike. Ger mirov tablo bi kompiyotir çêkir, wî demî ew huner dibe hunera kompiyotir an jî her ci navekî din mirov lêbike, çunkî jîrî ya kompiyotir e. Lî, hunerê em behs dîkin jîrî sedîsed ya hunermend e. Ez bawer dikim ku tabloyen mirov çêdike hestekê mirovahî têde heye, germî û evînek têde heye ku tabloyen kompiyotir jê bêpar in.

P: *Ezê çend peyvan bêjim, tu bersiva wan bide bi peyvek din an jî hevokekê.*

Welat =Jiyan.

Polîtîk =Rê.

Ronakbîr=Çavê millet.



Tablo= Neynik.

Kurdistan= Hêviya min.

Koçberî = Bo gelekan mirin û bo hinekan rizgarbûn.

Zarok = Pêşeroj.

Heval = Pişt.

Kar = Pêdiviyek jiyanê.

Tirs= Zaroktî tê bîra min.

Yekîtî = Kurdistan ava dibe.

Zikreşî= Şikandin.

Profisyonalism = Pêşketin.

Jin = Nîvê civatê.

Ciwanî = Dermanê çavan.

Pare = Ne her tişt e.

Realism = Waqîî.

Ekspresyonism = Teibîrî.

Impresyonism = Intibâî.

Futurism = (musteqbelî) stîleke di nav huner û leteratur tê bikar anîn (1910), ev stîle bi giring dibîne mirov xwe biguncîne digel civata modern ya industrialî û tempoya bilind di vê civatê de. □

# Di zimanê kurdî de tewanga sernavan

ZEKÎ BOZARSLAN

**B**i gelempêrî zimanên hînd û ewrûpî, zimanên tewangbar in. Dema em dibêjin zimanên hînd û ewrûpî, zimanên tewangbar in, nayê vê maneyê ku di van zimanan de hemû bêjeyên axaftinê guhêrbar in; di hevokan de wek eslê xwe namînin û di hevokan de têr tewandin. Di van zimanan de jî hin bêjeyên axaftinê neguhêrbar in; ew di hevokan de nayêr tewandin; herwiha bêje di hevokan de wek eslê xwe bêtewang dimînin. Di zimanê hînd û ewrûpî de jî, di eslê bêjeyên neguhêrbar de tu guherîn çenabe. Wek nimûne di zimanê hînd û ewrûpî de jî, ji birêna axaftinê bêjeyên: daçek, gihanek, hoker, baneşan û sernav nayêr tewandin, lê di koma zimanê hînd û ewrûpî de zimanên slavî tenê sernavan ditewînin; emê li jêrê navê zimanên slavî ên ku sernavan ditewînin raberê xwendevanan bikin. Ji ber ku zimanê kurdî jî di koma zimanên hînd û ewrûpî de ye, zimanê kurdî jî zimanekî tewangbar e. Bi gotineke din, hin bêjeyên wî jî, di hevokan de wek eslê xwe namînin; di hevokan de li gora wezîfeyên ku dikevin ser milêwan, li gora wê, di hevokan de hin paşpirtik werdigrin û herwiha bêje di hevokan de diguhurin. Çawan ku di zimanên hînd û ewrûpî de hemû bêjeyên axaftinê neguhêrbar in, di hevokan de nayêr tewandin, herwiha di zimanê kurdî de jî hemû bêjeyên axaftinê neguhêrbar in; di hevokan de hemû bêje nayêr tewandin; di zimanê kurdî de jî hin bêjeyên axaftinê di hevokan de wek eslê xwe bê tewang dimînin. Di termêr ziman de, zimanzanên kurd ji vê awayê guherîna bêjeyan re gotine "tewang". Di her zimanî de neh, deh birêna bêjeyan hene. Di zimanê kurdî de jî deh birêna axaftinê hene:

**Nimûne:** lêker, navdêr, rengdêr, hejmar/jimarnav, daçek, hoker, cînav, baneşan, gihanek û veqetandek.

Wek ku me li jorê jî gotibû; hemû bêjeyên axaftinê di ziman de nayên tewandin; ji koma bêjeyên axaftinê, bêjeyên **guhêrbar** tenê di hevokan de têr tewandin; bêjeyên **neguhêrbar** di ziman de nayên tewandin, ew di hevokan de wek eslê xwe bêtewang dimînin. Bi gotineke din; di hevokan de, di eslê bêjeyên neguhêrbar de tu guherîn çenabe. Di zimanê kurdî de jî hemû bêje ne guhêrbar in; di zimanê kurdî de, ji birêna axaftinê, pênc bir tenê tewangbar in; pênc bir jî ne tewangbar in. Em niha li jêrê her pênc birêna bêjeyên guhêrbar raberê xwendevanan bikin:

**Bêjeyên guhêrbar:** navdêr, lêker, cînav û jimarnav û veqetandek.

Veqetandek (a, ê, ên, ek, hin) di hevokan de navdêrên binavkirî û yên nebinavkirî destnîşan dîkin. Veqetandek di hevokan de zayenda navdêran kîf dike; ew di zimanê kurdî de paşpirtikên tewanga navdêran dinimînin; û veqetandeka "ê" di zimanê kurdî de wezîfeya xwedîtiyê (forma genetif) dibîne. Ji bilî vana, veqetandek di axaftinê de li hin cihan jî wezîfeya cînavan dibîne. Em li ser vê mijarê li jêrê çend nimûne raberê xwendevanan bikin:

#### Nimûne:

- Tu kîjan fistanî dixwazî?
- Ez ê sorê gul gulî dixwazim.
- Tu kîjan sêvê dixwazî?
- Ez a sora mezin dixwazim.
- Lê hûn kîjan hirmêyan dixwazin?
- Em jî ên şîn dixwazim.

Di zimanê kurdî de bêjeyên guhêrbar: li gora halê navan, li gora deman, li gora kesan, li gora zayandan, li gora tiştên yekhejmar û pirhejmar; ji bo ku di hevokan de maneya wan biedile û di hevokan de wezîfeyên ku dikevin ser milên wan bê kêmânnî, bînin şûnê, di hevokan de hin paspirtik werdigrin û herwiha di hevokan de di guhurin; paşpirtikên veqetandekên binavkirî û ên nebinavkirî jî di nava van paşpirtikan de ne. Dema bêjeyên tewangbar, di hin halan de, di hevokan de neyên tewandin, wê demê maneya bêjeyan di hevokan de nayên edilandin; maneya wan di hevokan de kêm dimîne û herwiha maneya hevokan jî baş nayên fêmkirin. Dema

ku di nivîsekê de an jî di axaftinekê de wezîfeyênu ku dikevin ser milên bêjeyên guhêrbar, neyinin şûnê wê demê mijara nivîsê nayê fêmkirin, di axaftinê de jî bêjer û guhdar xelet ji hev fêm dikan û herwiha di zimanê nivîs û axaftinê de tevlîhevî pêk tê. Ji ber vê yekê jî bêjeyên guhêrbar divê di hevokan de wezîfeyênu ku dikevin ser milên wan, bê kêmanî, wezîfeyênu xwe bînin şûnê an jî tu maneya guhêrbariya wan namîne...

Di zimanê kurdî de hejmara birênu axaftinê yên neguhêrbar jî pênc in. Di zimanê kurdî de bêjeyên neguhêrbar di hevokan de nayêne tewandin; ew di hevokan de wek eslê xwe dimînin. Bi gotineke din, di hevokan de, di eslê bêjeyên neguhêrbar de tu guherîn çenabe; ew di hevokan de her tim wek eslê xwe bête-wang dimînin. Di zimanê kurdî de birênu bêjeyên neguhêrbar jî ev in;

**Bêjeyên neguhêrbar:** rengdêr, hoker, gîhanek, baneşan û daçek.

Ji birênu axaftinê, bêjeya "navdêr" jî, ji pênc navênu cihê hatiye pê; ev her pênc nav jî guhêrbar in û di hevokan de tên tewandin. Nimûne: navê meriv, heywan û hêşînahiyânu; navê tiştên berbiçav û tiştên abstrak. Ku em naveroka bêjeya "navdêrê" ve-kin û ji nêz de li naveroka wê binêrin, di naveroka wê ya berbiçav de ev nav hene.

### Nimûne:

**Sernav:** Bêrîvan, Zana, Xarpêt, Sîpanê Xelatê, Firat, Îngiliztan, Zozanê Şerevdî-nê, Ewrûpa, Deşta Heranê, Berlîn, Berriya Mêrdînê, Çiyayê Meretoyê...

**Navê heyînênu zindî:** meriv, mîr, jîn, keç, law, sebî, semasî, keftar, xezal, gakû-vî, ker, ga, qaz, quling, kew, élo, koremişk, beran, bizin, sak, golik, gur, mar, dûpişk, mirîşk, kêvjehr...

**Navê heyînênu nezindî:** gêlî, hirî, kum, lepik, lekan, kursî, nan, av, sêv, xanî, deş, serbank, zixûr, çiya, newal, xweli, qeysan, kevir, guher, tevr, kuling, birrek, stêrk, milêv, nîr, hîv, berrî, şikêrr...

**Navê hêşînahiyânu:** dar, devî, gul, giya, pîvok, pirpizek, çîçek, nêrgiz, zil, cûl, kerring, qîbal, sosin, binevş, ribêş, nûbihar, pirpar, tûzik, bendik, tolîk, goris, sîrim, rihan...

**Navê abstrak:** raman, qencî, siyaset, xirabî, serketin, bindestî, azadî, hêvî, şêwr, fedakarî, rastî, tirs, xeletî, çavtengî, zanîn, zikreşî, çavtêrî, guman, xeber...

Di zimanê kurdî de du zayend hene: zayenda nêr û zayenda mêt. Lê di zimanê kurdî de zayenda cînavan sisê ne. Di cînavan de zayenda notir jî heye. Em li jêrê behsa vê mijarê jî bikin. Ji ber vê yekê jî di zimanê kurdî de hemû navdêr, xwedan zayend in û di hevokan de li gora zayendê xwe paşpirtik werdigrin.

**Zayenda nêr:** Navê meriv, dewar, pez, lawir, teyr û tilûr û navê tiştên nezindî ku kurdan zayenda wan nêr hesibandine, hemû di nava vê zayendê de ne; lê zayenda navdêran jî, li Kurdistanê, li gora herêman diguhure. Ku li herêmekê Kurdistanê zayenda tiştekî nêr be, dibe ku ew tişt li herêmeke din zayenda wî mêt be. Wek nimûne li hin herêmên Amedê navdêra "aş" zayenda wî mêt ye, lê li piraniya herêmên Kurdistanê zayenda aş/aşê nêr e; li piraniya herêmên Kurdistanê navdêra "piş" zayenda wê mêt ye, lê li herêma Semsûr, Meletiye û di nava kurdên Qonyayê de jî zayenda pişte nêr e... Nimûne, piraniya kurdan dibêjin; "pişta min dêşe", lê li herêma Semsûr, Meletiye û kurdên Qonyayê jî dibêjin, "pişte min dêşe."

**Zayenda mêt:** Navê meriv, dewar, pez, lawir, teyr û tilûr, tiştên ne zindî û hin bêjeyênen abstrak ku kurdan zayenda wan mêt hesibandine, hemû di nava vê zayendê de ne.

Di zimanê kurdî de vejetandeka zayenda navdêren nêr tîpa "ê" ye.

**Nimûne:** Apê/mamê min, xalê te, birayê wî û hespê me...

Di zimanê kurdî de vejetandeka zayenda navdêren mêt jî tîpa "a" ye.

**Nimûne:** Dayîka te, meta wê, dotmama wan, qerwaşa we, kaniya gund, kêra kalan, tifing û mihiña mîr...

Ji ber ku zimanê kurdî pêşveçûna xwe ya xwezayî negihand heta qonaxa zimanê fermî, an jî nebû zimanekî azad, ji ber vê yekê jî pirsgirêkên qayîdeyên zimanê kurdî jî çareser nebûn. Çawan ku feydeya dewletbûnê ji her awayî de ji bo neteweyekê hebe û ji bo ewletiya welat û neteweyê heyîneke bingehî be, herwiha hebûna dewletê ji bo ziman, edebiyat, çand û dîroka neteweyan jî heyîneke bingehî ye; ji bo

pêşveçûna civakî, ji bo pêşveçûna ziman, edebiyat û çanda netewayan jî, ji dewletê girîngtir tu dezgeh tune; ji ber ku di jiyanâ siyâsî, civakî û çandî de dewlet bingehê her tiştî ye!... Ku dewleta kurdan hebûya, an jî zimanê kurdî azad bûna, wê îro ewqas tişt jî li ser qayîdeyên ziman nehatana nivîsandin. Ji ber ku zimanê kurdî demeke dirêj e zimanê axaftinê ye, ji ber vê yekê jî, di ziman de qayîdeyên devokan xwe parastine; ku dewleta kurdan hebûya, wê dîsan jî qayîdeyên devokan xwe di zimanê axaftinê de biparastana. Lê zimanzan û dezgehê ziman wê pirsgirêkên ziman jî, ji zû de çareser bikirana.

Her çiqas navdêr û sernav bêjeyên tewangbar bin jî, lê ev her du bêjeyên axafitinê, ên ku zayendêwan nêr bin, di hemû devokêna zaravayê kurmancî de na-yênen tewandin. Ji birêna sernav û navdêran, ên ku zayenda wan mî be, di hemû devokêna zaravayê kurmancî de tên tewandin. Wek nimûne zayenda hemû na-vênen: keç, jin, bajar, qeza, gund, deşt, newal, derya, gol, av û berriyan mî ye û herwiha di her sê devokêna zaravayê kurmancî de jî tên tewandin; lê sernavêna zayenda wan nêr, di hemû devokan de nayênen tewandin. Mijara me jî li ser van her du bêjeyan e. Em di vê nivîsa xwe de, bi giranî li ser tewanga sernavêna zayenda wan nêr disekinin, lê divê em di nivîsa xwe de hinek li ser tewanga navdêren zayenda wan nêr jî bisekinin; ji ber ku tewanga navdêren zayenda wan nêr jî, bi qasa tewanga sernavêna zayenda wan nêr, di zimanê nivîse de pirsgirêkeke girîng e.

Mercen ku zimanzanêna kurd an jî dezgehêna ziman karibin li ser mijara te-wanga sernavan, di hin zimanêna hînd û ewrûpî de lêkolîn bikin; di zimanêna hînd û ewrûpî de tewanga sernavan destnîşan bikin, tiştik ne hêsa ye. Ji xwe pê-wîstiyekê wiha jî, ne ji bo zimanê kurdî û ne jî, ji bo zimanekî din tune. Ji ber ku ziman di erdenîgariyên cihê de hatine pê; di bin mercen cihê de bi pêş ketine; di pêvajoyen cihê de derbas bûne û xwedîye qayîdeyên gramatîk ên cihê ne. Dema zimanêna hînd û ewrûpî pêncî, şest hezar sal berê ji hev vejetian, ziman ewqas ji hev dûr nebûn. Piştî ku komikên merivan ji hev vejetian, li erdenîgariyên cihê bicî bûn, ziman jî hêdî hêdî ji hev dûr ketin. Ziman panzdeh, bîst hezar sal berê wek îro ewqas dewlemend jî nebûn. Di van panzdeh, bîst hezar salen dawîn de, bi pêşketina civakî re ziman jî bi pêş ketin, dewlemend bûn û kemilîn. Dema meriv bi pirsgirêkên welatê xwe ên siyâsî, aborî û çandî re; an jî bi pirsgirêkên çand û ziman re mijûl dibe, meriv dixwaze pirsgirêkên neteweyen din; ên siyâsî, aborî û çandî hîn bibe û pêvajoyen ku tê de derbas bûne, bizanibe. Lê mixabin ev merc di destê her dezgeh û her kesî de tune; wek ku me li jo-

rê jî gotibû, ji xwe ji bo zimanê kurdî pêwîstiyekê wiha jî tune. Zimanzanênu ku pênc, şes zimanen bizanibin û ferqên di nava zimanênu ku şaxênu yek darê ne, an jî ferqên di nava zimanênu ku komikênu wan cihê ne, bibînin, kêm in. Dibe ku di vî warî de zimanzanênu herî bişans dîsa zimanzanênu kurd bin; ji ber ku her zimanzanekî kurd bi sê, çar zimanênu biyanî dizane.

Di hin weşanênu kurdî de, di nivîsênu hin nivîskar û zimanzanênu kurd de, ji te-wanga navdêrênu zayenda wan nêr bêtir, tewanga sernavênu zayenda wan nêr bala min kişand. Di devokek zaravayê kurmancî de hebûna tewanga sernavênu nêr, nayê maneya ku ev qayîde di zaravayê kurmancî de qayîdeyekî gelempere. Di zimanê kurdî yê nivîsê de helwesta hin zimanzen û nivîskaran, bû sedemê ku ez li ser tewanga sernavênu nêr lêkolîn bikim; hîn bibim ka kîjan herêmên Kurdistanê sernavênu zayenda wan nêr ditewînin. Di devokek zaravayê kurmancî de hebûna tewanga sernavênu nêr, bû sedemê ku ez li ser hin zimanênu hînd û ewrûpî jî lêkolîn bikim; hîn bibim; ka kîjan zimanênu hînd û ewrûpî sernavan ditewînin. Min xwest ez bizanibim; ka tewanga sernavan di zimanênu din de jî hene, an ev tewanga sernavênu nêr tenê di devokek zaravayê kurmancî de tenê heye? Mercen min ên ku ez bikaribim li ser piraniya zimanênu hînd û ewrûpî lêkolîn bikim, bipirsim, heye. Li şuna karê min nizîkî sî û pênc, cil mamosseyen zimanê zikmakî hene. Min bi alîkariya swêdî, mijarê ji mamosseyen zimanê cihê ci-hê re îzeh kir; min ji wan pîrsî, min got; gelo di zimanê we de jî tewanga sernavan heye? an na? Di encama lêkolîna min de diyar bû ku di hin zimanênu slavî de, wek nimûne: di zimanê rûsî, Ukraynî, polonî, sirbî, xirwatî û di zimanê albanî/arnawidî de tewanga sernavan heye. Lî min ji çek, silowaq û bûlxaran kesî peyda nekir, ku ez ji wan jî bipirsim, ka di zimanênu wan de jî tewanga sernavan heye an na?

Bêşik, ji bo ku di hin zimanênu hînd û ewrûpî de, an jî di hin zimanênu din de, tewanga sernavan hebe, nayê wê maneyêku divê em jî tewanga sernavênu zayenda wan nêr di zimanê kurdî yê nivîsê de bikin qayîdeyekî gelempere û rêzimana zaravayê kurmancî li ser van qayîdeyan ava bikin. Wek ku me li jorê jî gotibû; her ziman xwediyê qayîdeyên taybetî ne. Ji ber ku di devokek zaravayê kurmancî de tawanga sernavênu nêr heye, nayê maneya ku bira di hemû zimanênu hînd û ewrûpî yê din de jî tewanga sernavan hebe; an jî, ji bo ku tewanga sernavan di hin zimanênu slavî de heye, bira hemû zimanênu hind û awrûpeyî jî sernavan bitewînin. Ev tiştek ne mantiqî ye û ji xwe daxwazeke kesî yê wiha jî tune. Bi qasa ku ez dizanim, xeyn ji zimanênu slavî û zimanê albanî, tewanga sernavan di zi-

manêñ hînd û ewrûpî yên din de tune; ku hebe jî, nikare tu tesîr li zimanê kurdî û qayîdeyên wî yên gelempêr bike.

Çawa ku me di beşa tewanga navdêrên nêr de jî gotibû; tewanga navdêrên nêr di zaravayê kurmancî de qayîdeyekî gelempêr nîne; qayîdeyekî herêmî ye; herwiha tewanga sernavêñ nêr jî di zaravayê kurmancî de qayîdeyekî gelempêr nîne; qayîdeyekî herêmî ye. Tewanga sernavan jî wek ku hin nivîskar û zimanzanêñ me di nivîs û gramerên xwe de raber dîkin, ewqas berfireh nîne; tenê li herêma Behdînan, hinek jî li Şîrnax û Culemêrgê heye. Lê zimanzanêñ me yên nû, di zimanê kurdî de, ji kefş û îcatan hez dîkin: Wek zimanzanêñ netewêñ din, qîma xwe bi zimanzaniyeke xwerû naynin. Divê zimanzaniya wan ji zimanzaniya neteweyêñ din cihê be. Ku zimanzaniya wan jî wek zimanzaniya neteweyêñ din be, wê demê xêra wê namîne. Ji ber vê yekê jî zimanzanêñ me yên nû, di zimanê kurdî de kefş û îcatan pêk tînin. Wek tewanga navdêrên nêr, tewanga sernavan jî di gramer û nivîsêñ xwe de, wek qayîdeyekî zaravayê kurmancî yê gelempêr rava dîkin û herwiha tewanga sernavan jî li ser piraniya gel ferz dîkin!? Hin nivîskar û zimanzanêñ me, qayîdeyêñ zaravayê kurmancî yê gelempêr dane aliyekî, anîne hin qayîdeyêñ herêmî ku ançax sedî 10ê nifûsa kurdan pê diaxîfin; pêşkêşê gel dîkin û dixwazin gel ji nû ve hînê kurdî bikin!? Ev nivîskar û zimanzanêñ me tewanga navdêr û sernavêñ zayenda wan nêr kirine astengeke mezin danîne pêşıya zimanê kurdî yê nivîsê û standartbûna wî. Ji ber vê helwesta hin nivîskar û zimanzanêñ me, yekîtiya zimanê kurdî yê nivîsê û standartbûna wî dereng dikeve. Tewanga sernav û navdêrên nêr li dervayê welat dibe sedemê ku kurd, di zimanê nivîsê de, wê du, sê qayîdeyêñ gramatîk ên cihê bi kar bînin. Ev jî tê vê manê ku di zimanê nivîsê de, wê tevlîhevî berdewam bike. Ji ber vê yekê jî, divê kurd hê ji bo tewanga navdêr û sernavêñ nêr jî 15, 20 sal hevûdu bibin û bînin!..

Ev qayîdeyêñ ku zimanzanêñ me danîne pêşıya sedî 90ê gel, haya gel ji van qayîdeyan tune. Gel ne rojek van qayîdeyan li ciyekî xwendiyê û ne jî li ciyekî bîhistîye. Ev qayîdeyêñ herêmî ji sedî 90ê gel re xerîb in. Li Kurdistanê xeyn ji herêma Culemêrg, Şîrnax û Cizîrê, kes van qayîdeyan nizane û gel hînê van qayîdeyan kirin jî pir zehmet e. Ne zimanê kurdî azad e û ne jî zarûkêñ kurdan di dibistanêñ xwe de perwerde dibin. >end weşanêñ kurdî û kurdî-tirkî ku li Tirkîyê derdikevin, ew jî kes newêre ji tirsa terora dewleta tirk wan bixwîne. Temamê Kurdistanê Swêd nîne û hemû gelê kurd jî çend ronakbîrêñ ku li Swêd dijîn nînin. Divê meriv hinek realist be: Qayîdeyêñ ku gel nexistiye zimanê xwe

an jî, ji ber zehmetbûna wan, wan ji zimanê xwe derxistibe, meriv rabe wan qayideyan wek ku di zanistê de îcateke nû be, bide ber gel û bi vî awayî di zimanê kurdî de tevlîheviyan çêke, ne karê aqil e!

Her çiqas Celadet Beg ji malbata mîrê Cizîrê bû, haya wî ji tewanga sernavan hebû, li herêma wî navdêr û sernavên nêr, her du jî bi tipa "î" yê dihatin tewandin, lê dîsa jî wî di gramera xwe de behsa tewanga sernavan nekiriye û herwiha wî tewanga sernavan di gramera xwe de nexistiye rojeva zimanê kurdî yê nivîsê û wan li ser piraniya neteweya kurd jî ferz nekiriye.

Celadet Beg zanibû:

Tewanga sernavan di zaravayê kurmancî de, qayideyekî gelempar nîne; qayideyekî herêmî ye; bi qasa sedî dehê nifûsa kurmancan pê diaxifin.

Tewanga sernavan, ziman zehmet dike; di zimanê nivîsê de tevlîhevi çêdike û dibe sebebê probleman.

Qayideyekî herêmî li ser zimanê kurdî yê nivîsê û li ser piraniya gel ferz kirin, tiştekî ne realîst e; di pirazê de mercen pêkanîna wê tune û daxwazeke wiha jî, ji piraniya gel û ji zimanê nivîsê re neheqî ye. Ji ber vê yekê jî, wî di gramera xwe de behsa tiştekî wiha nekiriye, di nivîs û wergerên xwe de jî, sernavan netewan-diye.

Armanca Celadet Beg di zimanê kurdî de pêkanîna hin kefş û îcatan nebûye. Wî xwestiye ji ziman û edebiyata kurdî ya nivîskî re xizmet bike û gelê kurd bi ke xwediyê ziman û edebiyateke nivîskî. Ew û ronakbîrên din ku piştî serhilda-na Şêx Seîd reviyabûn dervayê welat, li dervayê welat, di mercen maciriyê de, ziman û edebiyata kurdî ya nivîskî anîn pê. Wî bi qasa imkanên xwe û li gora mercen wan rojan, ji bo xweşbûn û hêسابûna zimanê kurdî yê nivîsê hewl daye; heta jê hatiye, gramera xwe û kovara Hawarê, ji qayideyên herêmî parastiye. Celadet Beg di kovara Hawarê de zimanê kurdî yê nivîsê zehmet nekiriye; herwiha wî di gramer û kovarên xwe de, qayideyên ziman ên gelempar bi kar anije û zimanê nivîsê li ser qayideyên gelempar daye rûniştandin. Ji xwe armanca zimanzan an jî ev e: qayideyên zimanê axaftinê binivîsin; gramera ziman li ser bin-gehê qayideyên gelempar bidin rûniştandin; tiştên ne hewce ji zimanê nivîsê de-rînin; ziman hêsatir û xweştir bikin.

Zanyar, lêkolîner, filozof, aborîzan û pisporê teknîkê xebatê zanyarî kirine. Di xweza û civatê de gelek îcatê nû kefş kirine. Di zanist û teknîkê de tiştên nû peyda kirine. Dinyayê piçûk kirine; emrê însanan dirêj kirine; kar û barê însanan jî hêsa kirine. Ji dema antîkê û vê de, filozof, zanyar û zimanzan li ser zi-

man xebitîne; qayîdeyên wî yên devkî nivîsandine û ji bo hêسابûna wî hewl da-ne. Tiştên ku di ziman de hewce kiriye, Arîstoteles 2350 sal berê çareser kiriye. Tiştên ku kêm mane, zimanzanan paşê wan temam kirine. Di zanist û teknîkê de kefş û ictatê nû berdewam in. Bi gelempêrî di ziman de jî tiştên ku nehati-bin ronîkirin, nemane. Lê dibe ku di zimanê kurdî de kefş û ictatê nû gengaz (mimkun) bin(!) Zimanzanê me ji dêlva ku di zimanzaniyê de li pey kefş û ictatê nû digeriyan, bira van kefş û ictatan di siyasetê de pêk baniyana: Ji ber ku pêdiviya kurdan bi siyaseteke netewî û çêker heye!.

Piştî ku Mûrad Ciwan, çend sal berê li başûrê Kurdistanê, herêma Behdînan û devoka wan kefş kir; wî bîryar daye ku qayîdeyên devoka Behdînan ji zaravayê kurmancî yê nivîsê re bike bingeh. Şair, nivîskar, zimanzan, edebiyatzan û ronakbîr; nivîs, helbest, kurteçîrok, roman û çîrokên xwe li gora qayîdeyên rîzimana wî binivîsin; dezgehê ragihandin û hînkariyê wek qayîdeyên rîzimana wî bimeşin û weşan bikin; mameste di dibistanan de wek qayîdeyên rîzimana wî ders bidin û 30 milyon kurd jî qayîdeyên vê devokê hîn bibin! Ji ber vê yekê jî, Mûrad 51 sal di pey gramera Celadet Beg de, li Swêd mijara tewanga navdêr û sernavêr nêr xistiye rojeva rîzimana kurdî û rîberiya wê dike!

Tiştên ku hin nivîskar û zimanzanê nû, li Stockholmê, di zaravayê kurmancî de, wek ictateke nû dihesibînin û pêşkêşê kurdan dikin, Celadet û Kamiran Beg 65, 70 sal berê van tiştan nivîsîne: evana tiştên nû nînin. Ku hewce bikira, wê Celadet û Kamiran Beg xwedî li van qayîdeyan derketina û wan biparastana; pirtûk, nivîs, werger, kovar û rojnameyên xwe jî wê li gora van qayîdeyan binivîsandana. Ji ber ku ev qayîdeyên devoka herêma wan bû. Wan bi qayîdeyên devoka herêma xwe baştir dizanibûn. Lê wan nexwestiye di zimanê kurdî de tevlîhevî çêbibe. Wan elfabe û gramerên xwe ji bo gelê herêma xwe amade nekrine; kovar, pirtûk û rojnameyên xwe jî bo gelê herêma xwe dernexistine. Wan qayîdê devoka xwe li ser sedî 90ê kurmancan ferz nekrine. Wan pirsa zimanê kurdî wek pirsa qayîdeyên devokeke herêmî nedîne. Ew di pirsa ziman de, piraniya kurdan û qayîdeyên zaravayê kurmancî yê gelempêr fikirîne. Li her ciyê dinyayê jî qayîde wiha ye.

Di devoka Behdînan, Cizîr û Şîrnaxê de, sernavêr nêr jî di hin halan de, wek navdêrên nêr bi tîpa "î" yê têr tewandin. Li van herêman, tewanga sernavan jî wek tewanga navdêrên nêr, qayîde ye. Li herêma Culemêrg, Şîrnax û Cizîrê tewanga sernavan wek herêma Behdînan pir berfireh nîne. Li Culemêrg, Şîrnax û Cizîrê, gel hêdî hêdî dev ji tewanga navdêr û sernavêr nêr berdide. Lê zimanza-

nên me van qayîdeyêñ ku gel hêdî hêdî dev jê berdide, tînin van qayîdeyan wek savara kevn ji nû ve germ dikin û wan wek savara teze disa datînin ber gel. Li herêma Culemêrgê sernavan bi tîpa "î" yê ditewînin. Di axafinê de, bilêvkirina tîpa "î" yê nayê bîhîstin; divê meriv pir baş guhdarî bike. Di axaftinê de dengek di navbeyna tîpa "î" û tîpa "ê" de, derdixin.

Ez li ser mijara tewanga navdêr û sernavêñ nêr; bi çend nasêñ xwe yên ji herêma Culemêrgê re axifîm; li ser vê mijarê, min çend pirs ji wan pirsî û wan guhdarî kir; di axaftinê de, min di nava dengê tîpa "î" û tîpa "î" de, zehmetî kişand; ji min re dengê tîpa "î" yê wek dengê tîpa "ê" dihat. Ji ber vê yekê jî, min pirsî, min got; gelo : "Hun dibêjin ez nani dixwim, an nanê dixwim, ez derim kari an derim karê?" Min hevokan nivîsand, min got: "Ez bi tîpa 'î' yê an bi tîpa 'ê' binivîsim?" Wan got: "Bi tîpa 'î', nani dixwim, derim kari."

Berya ku em çend nimûne li ser mijara tewanga sernavan raberê xwendevanan bikin; ez dixwazim hinek li ser qayîdeyêñ tewanga wan bisekinim. Me li jorê jî gotibûn ku di zimanê kurdî de qayîdeyekî taybetî heye. Kirarêñ (sûbjektêñ) lêkerên têper (tiransitîf) di dema buhurî de têñ tewandin. Ev qayîde mexsûse zimanê kurdî ye. Ne bawerim ev qayîde di zimanêñ neteweyêñ din de jî hebe? Li gora qayîdeyêñ devoka Behdînan, Culemêrg û Şirnaxê , dema ku di hevokan de sernavan dixin şûna cînavêñ tewandî, wê demê di hevokan de sernavan jî ditewînin. Bingehê tewanga sernavan jî, ji vê derê tê! Di dema buhurî de, cînavêñ lêkerên têper ev in:

min	me
te	we
wî /wê	wan

Em niha ji bo zelalbûna mijarê çend cînavêñ lêkerên têper ên dema buhurî, di çend hevokan de, bi kar bînin û dûre jî, em çend sernavêñ zayenda wan nêr têxin şûna cînavêñ tewandî û di hevokan de li encama wan binêrin.

### Nimûne:

Wî hesp girêda.

Wî nan xwar.

Wan pez anîn.

Em niha jî, ji dêlva cînavêن "wî" û "wan" de, çend sernavan bi kar bînin. Em navê "Felemez, Mûrad, Çiya û Zana" têxin şûna cînavêن "wî", "wan" û di hevokan de li encama wan binêrin. Ji bo ku ev her sê nav jî kirarêن lêkerêن têper, ên dema buhurî ne, ji bo wê yekê jî navê Felemez, Mûrad, Çiya û Zana, di hevokan de ditewin, dibin:

Felemezî/i hesp girêda.

Mûradî nan xwar.

Çiyayî û Zanayî pez anîn.

Li herêma Culemêrg û Şirnaxê jî dibêjin Çiya û Zanayî/i pez anîn.

Herwiha navê Felemez, Mûrad, Çiya û Zana, di halê tewandî de bûne: Felemezî, Mûradî, Çiyayî û Zanayî. Ji ber ku cînavêن "wî û wan" di hevokan de tewandî ne, navê Felemez, Mûrad, Çiya û Zana jî ditewînin.

Di devoka Ruha, Semsûr û Meletyê de, sernavêن zayenda wan nêr jî wek hin navdêrên nêr, tîpa "a" û "e" ya dawîn werdigerînin tîpa "ê". Ev qayîdeyê tewanga sernavêن zayenda wan nêr jî wek qayîdeyê tewanga navdêrên nêr, ne qayîdeyekî gelemepr e; ji bo hemû sernavêن zayenda wan nêr derbas nabe; tenê ji bo çend sernavêن ku di hevokan de xweş li hev têr, ji bo wan sernavan derbas di-be. Li gora qayîdeyê vê devokê jî, Felemez, Mûrad, Çiya û Zana di halê tewandî de dibin:

Felemêz hesp girêda.

Mûrêd nan xwar.

Çiya û Zanê pez anîn.

Dibe ku gel bêje: "Felemêz hesp girêda", lê gel nabêje: "Mûrêd nan xwar, Çiya û Zanê pez anîn", an jî "Zana û Çiyê pez anîn." Gel van her sê sernavêن dawîn di hevokan de natewîne; ji bo ku ev qayîde jî di gramera zaravayê kurmancî de bibe qayîdeyekî gelempar, hin nivîskar û zimanزانê me yên nû van sernavêن dawîn ditewînin!

Wek ku xwendevan jî dibînin, ev devok di navê Felemez, Mûrad û Zana de, tîpa "a" û tîpa "e" ya dawîn, werdigerînin tîpa "ê". A rast, meriv meraq dike; di hevokan de, meriv navê "Felemez, Mûrad û Zana" biguhurîne, wan bike Felemêz, Mûrêd û Zanê, xeyn ji tevlîhevî û zehmetiyan, gelo di nav û sernavên nêr

de guhartina tîpan, ci ıfade dike? Di hevokan de kîjan xeletî û kêmaniyêن gramatîk temam dikin? Me, di hevokan de, bi tîpa "î" yê tewanga sernavan, Felemezî, Mûradî, Çiyayî û Zanayî, fêm kir, lê di navdêr û sernavan de, guhartina tîpa "a" û tîpa "e" yê, gelo ci ye? Ji bo ku Celadet Beg di gramera xwe de gotiye: "Zimanê kurmancî zimanekî tewangbar e" (Hawar, hejmar 32 rûpel 9), li ser vê gotina Celadet Beg, zimanzanên me jî, bi hev re ketine pêşbirkê; çiqas navdêr û sernavêن zayenda wan nêr hene, wan di serî de, di navê de û di dawiyê de dite-wînin, ha ditewînin!... Lê zimanzanên me qet hêsabûn, xweşbûn û standartbûna ziman nafikirin! Kes nabêje gelo em çawan zimanekî nivîsê yê hevbes pêk bînin? Em çawan ziman hinek hêsatir û xweştit bikin?

Di zimanekî standart de du, sê qayîdeyêن tewanga navdêr û sernavan tune. Neteweyêن din di zimanêن xwe de yek qayîdeyek tewangê bi kar tînin. Gelo sebebê ku em di zimanê xwe yê nivîsê de sê qayîdeyêن cihê bi kar tînin, ci ye? Bi gelemerî nav û sernav di dawiyê de têن tewandin; di serî û di navê de tewanga navdêr û sernavan mëxsûsê zimanê me ye!? Ku meriv di zimanê kurdî yê nivîsê de navdêr û sernavêن zayenda wan nêr bitewîne, divê meriv wan di dawiyê de bitewîne; ne di serî û navê de; an jî meriv navdêr û sernavêن zayenda wan nêr natewîne. Xeyn ji zimanê me, kesî du, sê qayîdeyêن cihê di zimanê nivîsê de nedîye!..

Em niha jî wan nimûneyêن li jorê bi devoka ku di hevokan de navdêr û sernavêن zayenda wan nêr natewînin, raberê xwendevanan bikin. Devoka ku sernavan natewîne, ew jî dibêjin:

Felemez hespê girêda.

Mûrad nan xwar.

Çiya û Zana pez anîn.

Em mijara xwe bi çend nimûneyêن din bidomînin:

Ê ku ji wê de tê, birayê wî ye.      Ê ku ji wê de tê, birayê Alanî ye.

Wî ji xwe re kinc kirî.      Azadî ji xwe re kinc kirî.

Kurê wî pir zîrek e.      Kurê Welatî pir zîrek e.

Wî duh mala xwe barkir.      Kendalî duh mala xwe barkir.

Wî mange girêda.      Hesenî mange girêda.

Wî pirtûk xwend.      Şengalî pirtûk xwend.

**Wan** pirtûk anîn.

Bawerî û Serbestî pirtûk anîn.

Ez naxwazim niha, di hêla gramatîk de, li ser van nimûneyên jorîn bisekinim; ji ber ku ez dixwazim pêşî ji qayîdeyên devokan çend nimûne raberê xwendevanan bikim û dûre ji, em ji gramera Mûrad li çend nimûyan binêrin û di hêla qayîdeyên gramatîk de wan binirxînin. Lê ez dixwazim bêjim ku li herêma Culemêrgê, kes nabêje "Ev birayê Alanî ye, ev pismamê Seidî ye, ev xalê Şerîfî ye, ev bavê Hazimî ye." Roja Welati... Gel dibêje "Ev birayê Alan e, ev pismamê Seid e, ev xalê Şerif e, ev bavê Hazim e." Roja Welat... Tewanga sernavan li herêma Culemêrgê pir kêm e. Serçaviya wê herêma Behdînan e.

Em mijara xwe bi qayîdeyê devoka Semsûr, Ruha û Meletiyê bidominin. Em ji vê devokê ji, çend nimûneyên din, raberê xwendevanan bikin.

### **Nimûne:**

Ji Osmên re bêjin, bira here malê; bavê wî li benda wî ye.

Birayê Kemêl duh mala xwe bar kir, çû bajêr.

Min duh li çarşiyê Pişêr dît.

Bavê Firêt, duh jê re cotek pêlav kirî.

Di vê devokê de, sernavênu ku gel wan bi vî awayî bilêv dike, hejmara wan ji neh, deh sernavan derbas nabe. Sernavênu ku tîpa "a" û tîpa "e" di wan de peyda dibin, gelek in. Lê gel di hemû sernavênu ku tîpa "a" û tîpa "e" yê di wan de hebin, tevan naguhurînin. Hinek ji wan sernavênu ku di hevokê de xweş li hev têr, tîpênu wan sernavan diguhurînin. Sernavênu ku di hevokê de xweş li hev neyê, di hevokê de ahengêk çênekin, tîpênu wan sernavan naguhurînin. Nimûne, di sernavênu jêrîn de ji tîpa "a" û tîpa "e" yê hene, lê di navênu jêrîn de, tîpa "a" û "e" yê guhurandin, zehmet e.

**Nimûne:** Wahab, Kazim, Şakir Ehmed, Mihemed, Silêman, Musa, Enwer, Îhsan, Kamûran, Sebrî, Hemîd, Salim, Nasir, Salih...

Em hemû li Kurdistanê di nava gelê xwe de, bi ziman û çanda xwe mezin bûne. Em li gelek bajarêna bakûrê Kudistanê geriyane û ji gelek bajarêna Kurdistanê ji meriv nas dikin. Em niha ji van sernavênu jorîn çend sernavan wergirin û wan di çend

hevokan de bi kar bînin û binêrin, ka gelo kî li Kurdistanê van sernavan wiha bi kar tîne?

### Nimûne:

Xwendina Şêkir tunebû. Wî nizanibû ji zarûkan re pirtûkên çîrokan bixwîne; lê ew ji bav û bavpîrêx xwe, ji der û dora xwe hînê çîrokbehîjîyê bûbû; ji ber vê yekê jî, zarûkên taxa Şêkir êvaran li mala Şêkir dicivîyan; Şêkir heta nîvê şevê ji zarûkan re çîrok digot.

Zivistan bû, meha çile bû, hewa sar bû, esman sayî bû, çokek berf li êrd bû. Hîv û stêrkan temâşeya dînyayê dikirin; bajar raketî bû; polêsên tirk, li ber des-tê sibê, avêtin ser mala Kêzim, Kêzim û mîvanên wî birin! Malbata Kêzim, heval û dostên wî tu xeber jê negirtin; piştî ewqas hewl û salêñ dijwar, zarûkên Kêzim careke din wî nedîtin!..

Mala Wahêb li taxa Elî Paşayê bû. Bavê Wahêb xaniyekî nû li taxa Ofîsê kiri-bû; wê çend roj paşê mala xwe barkirana xaniyê xwe yê nû. Lê hevalên Wahêb nedixwestin ew mala xwe ji wê barkin, bibin taxa Ofîsê!

Gel di tîpêñ van sernavan de tu guherîn çêname. Ji ber ku di hevokan de xweş li hev nayin û bilêvkirina wan jî pir zehmet dibe. Ji bo ku gel di hevokan de tîpêñ çend navdêr û sernavêñ zayenda wan nêr, ên ku di hevokan de xweş li hev têñ, diguhurîne, meriv nikare viya di zimanê nivîsê de wek qayîdeyekî gelempêr li ser zimanê kurdî yê nivîsê ferz bike û herwiha ziman zehmettir bike! Di zimanê kurdî de, sernavêñ zayenda wan nêr, ji çend sernavêñ ku di hevokan de xweş li hev têñ, pêk nayin; di zimanê kurdî de bi seda sernavêñ zayenda wan nêr he-ne! Ji bo ku em nikaribin di hevokan de tîpêñ hin sernavan biguhurînin, em rabîn van sernavan ji zimanê xwe derxin? Dema zimanzanêñ me di gramerêñ xwe de nimûne raber dikin, çend sernavêñ ku di hevokan de xweş li hev têñ û bilêvkirina wan hêsa ne, her tim wan sernavan hildibjêrin û di nimûneyêñ xwe de raber dikin. Ji bo hin zimanzanêñ me qet ne girîng e, ku tewanga sernavan di nava gel de helwesteke gelempêr e, an jî, ji nifûsa kurdan hejmareke hindik sernavan ditewîne! Piştî ku sedî 80-90 kurdan sernavêñ zayenda wan nêr netewînin, meriv çira vî qayîdeyî li ser neteweya kurd û zimanê nivîsê ferz bike?.. Lê, wek ku me li jorê jî gotibûn; hin nivîskar û zimanzanêñ me yên nû guh nadîn qayîdeyêñ zimanê kurdî yê gelempêr û piraniya neteweya kurd; ji bo ku tewanga sernav û navdêrêñ zayenda wan nêr di zimanê kurdî yê nivîsê de bibe qayîdeyekî gelempêr, çiqas sernav û navdêrêñ zayenda wan nêr bi destê wan dikevin,

wan ditewînin an jî tîpêن wan diguhurînin.

Gelek sernavêن kurdî yên nû hene, ne gengaz e ku meriv bikaribe di wan de, tîpa "a" û tîpa "e" yê wergerîne tîpa "ê". Lê ku meriv bixwaze ziman bike pêkenîn, meriv dikare her tişt bike!

**Nimûne:** Zana, Şiyar, Rojhat, Alan, Şengal, Sîpan, Siyabend, Baran, Xebat, Kendal, Xelat, Kava, Azad, Rizgar, Evîndar, Bawer, Sîpan, Egît, Heval...

### Gelo, ji dêlva ku meriv bêje:

Zana ji hevalê xwe re got; "îro neçe malê!"

Eğit ji gel re got; "dijminên xwe baş nas bikin!.."

Kawa ji Şiyar pirsî, got; "te van tifingan ji ku ankiye?"

Polêsên tirk di işkenceyê de destê Rojhat şikandibûn.

### Meriv bêje:

Zanê ji hevalê xwe re got; "îro neçe malê!"

Eğit ji gel re got; "dijminên xwe baş nas bikin!.."

Kavê ji Şiyêr pirsî, got; "te van tifingan ji ku ankiye?"

Polêsên tirk di işkenceyê de destê Rojhêt şikandibûn.

Gelo, meriv rabe di zimanê nivîsê de tîpêن navdêr û sernavêن nêr biguhurîne, meriv zimanê nivîsê xira nake?! Lê wisa xuya ye ku ji zimanekî xweş, ji zimanekî hevdem û ji zimanekî standart bêtir, devoka gundê her kesî li ber dilê wî şîrîn û ezîz e! Gotineke bav û bapîran heye, dibêjin: jûjî destê xwe di diriyêن pişta çêlika xwe de dide, dibêje: "Maşalla, maşalla pûrta te çiqas nerm e, çiqas nerm e; bê nezer be, wek penbû ye!" Ev jî qisa hin zimanzan û nivîskarêن me ne, ku bi devoka gundê xwe mane heyîr!.. Hin zimanzan û nivîskarêن me jî, kefş û îcatêن xwe, ji zimanekî xweş û hevdem girîngitir dibînin û herwiha jî di gramera zimanê kurdî de, tê li pêsiya tevlîheviyan vedikin!.. Çawan be di gramera zimanê kurdî de deriyê tevlîheviyan vebûye, ci tê hişê kê dibêje!.. Wek ku me li jorê jî gotibû, em di hêla grama-tîk de li ser tewanga navdêr û sernavan disekinin û wan dinirxînin...

Gelek navdêrên zayenda wan nêr hene, ku tîpa "a" û "e" yê di wan de tune; lê hin nivîskar û zimanzanêن me yên nû bixwazin, dikarin tîpa "s" û tîpa "t" yê jî wergerînin tîpa "ê"!.. Em dîsa gotineke bav û bapîran bi bîr bînin: Dibêjin jînêkê ji kurê xwe re gotiye: "Kurê min, di dinyayê de bereketa her tiştî di destê

Xwedê de ye! Lê bereketa dew di destê dayîka te de ye! Ez çiqas avê têxim dew, wê dew ewqas zêde bibe!" Ev ji qisa hin nivîskar û "zimananê" me yên nû ne!.. Ew jî di gramera zimanê kurdî de çiqas tîpêن navdêr û sernavêن zayenda wan nêr biguhurînin, zimanê kurdî jî wê ewqas xweştir û hêsatir bibe!... Divê em hinek jî bala xwe bidin zimanêن cîranêن xwe û zimanêneteweyêن din; kî aniye zimanê xwe wiha, wek zimanê me zehmettir kiriye?!

Milet sal bi sal zimanê xwe hêsa dike; qayîdeyêن zehmet jê derdixe, zimanê xwe xweştir û hêsatir dike. Zimananê me, zimanê ku gel wî di pêvajoya dîrokê de, di nava berhem û pêwendiyêن civakî de çekiriye; bi hezar salan di nava pêwendiyêن civakî de wî bi kar aniye; wî xweştir û hêsatir kiriye, naecibînin; tînin hin qayîdeyêن kevn ku ji gel re xerîb in, wan datînin pêşıya gel û dixwazin van qayîdeyan, bi zorê, bi wî bidin pejirandin; herwiha jî zimanê kurdî zehmettir dîkin; pêşî li pêşveçûn û xwe nûkirina wî jî digirin. Zimananê me, niha zehmetiyêن ku derxistîne pêşıya zimanê kurdî yê nivîsê, meriv nikare nimûneyen wiha ecêb, di zimanêneteweyêن din de bibîne. Dema meriv dibêje, hêsa-kirina ziman û estetîkiya wî girîng e, meriv nabêje bira zimanekî bê qayîde, bê qural, zimanekî basît, bê çekirin. Armanca tu kesî jî tiştekî wiha nîne. Pirs, pirsa zimanê kurdî yê nivîsê, pirsa qayîdeyêن wî yêne gelempêr û pirsa piraniya gelê kurd e! Tiştên ku di ziman de tunebin, divê em lê zêde nekin û di zimanê kurdî de qayîdeyekî herêmî li ser zimanê nivîsê yê hevbeş ferz nekin; pirs ev e!

Lê wisa xuya ye ku qayîdeyêن ziman ên gelempêr, hêسابûna ziman û piraniya neteweyê ji bo hin zimanzan û nivîskarêne me yên nû, ne girîng in. Ew dixwazin, di zimanê kurdî de, bi kefş û ıcatan xwe tetmîn bikin. Zimananê me dixwazin wek kefş û ıcatkiroxêneteweyê din navêن xwe li rûpelên dîrokê binivîsin. Ji bo viya jî, sedî 90ê neteweyê xistine bin zixtê û qayîdeyekî herêmî li ser wan ferz dîkin! Sedî 90ê kurmancan nizanin Ehmedî, Mihemedî, Hesenî û Huseynî ci ne! Sedî 90ê netewê nizane navdêr û sernavêن nêr bitewîne. Bi ci aqîlî û bi ci maflî meriv dikare van qayîdeyên herêmî li ser sedî 90ê netewê ferz bike?! Qayîdeyêن ziman ên gelempêr û piraniya neteweyê girîng in an jî kefş û ıcatêne hin nivîskar û zimanzan?

Neteweyê din, tevlîheviyêن ku di zimanêne wan de hebin, bi rîya dezgehêne xwe yên çandî û bi alîkariya zimanzanêne xwe, bi lêkolîn û bi xebatêne xwe yên hevbeş wan çareser dîkin. Zimananê neteweyê din, bi xebatêne xwe yên zanistî, ji xwe re zimanekî nivîsê yên hevdem pêk tînin. Zimananê me jî tam bêrevejiyê neteweyê din dîkin. Tevlîheviyêن ku di ziman de tunin, ew bi xwe di

ziman de pêk tînin û navê wiya jî dibe zimanzanî(!) Xwedê zimanên bêxwedi ji xebatê zimanzanênu ku dixwazin di zimanan de, li pey kefş û îcatan bigerin, bi-parêzel..

Em mijara xwe bi qayîdeyên devoka ku di hevokan de sernavênu zayenda wan nêr natewîne bidomînin. Di devoka: Amed, Batman, Mêrdîn, Sêrt, Bedlîs, Wan, Mûş û Erzeromê de, sernavênu nêr jî, wek navdêrên nêr di hevokê de ne tênu tewandin û ne jî di tîpa "a" û tîpa "e" yê de guhertin çedikin. Tu dixwazî sernav di hevokê de bira kirar be, an jî bireser be, tê de tu guherîn çenabê; ew di hevokê de her tim wek eslê xwe dimînin. Di vê devokê de, ew qayîdeyê zimanê kurdî yê taybetî ji bo sernav û navdêrên zayenda wan nêr derbas nabe. Ev devok, vî qayîdeyî tenê di cînav û sernavênu zayenda wan mî bin de, tîne şûnê. Bi gotineke din, ev devok dema navdêrên zayenda wan nêr, di dema buhurî de, dîkin şûna kirarênu lêkerên têper, sernavan natewînin; sernav di hevokan de wek eslê xwe bê tewang dimînin.

Em niha li gora qayîdeyên vê devokê, çend hevokan bi cînavênu lêkerên têper, ên dema buhurî, raberê xwendevanan bikin. Em li kîleka hevokênu ku bi cînavênu tewandî hatine rêzkirin, nimûneyên ku sernav ketine şûna cînavênu tewandî jî raber bikin û li encama wan binêrin.

### Nîmûne:

Wî sibê zû xurînî kir, çû kar.  
Wan duh pirtûk anîn.  
Ev pirtûkênu wî ne.  
Ev xwuşka wî ya piçûk e.

Bawer sibê zû xurînî kir, çû kar.  
Zinar û Şiyar duh pirtûk anîn.  
Ev pirtûkênu Kendal in.  
Ev xwuşka Azad a piçûk e.

Niha meriv li vir ji zimanzanênu ku sernavênu zayenda wan nêr ditewînin, dipirse: ji bo ku gel di dema buhurî de cînavênu lêkerên têper ditewîne, ci hewce dike, dema meriv sernavan dixe şûna cînavênu tewandî, meriv sernavan jî bitewîne? Dema meriv sernavan dixe şûna cînavênu tewandî, ku meriv sernavan netewîne, gelo di hevokan de kîjan kêmâniyên gramatîk derdikevin holê? Em du, sê nimûneyên jorîn wek nimûne werbigrin û di hevokan de sernavan bitewînin û binêrin, ka tewanga sernavan, di hevokan de kîjan kêmâniyên gramatîk temam dike?!

### **Nimûne:**

Bawerî/Bawêr sibê zû xurînî kir, çû karî/kêt.

Ev pirtûkên Kendalî ne.

Ev xwuşka Azadî a piçûk e.

Di hevoka yekê de tu sedemê ku meriv navê "Bawer" bitewîne, bîke "Bawerî" tûne. Di hevoka didoyan de veqetandeka "êñ" ku bi pirtûkan ve bûye, wan kiriye "pirtûkên", di zimanê kurdî de halê genetîf dinimîne; di vê nimûneyê de tu fonksyona tîpa "î" ya ku navê "Kendal" kiriye "Kendalî" tune. Nimûneya sisêyan jî halê genetîf e; veqetandeka "a" ku bi navê "xwuşk" ve bûye, wê kiriye "xwuşka", di zimanê kurdî de halê genetîf nîşan dide. Di nimûneya dawîn de veqetandeka "a" di hevokê de destnîşan dike ku ev xwuşk a Azad e, ne xwuşka yekê din e. Di vê nimûneyê de jî tu fonksyona tîpa "î" ya ku bi navê "Azad" ve bûye, wî kiriye "Azadî" tûne... Emê li jêrê bi awayekî fireh li ser vê mijarê bisekinin û nimûneyan di hêla gramatîk de binirxînin. Em niha mijara xwe, ji qayîdeyên devoka Amedê, bi çend nimûneyên din bidomînin.

### **Nimûne:**

Bawer ji xaniyê Siyabend derket.

Welat vê sibê li ber tirênen Zinar dît.

Xebat ji Azad re got; "ev roman pir xweş e; tu jî bixwîne!"

Em roja şemiyê çûbûn mala Firat...

Zimanzanê me di civateke pêşketî de dijîn. Heryekî du, sê zimanê biyanî dizanîn. Haya wan ji ziman, edebiyat û çanda neteweyê din heye. Kijan neteweyen Ewrûpayê anîne zimanê xwe wiha zehmet kirine?! Em tev dibînin, milet ji bo hêsbûna zimanê xwe çawan hewl dide; çawan zimanê xwe xweştir û hêsatir dike; çawa zimanê xwe dikin zimanekî hevdem. Hin zimanzanê me bi diyalektîkê jî dizanîn, ji bo pêşveçûna civakî li welat û li dervayê welat rêberî jî kirine; an diyalektîk û pêşveçûna civakî ji bo ziman, çand û civata me derbas nabe?! Ziman, çand û civata neteweyen din, çiqas derin ber bi pêş ve derin, divê ên me jî tam berevejiyê miletê be; divê ziman û çanda me jî ber bi paş de herin! Zimanê me yê axaftinê heft sed, heş sed sal berê çawa bûye, divê iro jî wisa be, divê tu tişt tê de neyê guhertin.

Wek ku me di destpêkê de jî gotibû, pêşketin û hêسابûna ziman girêdayê pêşketina civakî ye. Di dîroka civatan de, ziman di bajarên ku navenda çand û sinî et bûne de, bi pêş ketine; xwe nû kirine û dewlemendir bûne. Ziman di gund û qezayêن asê de, ku ne rêyek û ne dirbek bi wan dikeve, ji şaristaniyê dûr, ku rojek ji rojêن Xwedê, teyrek jî bi xeletî di ser wan de derbas nebûye de, bi pêş nakeve. Ew di van herêman de qels dimîne; mecalâ pêşketin û dewlemedbûnê nabîne. Çawan ku ev ji bo hemû zimanan derbas dibe, herwiha ev ji bo zimanê kurdî jî derbas dibe. Zimanê kurdî jî, ji dema kevn û vê de, li bajarên ku navenda çand û sinet bû ne de, xwe bi pêş xistiye, xwe nû û hêsatir kiriye. Li hin he-rêmên Kurdistanê, hin qayîdeyên cihê hene; lê nayê vê maneyê ku ev qayîde bingehêن zimanê kurdî yê kevn in, divê meriv van qayîdeyan bike bingehê zimanê nivîsê.

Ziman jî hebûneke civakî ye. Dîroka wî jî bi qasa dîroka însan kevn e. Bi pêş-veçûna civatê re, ew jî bi pêş dikeve, xwe nû dike. Dîroka zimanê kurdî yê axaf-tinê ne diyar e, ku meriv bizanibe di van du, sê hezar salên dawîn de, guherînên çawan di deng û qayîdeyên wî de çêbûne. Dîroka zimanê nivîsê çar, pênc hezar sal kevn e. Însan çar, pênc hezar sal berê mîxnivîsê peyda kiriye. Bûyer, destan, qanûn, peyman, name û tiştên din, bi mîxnivîsê nivîsîne. Lê mixabin ji wan deman pir hindik tişt gîhane heta dema îro. Mîxnivîsên ku xwe ji bahoz û bagerên dewletên dagirker parastine û xwe gihadine heta dema îro, ew jî dîroka ziman a dûr û dirêj û pêvajoyêن ku tê de derbas bûye, baş ronî nakin.

Di dema kevn û dema pêşin de, kaxiz tunebû. Misriyan tenê ji kokêن papîrû-sê tewirek (cûreyek) kaxiz çêdikirin; nivîsên xwe li ser wî dinivîsandin. Sumerî, mîtanî, hîttitî û asûriyan, nivîsên xwe li ser teht û kiremîten tenik dinivîsandin. Di demên pey wan de jî; faris, yewnan, ereb û kurdan, nivîsên xwe li ser postên pez dinivîsandin. Dema ku hîttitî û asûriyan êrîşê dewleta Mîtanî dikirin û di şer de bi ser diketin, bi dewlemendiyêن wan re, kitêbxaneyêن wan jî talan diki-rin, an jî dişkandin, dişewitandin! Dema ku farisan jî dewleta medan xira kirin û dest danîn ser welatê wan, wan jî eynî tişt anîn serê medan; bi dewlemen-diyyêن wan re, çand, edebiyat û zimanê wan jî talan kirin!

### Li Kurdistanê:

- 1- Tunebûna dewleta kurd û ne azadbûna zimanê kurdî;
- 2- Şerên dagirkeran ji bo dagirkirina Kurdistanê û wêranbûna bajaran;
- 3- Di dema dewleta Merwaniyan de ne fermîbûna zimanê kurdî û di dema mîrekiyêن kurd de jî tunebûna sinetê çapê û tunebûna kaxiz, nehîstine ziman û

edebiyata kurdî bibin xwediyyê dîrokeke nivîskî ku zimanzan bikaribin li ser wî lêkolîn bikin; guherînên ku di pêvajoya dîrokê de, di deng û qayîdeyên wî de çêbûne, derxin holê. Ji ber tunebûna dîroka zimanê kurdî yê nivîsê, guherînên ku di van hezar, du hezar salêن dawîn de, di deng û qayîdeyên wî de çêbûne, nayê zanîn.

Ji dema damezirandina dewleta medan heta xirabûna wê, ji dema xirabûna dewleta medan heta dema îstîlayêن ereban, edebiyateke kurdan a nivîskî ya dewlemend hebû. Li her bajarêن Kurdistanê, kurdan ji bo dînê xwe (dînê zer-dûş) îbadetgeh ava kirine. Di van îbadetgehan de bi sedan zanyarêن dînê zerdûş hebûn; li ber destêن wan bi sedan şagirt dihatin perwerdekirin. Zanyarêن dînî bi sedan beyt, qesîde û tiştêن din nivîsîne. Bi saya alimên dînî, di vê demê de edebiyateke nivîskî ya dewlemend hatiye pê. Lê, şerên ku ji çar hezar salan û vê de li ser axa Kurdistanê çêbûne, tu mecal nedane gelê kurd ku bikaribe ziman, çand û edebiyata xwe ya nivîskî li dij êrîşen dijmin biparêze. Wek nimûne; dema ku Îskenderê Makedonî, bi artêsa xwe ya birêkûpêk, êrîşê Kurdistanê kir, ji wê jî derbasê Iran û Hindstanê bû; van welatan xira kir û şewitand. Pirtûkêن dînî, **Avesta**, ku li ser postêن pez hatibûn nivîsandin, hatin şewitandin û tiştên din jî hatin talankirin. Di vê demê de yewnaniyêن dagirkêr dewlemendiyêن herêmê dizîn, wan kişandin Yewnanistanê; bi çanda herêmê ya dewlemend, çanda yewnanî dewlemend kirin!..

Di dema îstîlayêن dewleta Bîzansê de jî gelek îbadetgehêن kurdan, bûn dêr; herwiha pirtûkêن kurdan ên dînî û edebiyata wana nivîskî hatin talankirin. Wek nimûne, li Mêrdînê, **Dêra Zehfiranê** yek ji îbadetgehêن dînê kurdan e. Îbadetgeha Zehfiranê di dema dewleta medan de hatiye avakirin, lê niha di des-tê suryaniyan de ye û wek dêra mesîhiyan tê zanîn. Di dema îstîlayêن ereban de jî, îbadetgehêن kurdan hatin xirakirin, an jî bûn camî. Pirtûkên kurdan ên dînî hatin şewitandin, edebiyata wana nivîskî jî hatin talankirin. Herwiha nivîsîn ku ji dema mîtanî û medan mabin û di vê pêvajoyê de, ji hêla deng û qayîdeyan de, guherînên ku di zimanê kurdî de çêbûne, nîşan bidin tunin. Lê wisa xuya ye, devoka ku navdêr û sernavêن zayenda wan nêr natewîne, di bajaran de, bi pêşketina civakî re, xwe hê bêtir nû kiriye û qayîdeyên ziman hêsatir kiriye. Estetîkiya ziman ji bi qasa qayîdeyên wî yên gelempar girîng e. Ji xwe di bingehê xwe nûkirin û hêsakirina ziman de, armanca xweşbûna ziman heye.

Em mijara xwe ya li ser tewanga sernavêن nêr, bi çend nimûneyêن din, bido-mînin. Ji bo zelalbûn û baş têgîhîştina mijarê; ji bo hêsayî û zehmetiyêن qayîde-

yên devokan, em çend nimûneyên din jî raberê xwendevanan bikin; paşê xwendevan dikarin li ser mijara tewanga navdêr û sernavêner nêr bigihin qenetekê. Li gora qayîdeyên devoka Behdînan, di dema niha û di deme ku wê bê de, di hevokan de, bireseran ditewînin; di dema buhurî de jî, kirarêne lêkerêne têper ditewînin. Xeyn ji van her du qayîdeyan, di hemû deman de, navdêr û sernavêner ku di hevokan de, di pey daçekan (bi, di, ji, li...) de cî bigrin, hemûyan ditewînin. Devoka ku navdêr û sernavêner natewînin, ew jî navdêr û sernavêner ku zayenda wan mî bin û di pey daçekan de cî bigrin, wan ditewînin. Em niha li ser vê mijarê, li çend nimûneyên din binêrin.

### Nimûne:

#### Dema niha û dema wê bê      Dema buhirî

Serbest, wê sibê beranî bîne.	Serbestî îro beran anî.
Baran, lawikî dibe dibistanê.	Baranî, lawik bir dibistanê.
Şivan pezî avdide.	Şivanî pez avda.
Gavan wê gayî bixe axurê.	Gavanî ga xist axurê.
Rizgar darî dişkêne.	Rizgarî dar şikand.
Bawer çûye Xebatî birêke.	Bawerî, vê sibê Xebat birêkir.

Hevalî ji Şiyarî re got: "Ji gotinêne Zanayî bawer nekin! Ew di bin erdî de be jî, divê hûn îşev wî bibînin! Divê hûn îşev li ber deriyî nobet bigirin. Ew çawan ji deriyî/hundurî derket der, wî bigirin, bavêjin erdî; li erdî dest û devê wî girêdin; wî li hespî siwar kin û berê wî bi pêşmergeyî/pêşmergeyan re bidin ciyayî!"

Wek ku di hevokan de jî dixwiye, navêner ku di hevokan de hatine tewandin, tev bireser in; di halê akûzatif de ne. Léker jî, lêkerêne têper in; ji ber vê yekê jî, bireser wergirtine. Sernavêner tewandî jî, kirarêne lêkerêne têper in; ji ber vê yekê, di dema buhurî de hatine tewandin; ew jî ketine şûna cînavêner tewandî. Çawa ku hemû ziman û zarava xwediyê qayîdeyên taybetî ne, herwiha di zaravayê kurmancî de jî ev devok, qayîdeyên wî yên taybetî hene, ku ji her du devokêne kurmancî yên din cihê ne; qayîdeyên wê li her du devokêne nayin.

Zehmetiyên qayîdeyên vê devokê li holê ne; jêre şirûvekirin ne hewce ye. Dibistanêne me tunin; di pirazê de fêrbûna qayîdeyên vê devokê ne gengaz e. Ni-

vîskar û ronakbîrênu ku ne ji vê herêmê bin, ew jî nikarin wek qayîdeyên vê devokê biaxifin û binivîsin. Divê an meriv here qursê, qayîdeyên vê devokê hîn bibe, an divê meriv here çend sal li herêma Behdînan bimîne, an jî divê meriv gramera Mûrad, wek pirtûka Mao ya sor, tim bi xwe re biggerîne! Tewanga navdêr û sernavan ku li herêmekê Kurdistanê hebe, meriv van qayîdeyên giran çira deyne pêşıya temamê kurmancan û zimanê kurdî yê nivîsê, yê hevbes? Em ferz bikin ku hezar du hezar sal berê; temamê kurdan navdêr û sernavênen nêr bi tîpa "î" yê tewandibin, lê ji ber hin sedeman, sedem ci dibe bira bibe, dev ji tewanga wan berdabin? Qayîdeyên ku gel dev jê berdabe, wan ji zimanê xwe derxistibe, meriv rabe wan qayîdeyan li ser navê zanistê, bîne dîsa dayne pêşıya wî, gelo ev tiştekî mantiqî ye?

Tewanga navdêr û sernavênen nêr bi tîpa "î" yê tenê bihatana tewandin, ew jî hêsa bû; dibe ku kurd bikaribin van qayîdeyan bi rêya şoreşike çandî hîn bibin(!) Lê, Mûrad di grama xwe de, du qayîdeyên tewangê yên cihê, bi hev re, daniye pêşıya gel û herwiha zimanê kurdî yê nivîsê du caran zehmettir kiriye. Li gora qayîdeyên gramera Mûrad, divê meriv navdêr û sernavênen nêr bi tîpa "î" yê bitewîne, an jî tîpa "a" û "e" yê wergerîne tîpa "ê" û herwiha, meriv dikare di zimanê nivîsê de du qayîdeyên gramatîk ên cihê bi kar bîne?! Di gramerên zimanê neteweyê din de du, sê qayîdeyên cihê tunin; miletê ji bo zimanê xwe yê nivîsê yek qayîdeyek daniye. Mûrad li ser gramera zaravayê kurmancî (bi izehetta tirkî) xebateke baş kiriye; gramereke kurdî ya bi izehetta tirkî ya baş amade kiriye; lê Mûrad gramera xwe li ser qayîdeyên zaravayê kurmancî yên gelempet daneniye; wî gramera xwe li ser qayîdeyên devokeke herêmî daniye û herwiha gramera xwe dirûbê diyalektîka Hegel pê xistiye; wê ne li ser lingan, li ser serî daniye.

Meriv navdêr û sernavênen nêr wek ku Mûrad di gramera xwe de, bi du awayêن cihê tewandiye, li ser gel ferz bike, navdêr û sernavênen ku me li jorê di hevokan de bi kar anîbû, divê wiha bênen tewandin:

### Sernavênen tewandî

- Kawayî/Kavê
- Baranî/Barêñ
- Rizgarî/Rizgêr
- Bawerî/Bawêr

### Navdêren tewandî

- beranî/berêñ
- lawikî/lêwik
- şivanî/şivêñ
- pezî/pêz

Xebatî/Xebêt

gavanî/gavê

darî/dêr

Zimanzanên me di gramer, pirtûk û kovaran de wiha bi du awayên cihê navdêr û sernavêr nêr bitewînin, zimanê kurdî hê dibe ziman; wê gavê ziman xwes dibe, hê-sa dibe û dibe zimanê ziman, mîrê ziman!...

Em niha jî hevokên ku me li jorê raberê xwendevanan kiribû, vê carê jî wan hevokan bi qayîdeyên devoka ku navdêr û sernavêr nêr natewînin û di tîpêr wan de jî tu guherîn çenakin, raberê xwendevanan bikin.

### Nimûne:

Kawa, wê sibê beran bîne.

Baran lawik dibe dibistanê.

Gavan wê ga bixe axurê.

Rizgar dar dişkêne.

Bawer çûye Xebat birêke.

Kawa îro beran anî.

Baran lawik bir dibistanê.

Gavan ga xist axurê.

Rizgar dar şikand.

Bawer, vê sibê çû Xebat birêkir.

Tewanga navdêr û sernavêr zayenda wan nêr zimanê kurdî zehmettir dike; herwi-ha problemên mezin derdixe pêşîya zimanê nivîsê yê hevbeş û pêşî li standartbûna wî digire. Bi vî awayî tevlîheviyêr ku di zimanê nivîsê de hene, wan hê zêdetir dike; hînbûn û nivîsandina wî zehmet dike; rewanî û esterîkiya wî jî xira dike; herwi-ha, li dervayê welat, gel û ciwanêr kurd ji zimanê kurdî yê nivîsê dûr dixe û zimanê kurdî yê nivîsê li dervayê welat di nava çend ronakbîran de hefs dike! Ev jî, ji bo zimanekî qedexe, wek zimanê kurdî, xeterekî mezin e. Ji xwe piraniya "serok", "pêşeng", "ronakbîr" û gel, zimanê xwe piçûk dibînin, bi zimanê xwe napeyîvin. Neteweyek, ji serok û pêşengên wî bigre heta gel, ku bi zimanê xwe yê netewî neaxifin, tê wê maneyê ku ew gel bi riza dilê xwe, dixwaze hebûna wî ya netewî ji holê rabe! Di bin van mercen giran de, ji hemû neteweyan bêtir, pêdiviya kurdan bi hînbûn û axaftina zimanê wan heye! Pişti ku rewşa zimanê kurdî û gel wiha be, zimanzanên me jî rabin hin qayîdeyên herêmî ku sedî 90ê neteweyê pê nizanin, day-nin pêşîya neteweyê, gelo wê rewşa zimanê kurdî di bin van mercen giran de hê jî zehmettir neke?..

Li gora qeneta min, tu sebebê ku em rabin zimanê xwe wiha zehmettir bikin, gel û ciwanêr xwe ji zimanê xwe yê nivîsê dûr bixin, tune. Ên ku di dû me re,

hebûna me ya netewî û zimanê me bidomînin, zarûk û ciwanêne me ne. Hin "serokên" me, li dervayê welat gel û ciwanêne me ji siyasetê dûr xistin, qet nebe bira "zimanzanê" me jî, wan ji zimanê bav û kalêwan dûr nexin! Em li ser vê mijarê, hinek jî bala xwe bidin zimanêne welatêne ku Kurdistanê dagir kirine û zimanêne welatêne ku em niha lê dijîn; gelo wan çi kirine? çi dikin? Wan jî aniye zimanê xwe wiha wek zimanê me zehmettir kirine, an jî hêsatir dikin? Sebebê ku em radibin zimanê xwe wiha zehmettir dikin, gelo çi ye? Dewleta me heye, zimanê me azad e, zarûkêne me di dibistanêne xwe de dixweyinin ku em tînin van qayîdeyêne herêmî datînin pêşîya neteweya kurd? Ma ku dewleta meriv jî hebe meriv zimanê xwe wiha zehmet nake û qeyîdeyêne herêmî li ser neteweyê ferz nake. Ev qayîdeyêne ku zimanzanêne me li ser neteweya kurd ferz kirine, qayîdeyêne zaravayê kurmancî yên gelempere bûna, sedî 80, 90ê neteweyê pê biaxfiyana, disan tişt nedibû!..

*Dom dike*

**Nota Nûdemê:** Ev nivîsa Zekî Bozarslan ku li ser tewangê ye, bêguman nêrîna wî bi xwe ye. Lê ji minaçeşeyê re vekirî ye. Di vê nivîse de li gora me hin şâşî hebûn, lê li ser daxwaza birêz Bozarslan me ew mîna orjînalala nivîse hiştin. Çend nimûne ji şâşiyêne ku me xwest em rast bikin, lê nivîskarê gotarê ji me tika kir ku em mîna orjînalê bihêlin ev bûn: "van navana", li gora me rastiya wê "ev nav", "sernavan netewandiye", li gora me "sernav netewandine", "Dinyayê piçûk kirine", li gora me "Dinya piçûk kirine", "van tiştan nivîsîne", li gora me "ev tişt nivîsîne", "min hevokan nivîsand", li gora me "min hevok nivîsand" û gelek nimûneyêne bi vî babetî.

# Fala Nûrikê

**FIRAT CEWERİ**

**S**evreşeke nîvê payizê bû. Şax û pelên darêñ sêvan yên li hewşê ji ber bayê sivik dikirin xuşînî. Bi dengê girîna ewr re Gulê bi qîrîn ji xewê şiyar bû. Ew di xwêdanê de mabû. Wê di xewnê de gelekî giriyabe, loma hîna jî îskîna wê daneketibû. Bi dengê qîrîna wê re mêtê wê jî ji nava nivînan pekiya û tavilê lampeya li ber serê xwe pêxist.

– Çawa bû, ma qolincêñ te têñ? mêtê wê bi çavlixewî jê pirsî û ji bo ku wê aş bi-ke destê xwe avêt ser stûyê wê.

Gulê jî xwe avêt hemêza wî û bi dengekî bilind û bi îskînî giriya.

– Ci bûye, cana min? mêtîk bi tirs û kelecan jê pirsî. Ji bo ci tu digirî?

Jinikê tu bersiv neda, giriyê xwe bê rawestan domand; piştî ku demekê bi wî awayî giriya, paşê gava xwest tiştekî ji mêtê xwe re bibêje, ji ber îskîna pir kir û ne-kir nikarîbû gotina xwe bibira serî. Lê mêtê wê yê bîrbir, hêdîka destêñ wê ji nava xwe berdan, rabû ser xwe û çû ji mitfaxê jê re qedehhek av û hinek kaxiz anî. Wî qedeha avê dirêjî jina xwe kir û dûv re li ser qeryole, li kêleka wê rûnişt. Piştî ku jini-kê çend gulp ji qedehê vexwarin û qedeh danî ser maseka piçûk ya li ber serê xwe, mêtîk bi tilikîn xwe porê wê yê ku ji xwêdanê bi eniya wê ve zeliqîbû, da alî û ji bo aşkirin û teseliyê hêdîka eniya wê maçî kir. Jinikê xwe di wê kêliyê de êmin hîs kir, ji ber hezkirin û pêdaketina mêtê xwe hindik be jî hem ew xewna ku di xewê de mîna jiyanekê dûdirêj, ya bi êş û ezab, hem jî ew kabûsê ku ev nozdeh sal bûn destêñ xwe xistibû qirika wê, ji bîr kir, lê dîsa tavilê tîrsa wê hatiyê, laşê wê lerizî, vê carê guhertineke bêhawê di rûyê wê de peyda bû. Gava mêtîk xwest rabe ser xwe û ji texsiyê re telefon bike, wê nehişt û bi mêtîk da zanîn ku hê qolincêñ zêde nehatîne wê. Li gora hesabê ku hemşîreyê ji wan re gotibû, çar roj di ser dema wan re bu-huriybûn. Ji ber ku li ber guhêñ mêtîk ketibû, ku zarokêñ dereng çêdibin, lawik in, kéfa wî dihat, lê ji aliyê din ve jî dixwest rojekê zûtir jina wî, ya ku zikê wê li ber

dev bû, ji wî ezabî xelas bibe.

– Ez dibêjim wê îro çêbibe, mîrik got û di bin kirasê wê yê şevê re destê xwe danî ser zikê wê yê mezin û girover.

Zaroka ku êdî di hundir de aciz bûbû û dixwest derkeve derive û tevlî xweşî û nexweşiya jiyana mirovane bibe, mîna gulokekê hilkişiya jor û bi xurtî xwe bera jêr da.

Vê carê ji bo ku jinik jî bibîne, mîrik kirasê wê hilda jor û bi kêf li tevgera zarokê temaşe kir. Ew benderuha di zikê jinikê de mîna perpitandina mirîşkeke serjêkirî diperpitî. Jinikê di wê navê de awirênen xwe yên bi tirs berdabû ser mîrê xwe û bi kelecan li benda reaksiyona wî bû. Mîrik jî ziq bala xwe berdabû ser zikê wê yên ku bêhawen mezin bûbû û li livandin û tevgera zaroka xwe temaşe dikir. Gava mîrik ji nişka ve bêdengî hîs kir, serê xwe rakir û li jina xwe nerî. Rûyê jinikê bûbû mîna yên miriyekê, xwêdanekî mîna zîpikê li ser eniya wê peyda bûbû. Mîrik hêdîka bi destê xwe ew xwêdana cemidî ya li ser eniya jina xwe paqîj kir û kirasê wê bi ser zikê wê ve berda. Paşê li gora şîreta hemşîreyê, wî xwest jina wî rabe û di hundirê malê de li ser xwe bigere. Hemşîrê ji wan re gotibû ger ew li ser xwe bigere wê devê mal-zarokê fireh bibe û di çêbûna zarokê de wê jinik zêde eş û zehmetiyê nekişîne.

Jinikê bi ya mîrê xwe kir û hêdîka bi giranî, bi alîkariya destênen xwe herdu lingên xwe ji qeryole berdan jêr û li ser lingan rawestiya. Qolincênen wê jî êdî dihatinê û ji rewşa wê diyar dibû ku wê îro zaroka wê were dinyayê.

Her ku jinikê nêzîkî li çêbûna zarokê dikir, mîna ku ruhê wê jê bikişe, rengê rûyê wê dihat guhertin, dilerizî, xwêdan dida, carinan xwe dispart pencerê, serê xwe ditewand, digiriya, diqîriya... Her cara ku mîrik dixwest ji texsiyê re telefon bike û wê bibe nexweşxanê, jinikê digot hê qolincênen wê zêde nebûne û ji telefonkirina mîrê xwe re dibû asteng. Du caran gava wê ji bo hewagirtinê pencere vekiribû, ji nişka ve hîseke ku ew xwe di pencerê re biavêje hatibûyê, cara dudan mîrê wê bi zorê destênen wê ji hesinê pencerê qetandibûn, bi şîdet pencere girtibû û ew ji ba pencerê bi dûr xistibû.

Bi hebekî rohnîbûna derive re baraneke xurt dest pê kiribû. Libênen baranê mîna zîpikê li pencerê dikirin tipînî. Ji pişt xênî jî dengê şuruka avê ku li naylonê diket, dihat bihîstin.

Mîrikê ku bi tena derpiyê kinik bû, bi herdu destan jina xwe hemêz kir û bi wê re çû mitfaxê. Gava jinikê xwest li mitfaxê li ser kursiyekê rûne, mîrik şîreta hemşîreyê di bîra wê de anî û da xuyakirin ku ew li ser xwe bigere wê ji wê re çêtir be.

Jinikê herdu destênen xwe danîn ser tihêlînen xwe û hêdîka çû vî serî û wî seriyê mitfaxê. Mîrik jî bi tena derpîkê kinik çaydan nîvî av kir û danî ser ocaxê.

– Ez ditirsim Kerem, jinikê bi stûxwarî ji mêtê xwe re got. Ez ji vê zaroka di zikê xwe de pir ditirsim.

Kerem li wê vegeriya, ew hemêz kir, eniya wê maçî kir û got:

– Em ne li welêt in, tu dizanî ku doktor û hemşîreyên vir ji dê û bavêñ mirov bêtir li mirov miqate ne. Teknîka vir li pêş e, personal ji dil in, nexweşxane paqij in...

– Lê ne ji wê, jinikê got û lêva wê ya jêr lerizî.

Kerem dîsa li ber geriya, ew hemêz kir, maçî kir, jê re behsa paqijiya nexweşxaneyan, dostaniya hemşîre û doktoran kir; lê kir û nekir jinik aş nebû. Gava jinikê ji nişka ve got: "Ez dixwazim tiştekî ji te re bibêjim", mêtîk bi carekê ve sar ma, digel ku dizanîbû ji sedî sed ew zarok ji wî ye, dîsan jî ket şikeke giran.

– Ev pênc sal in min ji te veşartiye, Kerem. Lê êdî ez hew dikarim xwe bigirim, divê ez ji te re bibêjim.

Keremê min û te, mîna xwîn jê kişiya be, di cihê xwe de bê tevger rawestiyabû û zer bûbû. Ev pênc salên ku jina wî jê veşartibûn ci bû gelo?

– Erê, ev tam nozdeh sal in, fala Nûrikê mîna kabûsekî pêxîla min bernade. Tiştên ku wê nozdeh sal berê di fala xwe de gotine, ez wan roj bi roj dijîm û ev yeka ha jî min bêhawe ditirsîne.

Hebekî bêhna mêtîk hat ber wî, bi lez çû odeya razanê, qutikê xwe li xwe kir û dawiya fala Nûrikê ku ev nozdeh sal bûn mîna kabûsekî destê xwe xistibû qırıka jina wî, meraq kir; meraq kir, lê bi qerf jê pîrsî:

– Tu bi Xwedê kî ev ci fal e Nûrikê ji te re vekiriye, ku te heyâ niha ji bîr nekiriye?

Jinikê bi kelogirî got:

– Ji xwe her ku ez behsa tiştên wilo dikim tu henekê xwe bi min dikî, tu bi min dikenî. Loma min heta niha fala xwe ya berî niha bi nozdeh salan ji te re negotiye. Lê ez ê niha bibêjim. Tu henekê xwe bi min dikî, tu bi min dikenî, tu bawer dikî bawer nakî tu bi kêfa xwe yî, yê min ez ê ji te re bibêjim.

Erê, berî bi nozdeh salan bû. Weke niha tê bîra min. Navrojeke roja çarşemê bû. Havîn bû; ez, diya min, cîrana me Ezîza û xaltîka Siltê em li hêwana me ya ku deriyekî wê li cadê vedibû, rûniştibûn. Me çaya pişti firavînê vedixwar. Û tam di wê navê de, Nûrikê, mîna her tim kincên wê yên zilamane lê bûn, çefiya wê li serî bû, gopalê wê di dest de bû û di kuçê re derbas bû. Cîrana me Ezîza hema ji cihê xwe pengizî û got:

– Weleh ez ê bang Nûrikê bikim û falekê pê bidim vekirin.

Ji xwe diya min jî li hemana bû, hema wê falciyek li derekê bidîta, ji bo birayê

min Yasîn falek vedikir. Hingî du salêن birayê min Yasîn li Almanyayê qediyabûn. Diya min ji derdê wî ne dixwar, ne vedixwar, ne xweşikahî radiza. Digoooot û li xwe dixist. Neyse, Nûrikê dageriya hundir, gopalê xwe sipart dîwêr û li ser mînderrê çarmêrkî veda. Nizanim gelo Nûrika Şabanî tê bîra te? Ew mîna zilaman e, lê navê wê Nûrikê ye. Hinek dibêjin nêrûmê ye. Welhasil, ez tavilê rabûm çûm mit-faxê û min ji bo falê qehweyek da ser. Fala pêşî diya min ji bo birayê min da vekirin. Lê wê ji Nûrikê re qala birayê min nekiribû û haya Nûrikê jî ji çûyina birayê min ya Almanyayê tune bû. Diya min nêta xwe di dilê xwe de gotibû. Nûrikê bi binikê fîncanê girt û ew wilo hêdîka di nava destê xwe de bir û anî û weha mîna ku tiştinan dibîne lê baş ne zelal e, bi rûyê xwe yê qermîçî lê nerî. Em hemû bêdeng mabûn û çavên me li wê bûn. Piştî ku wê çend caran fîncan nêzîkî çavên xwe kir û ji xwe bi dûr xist, dest pê kir û got:

– Li welatekî dûr xortekî pak xuya dibe. Du kes pêxîla vî xortî bernadin. Yek jê jineke navsal, porgijikî, yê din jî mîrekî qut û qalind e. Lawik dixwaze ji wan xelas bibe, dike nake nikare. Ha biner biner, li vî alî jî malek xuya dibe.

Wê fîncan ber bi diya min ve dirêj kir û bi tiliya xwe ew mala ha nîşan da. Diya min jî mîna ku xwîna wê jê kişiye be, zer bûbû û ziq li wî xaniyê ku Nûrikê nîşan dida, nerî.

– Erê Wele, ez dibînim, diya min bi bawerî got.

Di eslê xwe de heya wê çaxê jî min baweriya xwe qet bi falan nedianî. Tew ez bi xelkê dikeniyam. Min digot ew çawa baweriya xwe bi derewên wilo tînin. Lê tiştên ku Nûrikê di derbarê birayê min de digotin, hemû rast bûn.

– A di vê malê de jinebiyeke porzer rûdine, dil ketiye xort, dixwaze pê re bizewice. Ew jina porgijikî û mîrekî qut û qalind ji ber nelihewkirina siyasetê ketine qirika wî.

Dîsa weha fîncan dûrî xwe girt û nêzîkî xwe kir û peyva xwe domand:

– Ev berê hevalên hev û siyasi bûn, yanî di partiyekê de bûn, lê niha navbera wan xerab bûye, an jî lawik hebekî ji siyasetê sar bûye û dixwaze bi wê jinebiya ciwan re bizewice; lê hevalên wî hin tiştan dixin stûyê wî, ew jî çi ye baş ne xuyaye.

Wê fala Nûrikê kiribû ku em hemû di cihê xwe de sar bibin. Tam berî wê bi du rojan birayê min nameyek şandibû, te digot qey ew nameya birayê min pêşî ketibû destêNûrikê û paşê ji me re hatibû. Hemû tiştên ku Nûrikê digotin rast bûn. Hingî min xwest ew ji min re jî falekê veke. Lê pêşî cîrana me Ezîza ket ber min. Yê wê jî ku hema falciyek bidîta fal vedikir. Nizanim te Ezîza nas dikir? Ez bawer nakim, ji ber ku gava tu derket, ew hê zarok bû. Keça apê Smaîl... Jineke wek lampekê ye, bavê wê ji çikûsiya xwe ew da kalekî. Gerçî mîrê wê gelekî jê re baş e,



lê xortek di dilê wê de bû û ew her li wî xortî difikirî. Fala ku Nûrikê ji bo wê jî ve-kir, li gora dilê wê bû. Li gora wê hemû tiştên ku Nûrikê gotibûn, rast bûn.

Gava Kerem têgihîst ku çiroka fala Nûrikê dirêj e û çav li rewşa wê û qolincen ku tênenê ket, ji hemberî wê rabû, ket bin milê wê, ew rakir ser lingan û jê xwest ku ew hem li ser xwe bigere, hem jî behs bike. Wê jî mîrê xwe neşikand, rabû ser xwe, destekî xwe avêt ser stûyê mîrê xwe, destê din da ser newqa xwe, hem meşîya û hem jî got. Lê rûyê wê zer bûbû, xwêdanekê ew girtibû, tirseke bêtarfî ji awirêne wê difûriya.

— Wê rojê min jî ji xwe re falek vekir. Tu ya rastî bixwazî, baweriya min qet bi falan nedihat. Lê gava Nûrikê di fala xwe de rewşa birayê min raxist ber çavan û hemû falên wê li gora dilê Ezîza bûn, min jî xwest ez ji xwe re falekê vekim. Erê, tevî ku baweriya min bi falan nedihat, lê gava dora min hat û Nûrika falcî rahişt fincana min, ji kelecanê dilê min bû mîna çûkekî perpitî, te digot qey wê hundirê min were xwarê. Min pir bi kelecan lê guhdarî kir. Wê jî bi hostetî rahişt fincana min, di nava destê xwe de bir û anî, dûr û nêzîkî çavêن xwe kir, geh li min nerî, geh li fincanê nerî, geh rûyê xwe tirş kir, geh qermîçokên ecêb li eniya wê çêbûn, geh serê xwe hejand, geh nexwest bibêje; lê ez wek li ser êgir bûm, min jê rice kir ku ew rastiya fala min ji min re bibêje. Ü wê jî got... Got binere keça min, tu keçi-keke pir biaqil î, tu qenc î, lê wê biaqilî û qenciyâ te nikaribe tu tesîrê li pêşeroja te bike. Tu ê nikaribî li hemberî qedera xwe rabî û celebê jiyanâ xwe biguherî. Miro-vên mîna te ji hezarî, belkî ji deh hezaran, belkî ji milyonan yek e. Yêne wek te pir nêzîkî Xwedê ne. Qedera wan li eniya wan hatiye nivîsandin, lê cihê wan cenet e. Cihê te jî cenet e. Tu ê di vê jiyanâ kurt de, li vê dinya derewîn hem rojên xweş û hem jî yêne nexweş bîbînî û bijî. Hem rojên te yêne xweş hem jî yêne xweş, ji pêşî ve ji aliye Xwedê ve hatine nivîsandin. Niha emrê te şanzdeh e. Tu ê tam not û neh salan emir bikî. Not û neh sal bi para her kesî nakevin. Xwedê bi tenê yê ku jê hez dike, bi qasî navê xwe, dike ku ew emir bike. Lê di vî not û neh salî de, jiyanâ te roj bi roj plankirî ye. Tu ê roj bi roj li gora vê planê bijî. Mesele tu ê işev xewne-kê bîbînî. Tu ê di xewnê de bixwazî bifîrî lê tu ê nikaribî. Tu ê bixwazî birevî, lê tu ê nikaribî. Paşê tu ê çentekekî biçûk bîbînî. Bi qîmeta not û neh zêran pere di wî çentekekî de heye. Divê tu cihê wî çentî baş di bîra xwe de bîhêlî û sibehê zû, gava tu ji xew rabî, berî ku tu taşte bixwî, divê tu herî wî cihî. Tu ê li wî cihî wî çenteyê bîbînî. Tu ê pereyên di wî çenteyî de di nav destmalkekê de baş girê bidî û di nava li-hêfa şîrkî de veşerî. Ew pere wê bi têra te û hera zewaca te bike. Heta zewaca te lê, berî ku tu bizewicî tu ê xortekî nas bikî. Xort pir spehî ye, wê li dû te bigere, lê tu ê guh nediyê. Bi tenê şevekê tu ê li ser wî dêhn bibî. Tu ê bixwazî wî hemêz bikî, wî

maçî bikî, wî mist bidî. Wê şevê jî wê ne diya te, ne jî bavê te li mal be, wê kes tunabe. Tu ê bi tenê li mal bî. Wê xwestekêk, şehwetek were te ku pê hemû laşê te bilerize. Tu ê bi nefsa xwe nikaribî û tu ê laşê xwe yê terr bispêrî xortê çeleng. Lê wê xort ji nişka ve winda bibe. Tu ê êdî hew wî bibînî. Heta salekê tu çav li kijan xortî bikevî, tu ê bi çend gavan bi dû de biçî û tu ê bi dengekî nizim bang bikî. Gava tu bibînî ku ne ew e tu ê bi şermokî serê xwe bera ber xwe bidî û bi paş de vegerî. Piştî bi salekê tu ê xewnekê bibînî, wê xewn bîst salî têxe navbera windabûna xort. Wê ew dem bike ku tu êdî wî xortî bi temamî ji bîr bikî. Lê di hefteya pêşî ya salê de, yanî tam gava tu ê têkevî huvdehsaliya xwe, wê li bajarekî nêzîk tirimpêlek li te biqelibe. Wê şifêrê tirimpêlê ew xort be. Lê tu ê wî nas nekî. Wê ew xort te rake nexweşanê, destê te yê şikestî bicebirîne û te bîne li nêzîkî mala te deyne. Wê ew bûyer jî ji te re mîna xewnekê were. Tu ê heta bîst saliya xwe weke her kesî bijî. Lê tu ê bi cenawirê di hundirê xwe de nehesî.

Di vir de ayeaya wê zêdetir dibe. Mêrê wê li dora wê diçe û tê, lê nizane bi ci awayî alîkariya wê bike. Ew jî bi kelecan bûye, digel ku hîsa dilxerabiyê di hundirê wî de tevdilive jî, dîsa dixwaze bi rastî li jina xwe guhdarî bike. Dixwaze sirên wê yên veşartî bibihîze.

Jinik hem hêdî hêdî diçe û tê hem jî dom dike:

– Min hingî jê re got, ci cenawir? Gelo ci cenawir di hundirê min de heye? Ka bibêje!

Wê got ew ê paşê were ser wê jî. Lê got, tu ê di bîst û yeksaliya xwe de kirasekî bikirî, tu ê bi tenê carekê wî kirâsi li xwe bikî û wê ew kirâs winda bibe. Piştî bi şes mehan tu ê wî kirâsi li cîrana xwe bibînî, lê tu ê jê re tiştekî nebêjî.

Qolincên wê zêdetir dibûn. Her ku diçû mîrik jî bêçare dibû. Lê ji nişka ve pen-gizî ser xwe û ji texsiyê re telefon kir.

Heta ku texsî hat, jinikê di rewşeka xerab de serpêhatiya fala xwe dom kir. Lê bi kurtî behs kir:

– Ü wê got, tu ê di sihsaliya xwe de bizewizî û biçî Almanyayê, wê pêşî zarok ji te re çênebin, tu ê di sihûpêncsaliya xwe de bi zaro bibî...

Dengê girîna texsiyê li hewşê hat bihîstin. Jin û mîr, bi hazırî, bi çenteyekî dake-tin jêr. Şifêrê texsiyê yê navsal û bejindirêj, silav li wan kir û bi kêf meraq kir ka gelo ava jinikê hatiye an na. Mêrê jinikê, yanî Kerem, got hê av nehatiye; û alîkariya jina xwe kir û ew di deriyê paşiyê yê ku şifêr ji wan re vekiribû re xist hundirê texsiyê. Şifêr pêl li gazê kir, xîzîniyek ji tekeran anî û zîvirî ser riya nexweşanê. Herç-iqas şifêr xwest bi wan re sohbetê bike jî, lê hem jinikê xwest çîroka fala xwe ji mîrê xwe re dewam bike, hem jî mîrik xwest li dawiya çîroka fala jina xwe guhdarî

bike.

Erê, jinikê qal kir, lê bi nalenal qal kir:

– Ü Nûrika falçî got, wê di sihûpêncsaliya te de Xwedê benderuhékî nêr bide te. Belê, negot wê Xwedê lawikekî bide te. Ü got, ev benderuh bermayê tovê wî xortê ku tîna te ya şehwetê şikandibû ye. Ü ev benderuh ne mirov, lê cenawir e; wê duse-rî çêbibe û ji mirovatiyê te musîbetek be.

Mêrik di wê navê re destê xwe danî ser devê wê û nehişt ew qala fala xwe bike. Digel ku tirs mîna bizotek agir ketibû dilê wî jî, dîsa wî bi destê xwe yê rastê zikê wê mist da û bi gotinên xweş û hêvîtiji xwest jina xwe ji wan xeyalên tirsê bi dûr bixe. Lê herdu jî di nava xeyalên tirsê de vedigevizîn. Bi taybetî jinik. Avahî, insan, otomobîl, her tişt li ber çavên wê dibûn mîna cenawiran. Gava ew ji texsiyê dake-tin û ketin hundirê nexweşxanê, dengê qîrîna wê hemû xebatkar û personalên nex-weşxanê di cihê wan de sar kirin. Mêrê wê bi lez destê xwe danî ser devê wê, ew aş kir, bi gotinên xweş di ber dilê wê de çû û hat. Paşê hemşîran ew li odayekê dirêj kir, bi dostanî û bi devkenî dest bi kontrola wê kirin. Çavên jinikê beloq bûbûn û ziq li hemşîran dineri. Hemşîra navsal û bi tecrube, bi destâ xwêdana eniya jinikê paqîj kir û bi devkenî jê re got ku devê malzarokê fireh bûye û piştî demeke kurt wê zaroka wan were dinyayê.

Paşê hemşîre derketin û jin û mîr bi tenê li hundir man. Mîna ku hebekî bêhna jinikê fireh bûbû, lê qolinc li ser qolincan dihatinê. Her qolinka ku dihatiyê jî ew weke darekî, hişk dikir. Piştî ku hemşîran bi lez li dosya wê nerîn û dîtin ku her tişt normal e, dîsa hatin seredana wê. Devê malzarokê firehtir bûbû û loma wan tavilê jinik rakirin odaya zayînê. Kincên wê jê kirin û kirasekî spî lêkirin. Paşê ew li ser qeryole dirêj kirin, çend behlîf xistin bin pala wê û çîmêñ wê ji hev kirin. Piştî ku ew tam ji zayînê re amade kirin, pîrikê (ebeyê) jê re got ku divê ew carê bêhna xwe bigire û berde û gava qolinc têne heta jê tê xwe biesirîne. Wê jî bi ya pîrikê kir û zêde neajot ew benderuhê di zikê jinikê de şemiti jêt. Pîrikê bi lez rahiştê, bilind kir û bi dilşahî got:

– Lawik e!

Lawikbûna wî diyar bû, ji ber ku gava pîrikê ew bilind kir wî beliqand ser diya xwe.

Mêrik dikira ji kêfan bifiriya. Lê dema pîrikê lawik danî ser singa diya wî, dîsa qîrînek bi jinikê ket, lawik ji ser singa xwe dehf da û her bi qîrîn got:

– Kereem! Vî cenawirî wê de bibe!... Ma tu pirça wî nabînî?... Ma tu herdu serîn wî nabînî?... Ma tu qermîçokên eniya wî nabînî?... □


# Günter Grass bû xwediyyê xelata Nobelê ya îsal

Amadekar: NÜDEM

**G**er were bîra xwendevanan me berê ji  
Gbi hin hincetên taybetî behsa Swêdê  
kiribû. Ev Swêda ku berê ji welatiyên me re  
nenas û dûr bû, niha, bi hincet û minasebe-  
tên cihê behsa wê tê kirin, li ser wê, li ser  
rola wê ya di ziman û edebiyata kurdî de tê-  
peyivandin.

Belê, mîna ku me berê ji gotibû, Swêdê  
welatekî biçûk, ji welatê me bi hezaran kilo-  
metre dûr, di dilê Skandinavyayê de ye.  
Havînan rojên wê dirêj, zivistanan şevêne wê  
dirêj in. Tava wê kêm, berfa wê zêde ye. Pir  
sar e, lê serma wê mirov naêşîne, nerm e; an  
ji imkanan serma wê germ kiriye. Ne ji ber-  
fa spî be şevereşen zivistanan nayên kişan-  
din. Di van şevereşen zivistanan de, cejn û  
şahî û şewqa mûmân pêkeû ku ji pencere-  
yan xuya dikin, xemleke spehî didin Swêdê.  
Yek ji xemlên din yên spehî ku gund û ba-  
jaran, qehwexane û restorantan, kuçe û ko-  
lanan dixemilîne ji, xemla welêt ya ji bo cej-

na Noelê ye. Lê berî cejna Noelê cejneke  
din heye ku bala hemû dinyayê dikişîne ser  
xwe. Yek ji van xelata Nobel ya Edebiyatê  
ye. Li Swêdê gelek xelatên din ji tên belav-  
kirin, lê xelata Nobel ya edebiyatê ye ku ba-  
la hemû edebiyatvan û edebiyatbezên din-  
yayê dikişîne ser xwe. Belê, salê edebiyatva-  
nekî cîhanê dibe xwediyyê vê xelatê, ku di cî-  
hana edebiyatê de mîna xelateke bi rûmet  
tê binavkirin. Îsal, nivîskarê alman Günter  
Grass bû xwediyyê vê rûmetê. Günter Grass  
ku berî girtina xelatê ji li dinyayê bi nav û  
deng bû, bi girtina xelatê, di rojekê de navê  
xwe li cîhana edebiyatê da bihîstin û bû mi-  
jara minaşeyen cihê. Ew bêtir ji li welatê  
xwe, yanî li Almanyayê bû mijara minaşeyan.  
Ji ber ku ew nivîskarekî nerehet û  
netebatû bû û hê ji wilô ye. Ew xwe ne bi  
tenê mîna nivîskarekî aram dibîne, lê xwe  
mîna aktivîstekî û rexnegirekî sistem û civa-  
tê ji dibîne. Wî di gelek bûyerên Almanya-



Günter grass

yê de navê xwe daye bihîstin. Bi gotineke din wî pozê xwe xistiye nava her karî. Loma wî gelek kes jî ji xwe aciz kirine; hem bûye hedefa rexneyên çepan hem jî yên rastan. Lê ew mîna çepeki liberal tê naskirin û bi piranî jî li milê çepê dimîne. Herçawa be ew li dijî hilwêşandina diwarê Berlinê bû û bi wê yekê jî navê xwe dabû bihîsin û bûbû mijara rexneyên tûj. Lê belê, li ku dera dînayê çi qewimî be, neheqî li kê, li kîjan ni-vîskarî hatibe kirin, wî cihê xwe li ba wan girtiye û li gora hêz û taqeta xwe piştgirî û alîkariya wan kiriye. Gava di sala 1997an de Yaşar Kemal ji ber nivîsa xwe ya di Der Spiegelê ya di derbarê kurdan de xwe dabû alî, Günter Grass piştgiriya wî kiribû û ji bo demokratîzekirina Tîriyîye û rewşa kur-

dan dengê xwe bilind kiribû. Wî destê alî-kariyê dirêjî nivîskarê îngilîz Salman Ruştî kir û bi wê yekê careke din ji bo azadiya fikrê dengê xwe bilind kir. Mîna ku min li jor got, ew li welatê xwe hertim mijara minaqeşe û rexneyan e, lê, mîna xelatgirê Nobelê, çi bigire hemû endamên akademiyê li ser Günter Grass hevfikir bûn û dengê protestoyê ji tu endamî derneket. Herweha di çapemeniya Swêdê de jî hewayeke pozitîv hebû. Li gora edebiyatzan û rexnegirên edebiyatê, hilbijartina akademiyê ya îsal hilbijartineke baş bû û Grass layiqê xelatê bû.

Herçiqas kitêbxaneya kurdî ji kitêbên Günter Grass bêpar be jî, lê li Swêdê heta niha zêdeyî deh kitêbên wî hatine weşandin. Weşanxaneya Nûdemê bi wergera Şad-

hînê Bekirê Soreklî, kitêbeke xelatgirê Nobelê, ya hevwelatiyê Grass Heinrich Böll weşandiye û em hêvidar in ku wê edebiyat-hezên kurd kitêbên Grass jî bi zimanê xwe bixwînin û bi wê yekê bibin hevpar û şirî-kêن cîhana wî ya dewlemend û fantaziyên wî yên xutr.

Günter Grass di sala 1927an de li Danzigê (Gdanska iro) li Polanyayê hatiye dinya-yê. Wî li akademiya hunerê ya Düsseldorf û Berlinê xwendîye. Wî di sala 1956an de bar kir Parîsê û li wir xebatêñ xwe yên edebî domand. Di 59an de kitêba wî ya ku ew di qada navneteweyî de kir xwedîyê navekî nemir derket. Navê vê kitêbê bi swêdî "Bleck trumman" e. Di sala 1961ê de kitêba wî ya bi navê "Psîk û mişk" derket. Di 63yan de "Sala kûçik" derket. Ü paşê, herçiqas Grass ne zêde niviskarekî bi ber be jî, roman û piyesen wî li dû hev derketin û bi wê yekê bû navekî navneteweyî.

\* \* \*

Xelata Nobelê ya edebiyatê ji sala 1901ê û vir ve tê belavkirin. Günter Grass xelatgirê sedsalê yê dawî ye.

Me ji bo xwendevanê Nûdemê ev liste-ya welat û xelatgirên Nobelê derxist. Me ev liste ji rojnameya swêdî Dagens Nyheterê girtiye.

### Afrika Başûr:

Nadine Gordimer

### Sal:

1991

### Almanya:

Theodor Mommsen	1902
Rudolf Eucken	1908
Paul Heyse	1910
Gerhart Hauptmann	1912
Thomas Mann	1929
Heinrich Böll	1972
Günter Grass	1999

### Australiya:

Patrick White

1973

### Belçika:

Maurice Maeterlinck

1911

### Brîtanya:

Rydway Kipling	1907
George Bernard Shaw	1925
John Galsworthy	1932
thomas Stearns Eliot	1948
Bertrand Russell	1950
Winston Churchill	1953
Elias Canetti	1981
William Golding	1983

### Emrika:

Sinclair Lewis	1930
Eugene O'Neill	1936
Pearl Buck	1938
William Faulkner	1949
Ernest Hemingway	1954
John Steinbeck	1962

Saul Bellow	1976
Isaac Bashevis Singer	1878
Czesław Miłosz	1980
Joseph Brodsky	1987
Toni Morrison	1993

**Çekoslovakya:**

Jaroslav Seifert 1984

**Danimarka:**

Karl Gjellerup	1917
Henrik Pontoppidan	1917
Johannes V. Jensen	1944

**Finlandiya:**

Frans Emil Sillanpää 1939

**Fransa:**

Sully Prudhomme	1901
Frédéric Mistral	1904
Romain Rolland	1915
Anatole France	1921
Henri Bergson	1927
Roger Martin du Gard	1937
André Gide	1947
François Mauriac	1952
Albert Camus	1957
Saint-John Perse	1960
Jean-Paul Sartre	1964
Claude Simon	1985

**Guaetamala:**

Miguel Angel Asturias 1967

**Hindistan:**

Rabindranath Tagore 1913

**Irland:**

William Butler Yeats	1923
Samuell Beckett	1969
Seamus Heaney	1995

**İsrail:**

Samuel Agnon 1966

**İtalya:**

Giosue Carducci	1906
Grazia Deledda	1926
Luigi Pirandello	1934
Salvatore Quasimodo	1959
Eugenio Montale	1975
Dario Fo	1997

**İzlandya:**

Halldor Kiljan Laxness 1955

**Japonya:**

Yasunari Kawabata	1968
Kenzaburo Oe	1994

**Kolombiya:**

G. Garcia Marquez 1982

**Meksika:**

Octavio Paz 1990

**Misir:**


Necîb Mahfûz 1988

<b>Nigerya:</b>		Erik Axel Karlfeldt	1931
Wole Soyinka	1986	Pär Lagerkvist	1951
		Nelly Sachs	1966
		Eyvind Jonson	1974
		Harry Martinsson	1974
<b>Norvec:</b>			
Björnstjerne Bjöndon	1903		
Knut Hamson	1920		
Sigrid Undset	1928		
<b>Polanya:</b>			
Henryk Sienkiewicz	1905	<b>Swisre:</b>	
władysław Reymont	1924	Carl Spitteler	1919
Wislawa Szymborska	1996	Hermann Hesse	1946
<b>Portekiz:</b>			
José Saramago	1998	<b>Şile:</b>	
		Gabriela Mistral	1945
		Pablo Neruda	1971
<b>Rûsy:</b>			
Ivan Bunin	1933	<b>Yugoslaviya:</b>	
Boris Pasternak	1958	Ivo Andric	1961
Michail Sjolochov	1965		
Alexander Solzjenistyn	1970	<b>Yunanîstan:</b>	
<b>Saint Lucia:</b>		Giorgos Seferis	1963
Derek Walcott	1992	Odysseus Elytis	1979
<b>Spanya:</b>			
José Echegaray	1904		
Jacinto Benavente	1922		
Juan Ramo Jiménez	1956		
Vicente Aleixandre	1977		
Camilo José Cella	1989		
<b>Swêd:</b>			
Selma Lagerlöf	1909		
Verner von Heidenstam	1916		

# Reş û Spî

ENWER KARAHAN

Romana İbrahim Seydo Aydogan a ku navê wê Reş û Spî ye, ji terefê birayê wî yê mezin, dostê min î ezîz Mistefa ve gîhaşt min û min ew di hilmekê de, bi kîfîxwesîyeke mezin xwend. Carinan min xwe tê dît, carinan min hin şibandin hin nasênu ku negîhaştin xêtir ji me bixwazin, carinan tîrsa ku civat teslîm stendibû, carinan mirovên situxwar ên warêن bav û kalan terk kiribûn, carinan jî dime-nêن jîngeha ku li me bûbû dojeh... Hîn di pêvajoya xwendinê de, fikira ku divê ez li ser vê romanê binivîsînim hêdî hêdî bi min re çebûbû. Piştî min ew qedand jî reaksiyona min a yekem ew bû ku ev roman hem bi mijara xwe, hem bi teknîka xwe û hem jî bi hinerê hûnandina xwe ve di kurdî (kurmancî) de berhemeye guhertî bû. Bi gotineke din ferqiya wê û romanênu ku min he-



ta niha xwendibûn hebû. Ew bi gelek awayêne xwe ve nedîşibiya wan. Vê xusûsiyetê ez li nivîsandina li ser vê berhemê bêtir sor kirim. Gava ez li ber komputurê jî rûniştîm min hew dît fiki-rênen min li rûpelê spî li dû hev rêz bûn jî.

Di eslê xwe de min dil heye ku fikirêne xwe yên li ser vê romanê di pêş de bi

awayekî firehtir binivîsînim. Lî min xwest ez bi vê nivîsê reaksiyona xwe ya ewili bi xwendevanê NÜDEMê te par ve bikim û xwendina romaneye weha pêşniyarî wan bikim.

Ji ber ku romanê heta nuha bi kurdi (kurmancî) hatinin nivîsandin, piraniya wan li derveyî welêt, li surgûnê hatinin nivîsandin. Li gora baweriya min, ya ku xusûsiyetekê pesindayînê dide vê romanê û nivîskarê romanê ev e. Ya din jî, ya heri girîng zimanê romanê ye. Ferqeke din jî ya roma-

nê, ji romanê heyî cûdatir ew e ku ev roman bi metodeke nû hatiye nivîsandin. Ez bawer dikim ku hêla ku herî pir minaqše li ser bête kirin, dê ev şeklê bikaranîna vê metodê be.

Mexsedên esasî ku ez gîhandim vê qene- etê, da ku li ser vê berhemê binivîsinim, ew xusûsiyet in ku min li jorê diyar kirin. Di eslê xwe de armanca min ne analîzkirina vê romanê ye, ji xwe ev ne karê min e ji. Ez yek ji wan kesen ewil im ku min ev berhem xwendiye û min xwestiye ku ez bi çavê xwendevanevê çend gotinan li ser wê bibê- jim.

Mijara romanê (cinyetên qesas nediyar) yek ji wan bêbextiyêñ herî mezin e ku di dîroka kurdan ya dema nêzîk de qewimî ye. Ev bêbextiya dîrokî, ev pêla cinyetên "qesas nediyar" wek xusûsiyeteke salêñ nodî li welatê me rabû û agir bi kezeba gelek malbatan xist. Qehremanê romanê û malbata wî ji yek ji wan malbatêñ ku ji vê bêbextiyê para xwe wergirtiye. Her tişt bi du guleyêñ malkerab dest pê dike. Du guleyêñ ku bajarekî seranser dixe şinê. Seydoyê birayê qehremanê romanê serê sibehekê, gava ji malê derdikeye, da ku here karê xwe ji ber deriyê mala xwe bi deh gavan wê de, li orta kuçeyê û di ronkahîya rojê de, bi bêbextiyekede nedîtî, ji paşiyê de, du guleyan ji xafil de û bi xayıntî bera serê wî didin. Nivîskîr xwestiye xwe bi vê bûyerê bi tenê bi sinor neke û Seydo wek temsîla hemû Seydoyêñ di cinyetên "qesas nediyar" de hatin kuştin, pêş- keshî xwendevanen dike.

Kuştina Seydo di romanê de tesîra xwe li

ser hemû bûyerên piştî wê pêvajoyê dike. Ji ber ku piştî kuştina Seydo her tiştên malbatê ser û binî hev dibin. Malbata Robin serê sibehekê, bêyî ku kes pê bihise, bi bêdengî ji cîhê bav û kalêñ xwe bar dike û koça xwe li bajarê Stembolê datîne. Problemên malbatê û bi taybetî ji yên Robin li vî bajarî ji nû ve û bi awayekî gûrtir xuya dibin. Her ci qas nivîskîr xwestiye ku sedemên tengezarî- yên Robin ên esasî weke ku ji ber tesîra evînan nişan bide ji di eslê xwe de tesîra herî mezin kuştina birayê wî ye. Mirov tê derdi- xe ku an wî hin soz dane xwe, an ji wî û hin kesen din sozin dane hevdu. Lî di hundurê wextê de bi wan sozan re nagihêje û ev yeka han ji wî dixe tengezariyeke dijwar. Heta ku roman diqedê ji halê wî ji ber bicîhne- anîna van sozan, her diçê xerabtir dibe. Ew her di xwe de dipiçiye û di destê bêçaretiyê de dinale. Teswîra rewşa ku ew ketiyê, û ya kabûsên ku li serê wî bûne bela û tesîrê li hemû tevgerên wî dikin, bi zimanekî edebî hatiye kirin.

Di van salêñ ku li vî bajarî dimînin, da- yin û sitendinêñ di nav malbata wan de ji pir bi rîk û pêk nameşe. Ji ber ku ew ne bi tenê ji welatê xwe dibin, herweha delaliyê ber dilê xwe û sermiyanê mala xwe ji wenda dikin. Bi guherandina jiyana wan re sermiyanê wan ji tê guherandin. Bi vê guherandînê re sermiyanê malê dizewice û problemên bûkê û malbatê dest pê dike. Di vê derheqê de, nivîskîr nakokiyêñ bûkan û xwesiyan; bûk û goriman û cepheya xwesû goriman a li hember bûkan bi hostetî hûnandinc. Kurdêñ di nav malbatê weha de jiyabin,

dê xwe bi rehetû tê de bibînin. Bi baweriya min, nivîskêr di vira de kêmâniyek kiriye. Di romanê de, di nakokiyêن di navbera bûkê û endamên malbatê de, tu kes terefداریa bûkê nake. Bi piranî, di rewşen weha de, bi kêmânî divê xezûr roleke pozitif bileyize, an jî yek ji tiyên bûkê piştgiriya wê bike. Lê mixabin, nivîskêr roleke weha nedaye tu kesî. Ez ê zêde nekevîm nav mijara romanê. Bi kurtayî, ji ber rewşa malbat û Robîn dîkevinê, dibe sedema ku Robîn di cîhana xwe de hefs bibe û di nav xem û xeyal û rastîya jiyanê de here û were. Nivîskêr di vê derê de ferqiyek xistiye navbera bikaranîna metoda romana xwe û yên heyî.

Weke ku min di despêkê de jî diyar kiri-bû, minaqeşçeya ku divê bête kirin ev xusûsiyeta romanê ye. Ev metoda ha bi hostetî hatiye bikaranîn. Di gelek berhemên heyî de, di afirandina edebiyatê de mirov bîhna bi vî rengî hiltûne, lê bi tevahî di navbera xeyalan û rastiyê de girêdanekê bi vî rengî, min bi xwe nedîtiye. Xeyal û rastî di vê romanê de, hem bi hev re û hem jî di nav hev de derdi Kevin pêşîya mirov. Derbasbûna ji xeyalan ber bi rastiyê û ya ji rastiyê ber bi xeyalan bi zimanekî edebî û gelek caran bê-yî ku xwendevan ferq bikin pêk hatiye. Û ev pêkhatina bi vî awayî jî bi saya zimanekî xurt î lihevhatî ye. Ev jî herka wê xwestir dike û dihêle ku xwendevan bi kelecanekê mezîn li xwendina wê sor bibin.

Ji xwe nivîskêr xwestiye hunerê xwe yê edebî di vê besê de nîşan bide. Bi baweriya min, gava ku wî romana xwe nivîsiye, li ser vê besê bêtir sekinîye û hêza xwe bêtir li vê

derê xerc kiriye. Divê bê diyarkirin ku tevî hemû hewildanan tesîra zimanê tirkî dîsa jî tê hiskirin. Lê teva vê jî li gora min, wî ev beş xweş li hev anîye û baş hûnaye. Sazgêriya his û ramanê xwe bi awayekî edebî û hunerî, girêdayî rastîya ku bi kar anîye, xwestiye bi awayekî ji rastîya jiyanê dûr, lê di eslê xwe de bi rastiyê ve girêdayî, hin mesajan bide civatê. Di vê besê romanê ya ku bêhna surrealîzmê jê tê, hêla nivîskêr ya hunerî baş xuya dibe.

Teva ku nivîskêr bi vê metodê hostayıye-ke baş nîşan daye jî kêmânî û şâşitiyêن herî pir di vê hêla romanê de kiriye. Bi piranî bûyerên ku ew bi xwe jiyabe, an bûbe şahidê wan, di ızahetê de zehmetî nekişandiye. Lê di ızaheta hin bûyer an serpêhatiyêن di romanê de derbas bûne, mirov pir eşkere his dike ku nivîskar bi xwe nejiyaye û pêwîstiye lê bikole neditiye. Gava analîzeke fi-reh hat kirin, divê behsa van nixteyan yek bi yek bê kirin. Lê ez dixwazim bibêjîm ku her ci qas nivîskêr serê xwe bi merseleya evînê re eşandiye û xwestiye bi xwendevan bide bawerkirin ku qehremanê wî, ji ber ku di navbera herdu evînan de bê çare maye, ketiye vê rewşê. Di romanê de, gava mirov bala xwe dide dayin û sitendinê Robîn û yên herdû kecikan ji mirov nagihêje qene-eteke weha ku qehremanê romanê evîndari-yeke pir dijwar dikşîne û ji ber wê ketîye halekî xerab. Ne şevê wan, ne awayê da-nûstendina wan û ne jî sewiyeya xemgînîya wan têra wê rewşa ku Robîn ketiyê dike. Ev jî diyar dike ku sedema rewşa Robîn a esil kuştina Seydo ye. Ez naxwazim zêde têke-

vim detayan, ez dixwazim diyar bikim ku di analîza romanê de, nixteyên ku divê mirov lê hûr bibe û rexneyan lê bigire hene.

Tiştên bi kabûsên wî re xuya dibin, di es-lê xwe de ji yên jiyana rastî ne guhertîr in. Ji ber vê yekê, xeyal di romanê de bêtir di-keve giraniyê. Ji xwe nivîskîr her xwe sipar-tiye xeyalên xwe û xwestiye mirov jî li pê wî here. Û carinan mirov li pê wî diçe jî. Du sahneyên pir eşkere hene ku bi rastî jî mi-rov pir bi rehetî li dû diçe. Yek jê, ew sahne ye ku gava li meydana Taksîmê dikeve xwa-re; ya din jî gava di otobusê de kor dibe. Mirov di herdu rewşan de jî ferq nake ku ew xeyal in.

Di hêlên bikaranîna rastiyê de kêmâni-yên pir ber bi çav tune ne. Hemû serpêhañ û bûyerên di vê romanê de derbas dibin, çî-roka wan bi zimanekî rewan û mirov dikare bibêje bi hosteyîyeke mezin hatiye teswîrki-rin. Bi baweriya min, xusûsiyeta herî mezin, ya romanekê bikaribe bike berheremeke bi-serketî, zimanê wê bi xwe ye. İbrahim jî ev hêla ha baş pêk anije û ne bi tenê rewan-bûn û herikandina zimên, ji hêla îmla û gramatîk jî bi serketî ye. Min bi xwe wek di romanên din de têr dîtin, di vê romanê de, mesajên pir eşkere nedîtin. Nivîskîr mesajên xwe di herka bûyeran de û di hû-nandinê de veşartine. Ji xwe mijara romanê bi xwe jî mesaja herî xurt e. Ji derveyî çend kêmâniyêن piçûk û tewandina navên taybe-tî yên nêr de ku di civata me de hîn jî mijâ-rên minaqeşeyê ne, romana Reş û Spî ji ali-yê tewandina navdêran ve bê qusûr e. Goti-nen pêşîyan û idyom tê de pir kêm in. Ev

xemla berhemê kêmtir dike. Romanekê we-ha ya ku ji hêla zimên û teswîrê xurt e, divi-yabû bi gotinên pêşîyan û idyoman bêtir bihata xemilandin. Hêviya min ew e ku di berhemên bi dû vê de têr de, dê ev kêmânî hindikitir be.

Nivîskarê vê romanê, İbrahim Seydo Ay-dogân, di sahneya nivîsê û edebiyatê de ne navekî naskirî ye û ev roman berhema wî ya yekem e. Awantajeke wî ya di vî warî de he-ye ku ew li welêt diji. Û wê germahiya di salên nodî de ku dar û devî dabûn ber xwe, bi awayekî zindî jiyaye. Ji xwe, yekî ku sah-neya kuştina Seydo û pêvajoya cinayetên "qesas nedîyar" û terkkirina warê bav û ka-lan, ne jiyabe, nikare weha ji dil û can bihû-ne. Teva ku xwendevanên kurd nivîskarê romanê zêde nas nakin jî li gora qeneeta min, bi vê berhema xwe ya pîroz, ew ê di demeke kin de cîhê xwe di dilê xwendeva-nan de çêbike. Teva ku nivîskar hîn pir ci-wan e jî bi bikaranîna hin gotinan û izahki-rina hin tiştên ku di kûrahiya civatê de ve-şirtî ne, diyar dike ku ew civatê nas dike. Lê ji hêla tecrubeyan ve, hîn wexta wî û emrê wî têrê dike û ji ber jî dimîne.

\*\*\*


Nivîskarê delal, min romana te xwend û re-aksiyona xwe ya ewili li jorê nivîsand. Hin hêlên vê romanê ku divê bêr minaqeşekirin û hin tiştên ku divê bêr nivîsandin hene. Lê tevî wan jî divê pesinê romana te bê da-yin. Riya te vekirî be, Biro! □

# Gerînek di nav pirtûka "Danasîna kovarên Kurdi yê li Kurdistana Sûriyê" de

ELİ CEFER

**V**e dawiyê ji aliyê birêz Lokman Polat pirtûkek bi navê "Danasîna kovarên kurdi yê li Kurdistana Sûriyê" hate belav kirin. Pirtûk bi qasî 112 rûpela ye, li ser çar besan pêk tê. Beşê yekem; dana-sîna kovarên kurdi ye. Yê duwem li ser sê şexsiyetên kurd; Cegerxwîn, Hesen Hişyar û Osman Sebrî ye (nivîsîn kevn in). Beşê sisyan hevpeyînek e, bi Kamîran Haco re. Beşa dawî jî, parek ji hevpeyînên ku di rojnameya hefteyî "Azadiya Welat" de, berê hatine weşandin, (bi kovara Pirs, Mihemed Hemo û Fethulla Huseynî) wergirtiye, pêk tê. Pirtûk bedew derketiye. Ji weşanên "Helwest - çanda Nûjen" weşan (29) sal 1999, Swêd.

Ez pir dilşa bûm gava ev pirtûk ket des-tênen min, lema bi germî çûme ser û min xwe li ber xwendina wê xwes kir. Çimkê cara



yekemîn e ku pirtûkeke wisa li ser kovar û rojnameyê rojavayê welatê me derdikeve û li nav xelkê kurd li Ewropayê belav di-be. Lê gava min rûpelên wê qilibandin hêdî hêdî xwendina wê bi min giran dibû, nizanim çîma? Ez serê we ne êşînim, tevlî gotinek me kurdan heye dibêje: "Serê neyshê kundirek jê çêtir e."

Di serata da divê bibêjim; ku ez ne rexne-gir im, ji ber ku ev kar ji dest min nayê, hîna ez mîna çelikekî çûkan di hêlinâ xwe de perik didim. Lê bawer im, wekî xwendevane-kî, ji mafê min e ku rexna li nivîsevanekî bikim. Vêca ezê li gorî zanebûna xwe çend têbînan li ser naveroka pirtûkê rêxim.

1- Di pêşgotinê de, L. Polat dibêje: "Di salêن 60î de Hesen Hişyar bi navê 'Agahi' weşanek derxistiye". Pêre di rûpela ioan de jî wisa hatiye: "...Piştî kovara Hawar, Rona-

hî, Stêr û Roja Nû, cara ewil di sala 1956an de Dr. Nûrî Dêrsimî û Hesen Hişyar bi na-vê 'Agahî' kovarek derxistin." Beri her tiştî, herweki ku kurdên bakurê Kurdistan kovara "Hawar û Ronahî" ji yên xwe dibînin. Kurdên rojava jî, ji yên xwe dihejmîrin, çunkî Kurdistan meydanekî fireh e. Ne te-nê hew, belê Hawar dayîka kovarên kurdî, yên ku li rojavayê Kurdistanê weşîne. Ma gelo mirov ji dayîka xwe dibe? Ji vê pêve hejmara yekemîn ya kovara "Agahî" di sala 1966an de, ronî dîtiye. Ya dinê Hesen Hişyar bi tena xwe ev kovar derdixist, lema jî hemû nivîsênu ku di 19 hejmarê Agahiyê de weşîne tev yên wî ne, ji bîlî du helbest û na-meyekê. Helbestek ya helbestvan Ehmedê Palo bû û ya dîtirê ya Hemze Meksî Begê bûye. Name jî ya Qanatê Kurdo bû. Wî ev name di sala 1956an de, şandibû ji "Komela Zanistî û Hevkariya Kurd" re, li gorî Dilawer Zengî di kovara "El-Hîwar" de (hejmar 21 payîza 1999) nivîsiye. Her wiha navê hin rojnameyan wek navê kovaran hatine. We-kî: "Newroz, Deng, Delav, Xelat." Li cihekî din navê kovarên kurdî yên ku bi zimanê erebî gotine, lê navê hin kovaran ji bîr bû-ye, wek kovara "Ramana pêşverû" ya ku Partiya Hevgirtina Gelê Kurd li Sûriyê di-weşand. Her wiha kovara "Rê" ya Partiya Palê Kurd li Sûriyê ew derdixist. Dîsa di pêşgotinê de wiha hatiye: "...Ev hevpeyvî-nêñ berê, yên kevn in. Bi birêvebirê kova-ran re hauine çêkirin... Lema jî min pêwîst dît ku ji wan hevpeyvînan hinek pirs û ber-sîvan werbigrim û di beşa dawî ya vê pirtû-kê de pêşkêşê xwendevanan bikim." Wekî ez dizanim ku Fethulla Huseynî û Mihe-

med Hemo rêvebirê tu kovaran nakin. Lâ ya Konê Reş û kovara Pirsê rast in.

2- Kovara "Gulistan" 28 hejmarên wê çap bûne û hatine belavkirin. Tenhê di 5 xêzan de ew daye nasîn! Bê ku wê bibîne û di vê babetê de dibêje: "...Ev kovar ji alî Cegerx-wîn ve dihat weşandinê." Çi heyf ku min vê kovarê bi dest nexist. Min ji kurê Cegerx-wîn pîrs kir, lê çi heyf kovar li cem wî tune-bû." Her wisa L. Polat kovar û rojnameyên Roj, Rewşenbir, Deng û.. hd jî nedîtiye û çend gotin li ser nivîsîne!. Ez xweş behwer im ku L. Polat hinekî xwe biwestanda dikarîbû hin hejmaran bi dest xwe bixîne, nemaze kovara Gulistan. Pê re jî em tev dizanîn ku kovara Gulistan ji alî Partiya Demokrata Pêşverû Kurd li Sûriyê ve dihat weşandin. Seydayê Cegerxwîn rêveberiya wê dikir, çunkê Cegerxwîn aligirê wê Parti-yê bû.

3- Dîroka weşandina hejmara yekemîn ya her kovarekê, an rojnameyekê. Her wisa dî-roka hejmara dawî jî di ton karekî wisa de divêtibû bêye nivîsandin, hem ji bo dîrokê û hem ev bi xwe tiştekî zanistî ye.

4- Her wekî rast e ku li ser bergê piraniya kovaran nivîsiye: "Kovareke... serbixwe ye" lê di rastiyê de piraniya wan kovaran ji aliyê partiyên kurdî ve dihate weşandin û belavkirin. Sedema nivîsandina "Serbixwe ye" ji nebûna azadiyê, qedexbûna ziman û çanda kurdî hatiye, loma jî navê rêvebir, an rêdak-siyona kovar-rojname nehatîye nivîsin û ne jî adrêş li ser nivîsiye. Her weha pirê nivîsevanen kurd bi navê xwe yên rast nanivîsin, belê hin caran jî neçar dimînin ku bêhtiri bi navekî lexem binivîsin. Vêca gava li Ewro-

payê pirtûkek wisa li ser van kovar û rojnameyan derkeve divê navên partiyênu ku wan diweşînin û belav dîkin were dayîn. Ev ji mafê wan e li layekî û li layê dîtir ve tiştekî zanistî ye.

5- Di rûpela 8an de, bergê hejmareke "Gelawêj" çap bûye û di bin re daye nîşan ku: "... Paşê kovara Gelawêj besdarî nav kovara Biharê dibe." Pêşî diviyabû bîhatâ diyarkirin ku "Gelawêj" pişti hejmara 4an bû du Gelawêj, li gorî parçebûna Partiya Demôqrata Kurd li Sûriyê -Elparti-. Yek P. D. K. S -Elparti- derdixist, (ew pêre tevlî kovara Bihar bû) û ya din Partiya Kar ya Demôqrata Kurd li Sûriyê diweşand, (helbetê P. K pê re li tevlîbûnekê bû "Partiya Yekbûn", evê partiya dawî ji 5 hejmaren Gelawêj, ji hejmara 20-24 bi kirasekî bedew derxistin û pê re wekî em tev dizanin ligel kovara "Rê" ya ku bi zimanê erebî derdiket û "Stêr" (hejmara sêwî), nav li xwe kirin "Pirs".

6- Kovara "Gurzek Gul" destpêkê ji aliyê nivîskar Konê Reş ve derdiket. Pişti hejmara 1zan, lihevnekirin di orta Konê Reş û Ebdilbaqî Huseynî de çêdibe, lema evê dawî diçe kovara "Zanîn" derdixe. Konê Reş ji pişti wê bi tena xwe sê hejmara ên dîtir ji "Gurzek Gul" derxistin. Ev herdu kovar serbixwe bûn. Sedema rîzkirina vê xalê li vir ew e: ku di pirtûkê de hatiye: "... Lê, li gor agahdarîyên ku min girt kovara Gurzek Gul paşê bi navê Zanîn hat weşandin."

7- Di rûpela 28an de, hatiye ku "Hêvi" kovar e. Di rastiyê de rojname bû.

8- Birêz L. Polat kovara "Çanda Gel" ji, xistiye nav kovarê rojavayê Kurdistanê.

Her wiha ji listeya dawî (çend gotinêna dawî) kovara "Dengê Kurdistan 1981-1989.") Tişte ku em dizanin ev herdu kovar yên PKK bûn û bi zimanê erebî diweşin. Hejmarene hindik di nav añağirêwan de dihatine belavkirin û nivîşen tê de diweşin, ne ji nêzîk û ne ji dûr ve derd û kulêñ rojavayê Kurdistanê behis nedikirin. Lema ev herdu kovar cihê xwe di nav refen kovarê rojavayê Kurdistanê de nabînin.

9- Dîroka derçûna her jimarekê ji kovar, an rojnameyan (Mehane ye, an demsalî ye, yan ji herdemî ye?) nehatiye nivisîn.

10- Pirê kovar û rojnameyên rojavayê Kurdistanê, yên ku li derveyî welêt weşine û diweşin di pirtûkê de nînin. Wekî: "Hevgirtin, Rohilat, Dem, Dengê Komelê, Riya Rast û hwd."

Di dawiya pirtûkê de, (çend gotinêna dawî) listak ji 35 navên (Kovaran!) heye, ku kekê L. Polat ji bo wê dibêje: "Min pişte ku vê pirtûka ji bo çapê amade kir, min li listeya kovarê kurdî yê ku lêkolînvan Mammûd Lewendî amade kiribû, nêrî, min dît ku hinek kovarê ku wî navên wan nivîsiye di vê pirtûkê de cih negirtine." Û berde-wam dike di gotina xwe de: "Kovarê ku min li ser danasîna wan nenevisiye, lê li Kurdistanê başûrê rojava yan ji li Sûriyê derketine ev in: ...." Bi xwe bêhturî wan navan, rojname ne, ne kovar in. Hin ji wan, rojnama komîta navendî û herêma, ya partiyê kurdî ne û hema hema tevê wan bi zimanê erebî ne. Hin nav hene, wek: ( 1- Agirî - Sûriyê-Şam 1979-1983. 2- Bang Sûriyê 1970. 3- Curab El Kurdi - Şam 1925. 4- Hişyarî - Sûriyê 1971. 5-Neynik - Şam 1942

), me bi van nebihîstiye û ez di hebûna wan de bi guman im, belê tiştek heye; hege meriv biçe serdanekê li nav quncik û refikên pirtûkxana "El-Esed û Muzeya Niştimanî, an Pirtûkxaneya Niştimanî" li Şamê, lêkolinan çêbike, belkî tiştekî veşartî hebe, nizanîm. Yan jî meriv hin lêkolinan li Ewropa-yê çêbike, ka gelo di nav arşîvê "Muzeya Berlinê" û cihêن dîtir hin lib gihabin wir, an na?

12- Tiştê herî balkêş di lîstê de ew e; ku hin nav hatine, wekî: "1- Çiyayê Kurmanc - Şam 1915-1922." (Di rastiyê de cihê derçûna *Çiyayê Kurmanc* Heleb bû ne Şam - Elî Cefer). 2- Diyarbekir - Helep 1925. 3- Ararat." Pir mixabın kesî li ser van navan tişten nînîsiye, tenê rojnamevan Husêن Hebeş di namuya xwe ya doktora de bi nav kirine ligel hinê dîtir, wekî: "1- Soran. 2- Botan. 3- Kurdistan." Ev hersiyê dawî, ligel hersiyê berî wê tev ji aliyê dîroknîvîs û rojnamevanê kurd Husêن Hîznî Mokiryanî (1893-1947) ve, li bajarê Helebê, bi dizî dihatin weşandin, ewî bi tena xwe nîvisîne, belê ji her yekê çend hejmar jê çap bûne. Her wekî tê zanîn ku dîrokzanê kurd yê navdar H. H. Mokiryanî çapxaneyekê li Elmanya dikire û tîne li bajarê Helebê datîne, sal 1915 bû, ew bixwe yekemîn çapxaneya kurdî bû, di ezmanê çand û çapemeniya kurdî de, wişa meriv dikare H. H. Mokiryanî wek hîmdarê çapemeniya kurdî bibîne. Pirtûka pêşî ya ku çap kiriye, ya mîrê helbesta kurdî Ehmedê Xanî "Mem û Zîn" bû. Çapxane ta sala 1925an li Helebê ma, dû re ew bi bal başûrê Kurdistanê, li bajarê Rawendozê dâni û li wir di bin navê "Zarê Kurmancî" de

dest bi çapkirina pirtûk û rojnameyê kurdî kir. Hêja ye ku em li vir bînin ziman ku H. H. Mokiryanî ji xelkê rojhilatê Kurdistanê ye.

13- Dîsa di eynî lîstê de, navê (kovarê!) kurdî, yên ku li Libnanê derketine rêt dike, belê weşana "El-Hurriye - Beyrut - Lubnan" jî di nav de bû. Li gorî pirsîna me, ku bi navê "El-Hurriye - Azadî" tu weşanên kurdî li Libnanê derneketine, belê di rastiyê de eva han bi xwe rojnameya hefteyî ya ku Yûsif Melek, ew kesê Aşorî derdixist bû, hîngê ewî bi xurtî piştgiriya kurdan dikir, lema gelek nîvisîn kurdî di rojnameyê de diweşandin, eva han hişt hin kes bêjin ku "Azadî" weşaneke kurdî ye, pê re navê vê rojnameyê bû "El-Wijdan", jê 16 hejmar derketin, ji 15. 3. 1956 ta 7. 10. 1956an. Her wekî din jî, hin weşanên kurdî di lîstê de nînin, mîna weşana Xebat 1, Xebat 2, Hawar, Rohilat 2, Partî, Hevgirtin, Berbang û kovara Kurdname.

14- Sala ku Apo Osman Sebrî "Elfebeya Kurdi" belav kiriye 1954 bû, di pirtûkê de, sal 1955 hatiye. Her wisa "Derdêن me" di sala 1957an de hatiye çapkîrin (ewî sal nîvisîye).

15- L. Polat kovarê ku Apo Osman Sebrî tê de nîvisîn xwe weşandine rêt kirine, lê navê kovara Gelawêjê ya ku li rojavayê Kurdistanê derdiket negotiye, ma gelo ji bir bûye?

16- Di pirtûkê de carna: bakûr û carna Bakûr hatiye. Gelo şâşiyêن çapê ne, an kîjan ji wan raste? Pê re çîma (û) ya bi kumik, ne (u) ya bê bilindek?

Li dawiyê meriv dikare vê bêje; ku tevî

xalêن me li jor rêzkirine, ligel hinek kêmasiyên biçûk, derçûna pirtûkeke wisa cihê rêzgirtinê ye, mala xwediyê wê hezar û yek carî ava be, ji ber ku ev pirtûk wê bibe kilîtek pê deriyên lêkolînên firehtir li ser kovar û rojnameyan. Wisa jî wê bibe jêderek ji her keşê dixwaze tiştekî binivîse li ser rewşa rojna-

megeriya rojavayê Kurdistanê. Lê xwezî birêz L. Polat hebekî xwe di çapkirina wê de ragirta, an berî pirtûk bida çapê pêş hin zanyar û pisporan bikira. Dîsa mal ava, her wekî bapîrên me kurdan gotine: "Goşt bê hestî nabe." □



## Derket


Di her  
1 û 16'ye  
mehê de ji  
bayiyan  
bixwazin.  
Bistînin.  
Birevînin.

Heke hûn ji pişta bavê  
xwe ne  
**Nexwînin.**

# Danasîna kitêban bi kurtî

Kovara Nûdemê ji destpêka weşana xwe ve cih daye danasîna kitêbên kurdî û vê politîkaya xwe hê jî didomîne. Di danasîna kitêbên kurdî de em li nêrîn û ideolojiyên kurdan nanihêrin, em li gora prensîb û normên rojnamegeriya navneteweyî diçin. Ji bo me her kitêbek cîhanek e, her nêrînek dewlemendiyek e, loma em pirrengî û pirdengiyê diparêzin.

Lê ji bo ku em bikaribin kitêbên we bidin naskirin, divê hûn ji kerema xwe re kitêban bigîhînin ma da em jê haydar bin. An na bideshxistina wan dikare ji bo me zehmet be.



Janya

Di van salêن dawî de, bi taybetî jî ji welêt çend navêن nû û çend den-gêن nû têbihîstin. Ev nav û dengêن nû ji bo edebiyata kurdî ya nûjen jî gavêن nû

ne. Rênas Jîyan ku berê jî xwendevanê Nûdemê wî ji Nûdemê dinasin, yek ji van navan e ku di şîra kurdî de hêviyekê dide mirov. Rênas Jîyan şîrîn xwe bi av, hewa û bêhna welêt dihûne; dîrok, stemkarî, bêrîkirin, evîn, têkoşîn, xweza, his û kûraniya hisan tîne zimêن.

□

Rênas Jîyan

Janya

Weşanên Dozê

## Kemana min mîna gundekî digirî

E v kitêba Ferid Han ya yekemîn e. Şairê ciwan ku li Almanyayê dijî, bi riya



şîr û estetîka hunerî renge-kî nû daye jiyana xerîbî û têkoşîna salan. □

Ferid Han

Kemana min  
mîna gundekî digirî<sup>1</sup>  
Weşanên Rewşenê



### Autobiografiya Ebdurrazaq Bedirxan

Ebdurrazaq Bedirxan rewşenbir û diplomatik kurd ê hêja bû. Wî ji bo mafê kurdan li dijî desthilatdariya osmaniyen şer kiriye û herweha demekê di destên tirkan de hêşîr maye.

Herçiqas navê Ebdurrazaq Bedirxan di nava zana û siyasetvanê kurdan de tê zanîn jî, lê kêm kes bi jiyan û serboriya wî dizanin. Ev kitêba ku Celilê Celil ji arşîvên rûsan bi dest xistiye û ji rûsi wergerandiye kurdî, ji bo naskirina vî rewşenbir û diplomatê kurd yê jibîrbûyi, çavkaniyeke baş e. Di vê kitêbe de Ebdurrazaq Bedirxan behsa jiyan û serpêhatiya xwe dike. Di siya şiroveyên vî navdarê kurd de, mirov ji dîroka kurd û Kurdist-

tanê jî baş haydar dibe.

Profesor Celilê Celil bi wergerandin û amadekirina vê kitêbê xebateke hêja kiriye. □

Werger û amadekar: **Celilê Celil**  
Autobiografiya  
Ebdurrazaq Bedirxan  
Çapxana Xebat, Duhok

di sala 1999an de li Kurdistana başûr hatine çapkırın.

□


**Celilê Celil**  
Diwaro, terame  
bükê, tu guhdar be  
*Weşanen Gulane-Hewlîr*

### Dîwaro, terame bükê, tu guhdar be

Mâlbata Celîlan di waşrê berhevkirin û weşandina çîrok û zargotina kurdî de xebatê hêja û berbiçav kirine. Ev kitêba Celilê Celil jî berdewamiya wê xebatê ye. Di vê kitêbê de Celilê Celil gelek çîrokên bi mane û tijî şîret dane hev û bi kurtepêşgotinekê pêşkêşî xwendevanê kurd kirîye.



Hem ev kitêb, hem jî ya jiyanâ Ebdurrazaq Bedirxan




### Fil Hemdi

Fil Hemdi kitêbeke Azîz Nesîn e ku ji aliye Mustafa Aydogan ve li kurdî hatîye wergerandin. Mîna tê zanîn Azîz Nesîn yek ji nivîskarêne tirk yê bi ber bû. Ji bili nivîskariyê ew hertim têkilî bûyerên civakî û siyasi jî dibû û loma serê wî hertim di belayê de bû. Piraniya çîrokên wî yên mîzahî jî bi ramana wî ya rexnegir ve hatine hûnandin. Ew di çîrokên xwe de qerf û tinazên xwe bi hemû kate-

goriyêن civatê dike û wan dixe rewşike komîk. Mustafa Aydogan ku xwendevanê Nûdemê wî ji nivîs û wergerên wî yên di Nûdemê de nas dîkin, kirasekî spehî yê kurdî li van çirokan kiriye. Bi gotineke din wî tameke kurdî daye çirokan. □

**Aziz Nesin**  
Ji tirkî: **Mustafa Aydogan**  
Fil Hemdi  
Weşanên Dozê



### Istidens epok

Ev kitêba şârî kurd Rafiq Sabir bi swêdî di nav weşanên weşanxaneye ke swêdî de derketiye. Pêşgotina kitêbê ji aliyê nivîskarê swêdî yê navdar Torbjörn Säfve ve hatiye nivîsandin. Torbjörn Säfve şîrîn

di kitêbê de dipesinîne û di gelek şîrân de deng û awazîn Mayakovskî dibîne, lê belê ew wan deng û awazan jî ne mîna tesîra Mayakovskî lê taybetmendîyeke Refiq Sabir dibîne. Refiq Sabir bi xwe li swêdê dijî û bi navê "Rabûn" kovareke hunerî û edebî derdixe. Mîna kovarê, şîrîn ku dînîvisîne jî, bi zaravayê soranî ye. Refiq sabir yek ji şârîn kurd yê zîrek e ku bi hêza gotinê, rengekî nû dide huner û jiyanê. □

**Rafiq Saber**  
Istidens epok  
Weşanên Lindelöv

### Gur û heft karik

Gur û heft karik çiroke-ke gelêrî ye ku pêşî bi zimanê swêdî hatiye nivîsandin. Lê mijara çrokê ku li ser heywanan e gelekî dişibe çirokên kurdî. Ev kitêba ku ji du-sê çirokan pêk hatiye, çroka sereke ya Gur û heft karik e. Rojekê diya karikan, yanî bizin dixwaze biçe derve û ji karikên xwe re xwarinê bîne. Lê tîrsa wê ji gur e. Ew dizane gava ew ne li malê be wê gur bigire ser malê û zarokên wê bixwe. Loma berî ku ew derke-



ve ew karikên xwe şîret dike û dibêje divê ew li gur derî venekin. Karikên wê jî bi a wê dîkin û dibêjin em ê li gur derî venekin. Gava dê diçê û piştî kurtedemekê li derî dikeve, karik derî venakin. Lê gur êrd di simêن xwe dide, spî dike û dengê xwe diguhere dike mîna dengê diya wan û dibêje derî vekin, ez diya we me. Hingî karik dixapin û derî vedikin. Gurê har û birçî dikeve hundir. Herçiqas her karikek xwe di cihêkî de ve-dişêre jî, ew dîsa ji pencêñ gur naflitin û gur ji bili karika piçûk gişan yek bi yek bi saxî dadiqurtîne.

Lê diya wan, dawî dawî wan bi saxî ji zikê gur derdixîne. □

wergera ji swêdî: **Marûf Yilmaz**  
Gur û heft karik  
Weşanên Jindanê



## Rewşen û Govenda dilan

**R**ewşen û Govenda dilan du kitêbên hunermend Seid Yûsif in ku vê dawiyê ji Qamîşloyê gihîştine me. Herdu kitêb jî stranê hunermend bi xwe ne ku wî nivîsandine. Dîroka gelek ji van stranan pir kevin e, yên destpêka hunermendiya Seid Yûsif in. Lî ew hê jî li ba hunerhezên kurd zindî ne û bi kêfsxweşî têne nihurandin. Bi xwendina van stranan hem hîsa nostaljiyê li ba mirov peyda dibe hem jî ji bo hunermendên kurd yên din dibe nimûneyeke baş ku ew jî stranê xwe ji devkî derbasî nivîsê bikin û bigîhnin hunerherz û hunermendên li dû xwe.

Kitêb mîna -1- û -2- hatine pêşkêskirin. Kitêba yekê

ku bi navê *Govenda dilan* e li Qamîşlo û ya dudan jî li çapxana Xebat li Duhokê hatiye weşandin. □

**Seid Yûsif**  
Rewşen û Govenda dilan





Keskîn ew bi zimanekî xweş kiriye malê edebiyata kurdî.

□  
**Migirdîç Magrosyan**  
Ji tirkî: **Rûken Bagdu Keskin**  
*Li ba me li wan deran*  
*Wesanen Avestayê*

## Leyla û Mecnûn

**K**ovara Nûbiharê û weşanxaneyâ wê di van demêñ dawî de kitêbxaneyâ kurdî kiriye xwediyyê gelek klasikan. Ev kitêba Siwadî ya bi navê *Leyla û Mecnûn* yek ji wan klasikan e ku di edebiyata kurdî ya klasik de xwediyyê cihekî taybetî ye. Serpêhatiya Leyla û Mecnûn bi gelek zimanî hatiye nivîsandin û herweha ji aliye gelek şâîrên kurdan ve jî hatiye nivîsandin. Piraniya van berheman mîna destnîvîs mane û carinan di



nav re hinek destnîvîs têne dîtin û ji aliye zimanhez û edebiyatbezên kurdan ve têne weşandin. Ev nimûneya ku Nûbiharê bi dest xistiye, li gora texmîna wan berî bi dused salî hatiye nivîsandin. Ji bo ku xwendevanê iro jî bi hêsanî têbigihê, Nûbiharê ew bi herdu alfabetan, ango bi alfabeza latûnî û erebî weşandiye. □

**Siwadi**  
Leyla û Mecnûn  
Weşanên Nûbiharê

dersdarî kiriye. Ev dîwana wî ku bi forma klasîk hatiye nivîsandin, cara yekem e ku mîna kitêb derdikeve. Lê piraniya şîrên di vê dîwanê de ji aliye feqe û meleyen Kurdistanê ve hatine jiberkirin. Ev dîwana ku hem bi alfabeza erebî û hem bi ya latûnî hatiye weşandin, ji 288 rûpelan pêk hatiye. □

**Seyid Eliyê Findikî**  
Dîwan  
weşanên Nûbiharê

Pan ku wergeriyaye gelek zimanan ji aliye Memo Darêz ve li kurdî hatiye wergerandin. Ev romana ku mirrov û xweza kiriye mijara xwe, bi wergerereke bedew bûye malê edebiyata kurdî.

□

**Knut Hamsun**  
Ji norvecî: **Memo Darêz**  
Pan  
Weşanên APECê

## Dîwan


**L**i gora agahdariya ku Nûbihar dide, Seyid Eliyê Findikî di sala 1892an de li Findika Botan hatiye dînyayê û di sala 1967an de jî wefat kiriye. Seyid Elf ali-mekî mezin bûye û di gelek medreseyê Kurdistanê de

## Pan

**N**îvîskarê norvecî yê navdar Knut Hamsun di cîhana edebiyatê de xwedîyê navekî girîng e. Wî bi dehan romanên nemir li dû xwe hiştine û gelek romanên wî bûne filmên sî-nemayê. Romana bi navê

## Rewşa Edebiyata Kurdi

**L**okman Polat ev kitêba ha mîna cilda dudan pêskêş kiriye. Berî niha bi demekê jî wî cilda yekê ji vê kitibê dabû weşandin. Hem cilda yekê û hem jî ev kitêba aktuel ji hevpeyvînên bi nîvîskarên kurdan re pêkhatiye. Lokman Polat di vê kitêbe de bi zêdeyî deh nivî-




karan re hevpeyîn kiriye û  
fikra wan ya li ser ziman û  
edebiyata kurdî û bi giştî  
edebiyata gerdûnî derxistiye  
holê. □

**Lokman Polat**  
Rewşa Edebiyata Kurdi  
Weşanen Çanda Nüjen



Kurdî de li dor 23 000 gotinan  
cih gitîye. Ferheng bi  
hevkariya Kitêbxaneya Kurdi  
ya li Stockholmê û Podiumê  
derketiye. □

**Mehmet Tanrikulu**  
Türkçe-Kürtec Sözlük  
Ferhenga Tirkî-Kurdî



hemû hejmarên "Kurmançî" yê,  
yanî ji hejmara îê hata  
ya zoan mîna kitêbeke  
mezin bi hevkariya Enstituya  
Kurdî ya Parisê û weşan-  
xaneya APECê hate weşandin.  
Ev kitêba ku hem dikare  
mîna ansiklopediyekê  
hem jî mîna ferhengekê we-  
re bikaranîn, di warê xwe  
de valahiyekê dadigire. □

**Kurmançî**  
Enstituya Kurdiya Parisê & APEC

### Kurmançî

**K**urmançî yek ji xebatên  
Enstituya Kurdi ya  
Parisê ye û yek ji xebata  
wan ya bingehîn e. Ev zêde-  
yî deh salan e ku hin kurdî-  
hez û zimanhezên kurd salê  
du caran di bin sîwana Ensi-  
tuya Kurdi ya Parisê de  
dicivin û li ser term û goti-  
nên kurdî dipeyivin. Berhe-  
mîn vê xebata kolektîv mî-  
na rojnameyeke çend rûpelî  
tê weşandin. Lê vê dawiyê


### Çend çirûsk

**E**v kitêba ku ji Almanya-  
yê gihîştiye me ji çend  
çirokên kurt an jî şîrîn  
pexşane pêk hatiye. Girani-  
ya mijarên çirokan li ser dû-  
riyê, hezkirinê, tenêtiyê û  
kurdîtiyê ye. □

**Mehmûdê Eko**  
Çend çirûsk

## Türkçe-Kürtec Sözlük Ferhenga Tirkî-Kurdî

**F**erheng bîr û xezîneya  
ziman e. Ziman bi ri-  
ya ferhengan tekûz dibin, ji  
windabûnê xelas dibin û  
dibin bingehê zimên. He-  
ta niha bi çandan ferhengên  
kurdî derketine, lê mixabin,  
ferhenga ku kurd li bende-  
ne, hê jî derneketiye. Ev  
ferhenga Mehmet Tanrikulu  
ku nêzîkî bîst salan li ser  
xebitiye, di warê xwe de xe-  
bateke pîroz û hêjayî pesnê  
ye. Di vê ferhenga bi Tirkî-



### Sobarto

**W**eşanên Avestayê berê jî çend kitêbên Helim Yûsif li Tirkiyeyê weşandibûn. Kitêbên ku berê hatibûn weşandin, çîrok bûn, lê ev kitêba aktuel bi forma romanê hatiye hûnandin. Helim Yûsif di vê romanê de, bi alîkariya bûyerên dîrokî dixwaze rewşa civaka kurdan ya sosyo-psikolojîk raxe ber çavan. □

Helim Yûsif  
Sobarto  
Weşanên Avestayê

### Çinara min

**W**eşanên Avestayê nivísen Mûsa Anter yên bi kurdî ku berê di kovarê mîna Welat, Tewlo û

Rojnameyê de hatibûn weşandin, kom kirine û mîna kitêbekê weşandiye. Mûsa Anter di van nivîsên xwe de rewşa civaka kurdan, politikaya karbidesten tîrkan ya li hemberî kurdan û bi giştî psikolojiya civakê anîye zîmên. Mîna tê zannîn, Avestayê berî niha bi demekê jî nivîsên Mûsa



Anter yên bi tirkî kom kiri-bûn û mîna kitêb weşandibû. Avesta bi weşandina van herdu kitêban karekî baş kiriye. Ev herdu kitêb jî; yanî hem ya bi kurdî û hem jî ya bi tirkî wê ji bo nivîsê pêşerojê bibin du çav-kaniyên baş. □

Mûsa Anter  
Çinara Min  
Weşanên Avestayê

### Bajarê Alim û Aqilmendantan

**B**ajarê Alim û Aqilmendantan, piyesek e ku bi formeke qerfî, mîzahî behsa rewşa hin nivîskaran dike. Di vê berhemê de navêni nivîskaran yêni rastî nehatine nivîsandin, lê ew bi navin çekirî hatine navandin. Berhem rewşeye trajî-komîk ya psikolojiya demeke taybetî tîne zîmên. □

Marûf Yılmaz  
Bajarê Alim û Aqilmendantan  
Weşanên Sîndan

### Mamikên kurdî

**M.** Xalid Sadînî ku niha di girtîgeha Bursayê de ye, bi xîretkêsi-



Xiyasedin Emre

## RÊNASÎ

PENCİNAR  
Stockholm 1999

yeke mezin 534 mamikên kurdî dane berhevkirin û bi destxeta xwe nivîsîne. Zeynelabidîn Zinar ew nivîsandine, ji bo çapê amade kirene û daye çapkiran.

Mamikên tê de bi reqem hatine rîzkirin. Bersiva wan jî li paşî bi eynî nimreyê hatine bicîhkiran. □

**M. Xalit**  
Mamikên Kurdi  
PENCİNAR

### Rênasî

Sêx Xiyasedin Emre, ev kitêba xwe di 1967-68an de, bi tûpêñ erebî nivîsandîye. Şîrîn wê li gor nikl û

kêşa Mewlûda Kurmancî hatine amadekirin. Tê de 20 besen cuda hene û hemû 684 malik in.


Zeynelabidîn Zinar kitêb ji tûpêñ erebî wergerandiye tûpêñ latêni û tevî nivîsa oriijinal a bi tûpêñ erebî di payiza 1999an de daye çapkirin. □

**Sêx Xiyasedin Emre**

Rênasî  
PENCİNAR

### WAR

Kovara WARê ev çend sal in li Tirkîyeyê weşana xwe didomîne. Heta niha heyst hejmarên vê kovare derketine. Kovar, kovareke berfireh e û ji lêkolînen li ser zimên, hevpeyîn, çîrok, analîza kitêban û hwd. pêk tê. Ev kovara ku bi kurdî-tirkî derdiikeve, di warê xwe de valahiyekê dadigire. Mirov dikare di kovare de pêrgî gelek navên cihe cihê were. Di hejmara



dawiyê de, yanî di hejmara heystan de, Şakir Epözdemir, Mehmed Uzun, Seîd Veroj, N. Gündüz, Şehmuz Diken û gelek navên din bi nivîs û lêkolînen xwe beşadî li vê hejmarê kirine.

Kovar bi çapa xwe kovareke bedew e, lê mixabin, ew ji mîna gelek kovaren kurdî di wextê xwe de dernamekev û bi derengî digihîje xwendevanê xwe.

Bi hêviya ku wê ev kovara delal di wextê xwe de derkeve û rola xwe ya pêwîst bilize, em jê re serketinê dixwazin. □

### WEŞANÊN XWE JI NÜDEMÊ RE BIŞININ!

Kitêbxaneya Nûdemê roj bi roj mezin dibe û armanca wê ew e ku bibe yek ji kitêbxaneyen kurdan a mezin. Loma kitêb û kovaren xwe ji Nûdemê re bisinîn!


# Danasîna kovaran bi kurtî

Zimanê kurdi û weşanên bi zimanê kurdi li Tirkiyeyê û li bakurê Kurdistanê hatibû qeydkirin û loma di warê ziman û edebiyata kurdi de bêdengiyek, rawestandinek çêbûbû. Lê di van salêن dawiyê de, bi weşandina rojnameya *Welat* û paşê ji *Wela-tê Me* û *Azadiya Welat*, kovara *Nûbiharê, Jiyana Rewşen, Zend, Govend* û niha jî kovarêni *Pelin* û *Pine* di ziman û edebiyata kurdi de liv û tevgerék çêbûye, di warê bikaranîna zimanê kurdi de hêviyek peyda bûye û ev hêvî mizgîniya edebiyateke kurdi ya nûjen dide mirov. Kovara Nûdemê, bixêrhatinîyê dide hemû kovar û rojnameyên xwerû bi kurdi û di her warî de amadebûna xwe ya hevkariyê tîne zimên. Nûdemê ji destpêkê ve qalib û sînorêن îdeolojîk şikandiye û destê hevkariyê dirêjî her kurdi kiriye. Loma, her weşaneke bi zimanê kurdi me kêfxwêş dike û ka-

rê me yê weşangeriyê hêasantir dike. Her weşanek bi xwe re nivîskar û xwendevanêن nû digihîne û em her nivîskar û xwendevanên nû mîna nivîskar û xwendevanêن xwe dibînin.

Em ê di vê hejmarê de du kovarêni ku ji Stembolê gîhişine me bi kurtî bi we bidin naskirin. Yek ji van, kovara Nûbiharê ye ku ev demek e li Stembolê derdikeve, ya din jî kovara *Pelinê* ye ku ew jî her li Stembolê derdikeve. Kovara Nûbiharê bi hejmara xwe ya 77an di heftsaliya xwe de ye. Ev ko-

vara delal ku di sala 1992an de dest bi weşana xwe kiri-bû, di bin berpirsiyariya Sabah Kara de derdiket. Niha, berpirsiyarê giştû yê vê kovarê Süleyman Çevik e. Ji bilî Süleyman Çevik mîna hevkarêni kovarê navêni Ali Karadeniz, Mustafa Goyanî û Selman Dilovan dibuhurin. Kovara Nûbiharê bi derengî be jî ji mehê carekê derdike-



ve û tê de nivîsên cihêreg hene. Di hejmara dawî ya vê kovara delal de bi kurtû ev nivîskar hene: Süleyman Çevik, Ali Karadeniz, Selman Dilovan, Ahmet Acet, Rînas Jîyan, Adar Jîyan, Sîdîq Gorîvan, Mela Îbrahîm Çuxreşî, Berhîm Paşa, Muhemmed Garsî, Yûsif Marînî, Mustafa Gazi, Niyazi El-Kurdî, Mucteba Beravî, Seyda Ronahî û Nazim Özcan.

Kovara dudan jî ya ku me qal kiribû kovara *Pelîn* ye. Kovara *Pelîn* mîna weşaneke Weşanxaneya Dozê ji sê mehan carekê li Stembolê derdikeve. Kovar bi bergê rengîn û bi awayekî spehî derdikeve. Xwedî û berpirsiyare nivîsaran yê vê kovarê Ahmet Zeki Okçuoglu ye û redaksiyona kovarê jî ji Îbrahîm Seydo, Selahattin Bulut û Mehmet Sanrı pêk hatiye. Hejmara sisian ku di desîn me de ye, hejmara havînê ye. Di vê hejmare de werger, şîr, hevpeyîn û çîrokên cihê hene. Di vê hejmara ku bi tabloyeke spehî ya hunermendê kurd Fewzî Bîlge ve hatiye xemilandin de bi kurtû ev nav hene:



Îbrahîm Seydo, Orhan Pamuk, Rînas Jîyan, Arjen Arî, Tolstoy, Mustafa Aydogan, Edîp Karahan, Mehmet Sanrı, Ehmedê Neco, Fewzî Bîlge, Bişarê Segman, Azîz Nesîn, Silêman Demir, Cemal Süreyya, Mihemed Enter, Zerdeşt Nînowa, Suut Kiliç, Emin Narozi, Reşoyê Elês û Mem Bawer. *Pelîn* du-sê rûpelên xwe jî ji danasîna kitêban re vejetandiye.

Mixabin ku ev herdu kovarê me yên delal, ne di wextê xwe de, lê bi derengî derdikevin. Em bi rewşa weşanên kurdî û nebûna xwendevanên kurd dizanin, lê digel vê jî ger weşanên bi kurdî di wextê xwe de derkevin, wê di weşangeriya kurdî de cidiyetek çêbibe. Em hêvidar in ku wê ev herdu weşanên me û herweha weşanên kurdan yên din jî girîngiyê bidin dema weşanê û hewl bidin ku di wextê xwe de derkevin, da ku çavên nivîskar û xwendevanan zêde li rê nemînin.

Bi hêviya serketina van herdu kovarê delal. □

## Adresa maloka Weşanxaneya Sarayê

[www.saradistribution.com](http://www.saradistribution.com)

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

**G**ER HEWESA TE LI SER HELBEST, ÇIROK, ROMAN, HEVPEYVİN, LÊKOLİN, HUNER, SİNEMA Ú HWD. HEBE, PESİNYAZEKE ME HEYE; BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

GER TU DIXWAZÎ JI TEVGERA HUNER Ú EDEBIyatê YA HER ÇAR PERÇEYÊN WELÊT HAYDAR BIBÎ Ú EDEBIYATA DINYAYÊ YA KEVNAR Ú NÛJEN BI ZIMANÊ KURDÎ BIXWÎNÎ, DİSAN BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

NÛDEM DIXWAZE JI AVAKIRINA EDEBIYATA KURDÎ RE BIBE ALIKAR, TU JÎ ALIKARIYA WÊ BIKE, BIBE ABONE!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê/aboneya Nûdemê.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek, Skandinavya 280 Sek, Ewrûpa 100 DM, Amerika, Australya û Kanada 50 \$.

**Nav û paşnav.....**

**Navnîşan.....**

---

Vê kartê dagirin û kopya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiyê ji we re bişînin.



www.netewe.com